



|

CAM \hat{U} ALMAST

CAM Û ALMAST

**Nivîskar
Sadik Yalsizûçanlar**

**Werger
Azîz Samûr**

Sadik Yalsizûçanlar, di sala 1962'yan de li Meletê ji dayîk bû. Dibistana seretayî li wir xwend. Xwendekarîya xwe ya navendî li Dortyola Hatayê qedand. Di sala 1983'yan de zaningeha Hacettepe, beşa ziman û edebîyata tirkî qedand. Demekî weşangerî û mamostetîyê kir. Piştê li TRT'yê dest bi peywira prodaktorîyê dike. Fîlmên belgewartîyê cur bi cur amade kirîye. Her çiqas di çêşnên wekî ceribandîna, lêgerîn, roman û senaryoyê de gerîyabe jî, li ser çîrokan kûr bû. Bi xebata xwe ya teorîk a bi navê Sînemaya Xewnê bandor li ser ramana sînemayê hişt. Li ser pirsgerêkên ragihanê nivîsandîye. Hinek pirtûkên wî bi zimanê bîyanî hatine wergerandin. Çend pirtûkên nivîskar ev in:

- *Rêwîyê Ku Bajêran Dixemilîne (tirkî)*
- *Tûtîya Ku Rastîyê Tehl Dike (tirkî)*
- *Guzeran (tirkî)*
- *Xewa Çûkê (tirkî)*
- *Xelwet Der Encûman (tirkî)*
- *Pirtûka Çîrokan (tirkî)*
- *Acûrên Bi Raz (tirkî)*
- *Rojên Diçin Ji Temen e (tirkî)*
- *Yaqaza (tirkî)*
- *Miradê Di Berde Mayî (tirkî)*
- *Nîşeyên Di Derheqê Unsûrûl Belaxatê De (tirkî)*
- *Ha Ji Te Re Evîna Te, Min Bide (tirkî)*
- *Qet (tirkî)*
- *Gervan (tirkî- kurdî -almanî)*
- *Eyan Beyan (tirkî)*
- *Çîrokên Mesnewîya Hz. Mewlana (tirkî-kurdî)*
- *Cam û Almast (tirkî-kurdî)*
- *Eyan Beyan (tirkî)*
- *Cam û Almast (tirkî-kurdî)*
- *Televîzyon û Pîrozî (tirkî)*
- *Mala Heyînê (tirkî)*
- *Mem û Zîn (tirkî)*
- *Kerem û Aslî (tirkî)*
- *Çîrokên Quranê (tirkî)*

Ji Yavûz Uzgur re,
Ji Nûrî Işık re ku ez birim cem wî
Û ji kurê min ê Alî re...

“Hemû tewqên dilê min dixwazin ku bi hevûdin ve bizeliqin,
Ez jî, ji bo ku dilê xwe vekim neçar dimînim wan tewqan ji hev kaş dikim,
Her cara kaşkirinê jî, bêhemdî ji hevûdin diqetin.”

Lûdwîg Wittgensteîn

“Pêyên kesê ku li ser rûyê erdê rêwîtiyê dike;
dilê kesê ku li esman rêwîtiyê dike peqilk dide.”

Ebûl Hesenê Xereqanî

1.

Çîroka te wê şevê dest pê kir. Şeva ku tu ketî sala xwe ya dozdehan. Çardehê sibatê bû. Mîna her gavî tu zû raketibûy. Piştî dersa xwe ya ku te bi bavê xwe re çêkiribû, te gotibû şev baş û derbasî odeya xwe bûbûy. Li ser alîyê xwe yê rastê te xwe xwar kir û hênijîy. Di xewa te de gazî te dikir. Bi tirs şîyar bûy. Rabûy ser xwe, hêdîka kincên xwe li xwe kir û ji malê derketî. Piştî wî mîna xeyalan tê hişê te. Mala we di nav kelehê de bû. Gava ku tu di kaş de dişikîy, pireke bi kemer a kevn li hemberî meriv bû. Kuçe xalî bû. Tenê dengê kûçikan dihat. Mîna sîyekî ber bi Mizgefta Kumbetê ve kişîyam. Destekî dirêj bûbû û bi dilê te girtibû. Gava ku tu ji camîyê derbas bûy, te ji Hawarîyan re silavek şand. Di taveheyvê de çawa bibandor xuya dikir. Ber bi derîyê mezin ê ji dar ê dêra ku wextekî cîyê Hawarîyabû ve meşîyay. Sekinîy, te li mezinayîya wê ya ku dora te girtibû û li ser te mîna esman bilind bûbû nihêrt. Te xwe bi xwe got, va ye, gotina te tê bi cî. “Gazî gelekên tê kirin; lê belê ji wan pir kêmtên hîlbijartin... Dawîya dawîyê gazî te jî kir... Tu diçî ba wî. Ji bo ku tu dev ji xwe berdî diçîy.” Hatî tîrbeyê. Çend kûçikên birdobelek, gemarê zer û reş li binê gewda çinarê bûne xelek, bi çavên niv xeriqî dinêhêrte. Hêdîka nêz bûy. Paxav bi te nekirin. Benê qeytan ê ku te bi xwe re anî bû, te derbasî stûyê wî kir, bi gulîyê darê yê ku herî xwarî erdê bûbû ve te girêda û li ser çokê xwe rûniştîy. Te destê xwe vekir û dest bi nîyazan kir: “Te gazî min ê ber derçika derê xwe kir. Ka ji vîya mezintir rûmet dibe. Êdî li ber derê te me. Ez jî mîna vana dixwazim bibim girêdayê ber derê te, gelo tê min qebûl bikî?” Digirîyay, gotin ji devê te bi awayekî xwar bûyî û qurufandî derdiketin. Qasekî bêdeng sekinîy. Çavên te girtîbûn. Nayê hişê te ku çiqas derbas bû. Wekî peyivekî ku bêdengîyê zift bike tirbe qelişî û bû du qeşt. Hêdî hêdî rast bû. Wekî ku dihat vegotin, yekî anî gilover, rî sipî, şaşik reş û çav hingivîn bû. Wekî ku Lala Mistefa Paşa li ber derîyê Ani’yê ji şeş gaz kûrayî derxistibû. Tenê te çavên wî didît. Dilê te li ber sekinandinê bû... Bişirî. Got “Êdî tu bi me re yî, me te li ber derê xwe qebûl kir...” Xwe dirêjî te kir, porê te mizda, destê wî qasekî li ser girmilka min a rastê ma, hinek tişt di guhên min de got û ji ber çavan winda bû.

2.

Çîroka min wiha dest pê nekir.

Te min paqij anîbû dinê, min ew neparast, bi awayekî gemar vedigerim ba te.

Dizanim, ava ku tu herî jê hez dikî ava çavên gunehkaran e, ji ber vî hergavî digirîm.

Min xwest ku di wê rêyê de bimeşim; lê belê ji min nehat. Min ji tirê qey min rêberê rê dîtîye, xapîyam. Bi gumana ku tu min dibîhîsî, min hertim di hundir û dervayê xwe de xeber da. Min hîn kir ku bi bihîstina te heta ku ne bawer bim divê xeber nedim; lê belê dereng mam, êdî derbas bû.

Gava ku ji bo kêşa belgewartekî hatim vî bajarî, min ne cîyekî ku xwe têximê ne jî cîyekî ku li wir bimînim dît. Gava ku balefira me li ser Qersê ji bo ku dakeve erdê xêzên gilover çêdikir, bi nihêrtina ewil ew avahî ketibû ber çavên min. Li minaraya binê rêya ku çem kiribû du qeşt û ji topê gula bûbû serad, ya li jêra dêrê ya Hawarîya ku dirûvê keta çar pelî pê dixist û ku ji hêla Qral Ebbas ve hatiye çêkirin û rêya ku wî vekiribû dinêhêrim... Min dizanibû ku rêwîyên wê rêyê ji rojê zêdetir ji şevê hez dikin.

Ji meydana balafirê em diçin oteleke sê stêrka gemar û giranîyê xwe datînin. Teknîsyenê Deng, Şofêr, Mihasebevan û tevî Derhêner em pênc kes in.

Navên xwe me da nivisandin û pişt re em derketin odayên xwe. Akîya ji bo şarzê li pirîz dixim. Walêzê xwe vala dikim. Ê ku pêşî dakeve resepsiyonê dê li yê din bigere, hê wext heye. Deftera xwe ya rojnivîsê derdixim û datînim ser etajerê. Wêneyê keça xwe, romana ku li ser gotina “Nêzî agirek e” disekine, pakêta gitanes blonde, çaqmaqê xwe yê zîppo, hemêzkirina wexta xatir xwestinê, kenên wê, hîqîna ku ji nava dilê wê derketibû, rêça dest a ku di çavên wê de û li ser lêvên wê, tiştê ku tê ber destê min hemûyan derdixim û datînim. Nikarim dest bidim diltengîya ku di nav min de ye. Misêwa zêde dibe. Bê sekin mezin dibe, difetisîne. Ji rojê zêdetir ji şevê hez dikim. Perdeyan digrim. Ji qirêjê bûne mîna qayîş. Di odayê de bêhna rutûbetê.

Di nav rojê de saetekî ji wextê min hinekên din didizin, tenê dikarim şevê bi te re derbas bikim.

Ji rûyê vî de di nav rojê de dibim kesekî din.

Gava ku bi te re me dibim tu.

Telefon lê dixê, dadikebim lobîyê.

Bi hevalan re li mînîbusê siwar dibin û dest bi gera bajêr dikin.

3.

Bajêr di binê berfê de ye. Berf hê jî dibare. Ne ji dîwarên avahîyan, ji şivakan, ji hesinên balqonan, ji dûyê ku ji serê kulekan bilind dibe, ji wesayitên ku li kuçan berfê dikin herî û ne ji mirovên ku vir de wir de dilibitin ve dê sipîyayî hikmê xwe bide ser her tiştî... Tişteki dê nê dîtin... Helbesta Laleyê tê hişê min: “Carinan tişteki dibe ku bê dîtin/carinan tişteki nayê dîtin/carinan tişteki dibe ku bê dîtin/carinan tişteki nayê dîtin/carinan...” Helbest dihele. Piştî ku meriv ji hêla milê rastê ya otêlê de sed û pêncî metre diçe li alîyê milê çepê du peykerên mezin ê hespan xuya dibin. Du hespên ku li ser betonekî kol hatine rûniştandin û pêyên wanê çepê ên li pêş jî li hewayê ne. Bêteşe xwanê dikin. Şofêr tê coşê. “Mamoste, tu li xweşikîya wan binêre, kî dabe çêkirin eferim jê re.” Derhêner di ber xwe de dibêje: “Şaredarîyê çêkirîye, dê kî çêke!” Her tişt bêserûbin xizan û bêçare xuya dikin. Mal û dikan betonarme ne û nelihev in, pirê qonaxên kevn ê ku ji Êris, Ermen û ji Osmanîyan mane hatine sewaxkirin û boyaxkirin. Ser kevirên jêkirî yê gewr hatine girtin, şivak bi PVCyan hatine çêkirin, li şûna hemû derîyên bilind û berfireh derîyên pola hatine lêxistin... Her çiqas bi tebeqeyan sipîyayîya berfê ser wan girtibe jî, di kolanan de çop, qalîkê fêkî û zebzeyên ku vir de wir de belav bûne, naylonanên avêtî û rojname di nav pûkekî ne zêde de diçin û tên. Em diçin ciyê ku bajêr li wir bi hezaran sal berê hatîye avakirin. Di ber qonaxekî bihejmet a du qat ê ku bi planê çargoşe hatîye çêkirin de derbas dibin. Li ser tabelaya binê butsa bêteşe ku ev tabela bi birinc hatîye çêkirin, navê Xazî Ahmet Muhtar Paşa tê xwendin. Çem bajêr kirîye du qeşt. Gava ku em ji pirê derbas dibin, dikevin rêya ku digihîje kela hundir. Li rastê du heb peykerên şêr ku ji yê berê xerabtir in hatine çikandin. Ev tiştên ecêb ku serê gavê carekî wekî sfenk¹ dertên hemberî meriv, xerîbîyê zêdetir dikin. Axirê em tên mizgefta ku navê wê Kumbet e. Şofêr ji Şêxê dergaha ku di muştemîlata mizgefta Ewliyayê de ye kilîdê distîne û tîne. Ser qubbeya avahîyê ya ku di nav xakekî vala yê xwelîyê berfireh de bilind bûye, niha berf pêçandîye. Wargehekî bi goşeya çik ku bi çar nîş²an berfireh dibe. Em dikevin hundir. Di avahîyeke hezar û heştê salî ya ku dest pê nebûye, di nexşên nonfiguratif³ ê li ser dîwarên reş ê cemidî û di dengê keviran de em nuqmî birewerîya bûn. Beşa tarîkê ku qubbeyê pêk tîne bi awayekî dirêj ê quçikî hatîye çêkirin. Nîşên ku di binê qubbê de ne, ji hundir de gilover ji derve de jî bi awayekî pênc quncik hatine çêkirin. Derîyê wê yê mezin li alîyê rojava ye; lê belê du derîyên wê yên ku yek li bakûr, yek jî li başûr dinêhêrin hene. Şûna

¹ **Sfenk:** Di Misira kevn de, peykerên ku serê wan mîna serê jinan û gewdeya wan jî wekî gewdeya şêran hatine çêkirin re Sfenk tê gotin.

² **Nîş:** Ji bo ku paşiyê bîn bikaranîn, ji şibak, qul an jî ji hucreyên ku di nav diwarên avahîyan de tên hiştin re Nîş tê gotin.

³ **Nonfiguratif:** Hunera bênîgarî.

derîyan bi texteyan hatine girtin. Mekana binê qubbê bi heşt şîbakên dirêj û bilind ku bi kemberên gumbet hatine çêkirin ronî dibe.

Dirûvê nava min jî dide vê tarîfî û bêdengîyê.

Gava ekîp li derve bû û ji bo minareya ku wextê dagirkirina Êrîsan bi guleyan nehatîye xerakirin, mala li hemberî aşxanê û kelê dê di jêr de çawa bê kişandin lêkolîn dikir, ez jî di kumbetê de qasekî mam. Kevirên bazalt ê jêkirî ketine halekî wisa ku dirûvê singêr dide wan. Ji min re wisa çêdibe û dibêjim, “Dibe ku kezebên min jî ketibin vî halî.” Wiha qulo qulo. Her roj bi dehan hebê serêşê vedixwim. Bi salan e wiha dikim. Nayê hişê min ku bû çiqas. Ê min jî jîyaneke bi mîgren e. Serê sibê bi êşê şîyar dibim. Saetek şûn de ku êşa min zêde bû û hat asteka ku roja min ji min bistîne, ji jehrîya îlacan pêştir tu tehm hest nakim. Ku piçek kêmbike bi wê îdare dikim. Êşeke ne zêde ne jî kêmbike li dora çavên min kêmbike nabe. Di tenîştê guhên min de, ber bi mêjîyê min ve kûr dibe û diçe. Bi kûrbûnê re êş zêde dibe. Tişt li ber çavên min diçin tîn, nayên dîtîn. Dilê min li hev dikeve. Ronahî û deng min aciz dikin. Naxwazim paşeroj û pêşerojê bifikirim. Dema ez tê de me dibe jehrî li min. Ji karê ku dikim hez nakim. Dixwazim tenê bimînim. Herim oda xwe, di cîyê xwe de xwe biquncifînim, çavên xwe bigrim û bikevim xewneke kûr a bê şîyar bûn...tenê ev.

Ev dengê derhêner e, gazî min dikin.

Dertê. Balonfiroşek derbas dibe. Kasetfiroşek.

Dengê kilameka ku dibêje, “Bi tekerên textik term dibin” bilind dibe. Kûçik dihewitin.

Derhêner li ber kanîyê disekine.

Sitranebêj bi gotina, “Hinek cendek dijîn” diqîre.

Derhêner dibêje, “Kekê, em ê pêşî ji ber mizgeftê bidin meşandin. Li ber derê bakûr ê kumbetê em ê bibirin. Pişt re em ê hêla berfireh vekin, bi planeke du alî qasekê dê bipeyivin, dûre em ê derbasî hêla hember bibin, di plana giştî de dê werin heta derîyê başûr, em ê dîsa bibirin, xeberdaneke kin em ê li vir jî bistînin...”

Sitranebêj bi gotina, “Diz digerin, diz” diqîre.

Şofêr bangî kasetfiroş dika û dibêje, “Çend heb kaset bîne”.

Kasetekî li ser evînê ku dîwan, tecnis û sirûdên Aşîk Şenlîk tê de ne li teyîba mînbûsê dixê.

4.

Gava ku ji bo dîtina Şêx em diçin mizgefta Ewlfîyayê, hê jî berf dibare.

Li hewşê zarok bi berfê dileyîzin.

Pîrekek ji aşxanê dertê, gava ku me dibîne di kêleka dîwar de, li ber xwe dinêre û dimeşe.

Çend heb fatimok ji bo ku nisîbê xwe yê hewrikan bistînin li hev diçin û tên.

Derhêner ji merivê ku di şadirvanê de ye hinek tiştan dipirse, camêr odeya Şêx nîşan dide.

Em dimeşin hundir. Li quncik çarmêrikî rûniştîye; cubbeyekê reş ê ku kêlekên wî bi şerîdên zer ê zêrîn hatine çêkirin li xwe kirîye; kolosê li serê wî yê ku ji kulav hatîye çêkirin bi şaşikekê reş a tenik hatîye pêçandin. Porê wî yê kej û milmilî heta ser girmila wî tê, çavên wî şînekê ji şîna behran. Bi dengêkî nizim dipeyive. Ronahîya ku ji vîtrayan dikeve hundir li ser xaliyên balgîfan, li ser mînderên erdê, li ser ava di surahî de û li ser çok, anî û porên kesên ku li hundir in dileyîze. “Ku carekê te sohbeta wî bi dest xistibe, êdî gotinên min ji te re kêr nayên. Ger ku tu dostanîya wî nedîtibî, dê ji dostanîya min çi feyde bigihîje te? Wextê te yê herî bi qîmet, kêlîyên ku tu bi wî re derbas dikî ne. Nezîya nêzîtiyê, bi dûriya ku em tê de ne re ye. Gava ku li eyneyê dinêrî sûretê xwe nêz dibînî, bi wê wêneyê dixapî û dixwazî bi dest bixî...” Li erdê dinêre. Merivê li balê di nav bédengîyê de wî guhdarî dikin. Mîna ku peyiv dikevin dilê wî, mîna di nav wî de bi cîyekî dibin û girêkên wir vedikin...bêhna wî dertê, sukûneta wî zêde dibe. Şêx, bi bêhna fireh, hêdî hêdî dipeyive, “Yê ku nêzî avê be dê binav bibe, yê ku nêzî agir be dê bişewite. Rojekê çûbûm dîtina derwêşekî Şamê. Gelek musîbet hatine serê wî, ketibû nav belayan. Min jê pirsî, “Ji kengê ve ye hûn di vê rewşê de ne?” kir. Got, “Ev sî sal e di vî halî de me.” Û gotina xwe berdewam kir, “Lê belê tenê carekê jî min negot, min ji van tengasîyan xelas bike.” Yên ku wî guhdarî dikin, hinek ji wan ax dikşînin. Sukûnet zêde dibe. Şêx, ji mêrik re bi dengêkî nizimtir dibêje, “Nêzîti agir e; lê belê tirsî me ji vîya tune. Mirov ew e ku di nav agir de wekî Hz. Birahîm aramîyê dibîne.”

Gava ku gotina xwe diqedîne hêdî hêdî radibe. Li me dinêre. Qasekî kurt em li nav çavên hev dinêrin. Dibîşire. Dibêje, “Hûn bi xêr hatin, fermo, wiha kerem bikin.”

Herkes hêdîka ji odeyê dertê.

Piştî ku hal û wextê me dipirse, qasekê çavên xwe ji min naqetîne.

Çay û dolmeyên ku ji qedayîf hatine çêkirin tînin. Herkes û teyfîkekê datînin ber wan.

Derhêner dibêje, “Seyda we zehmetî nedîta.”

Seyda gotinê tîne ser *Xereqanî* û dibêje,

“Hezret, li ser derê dergaha xwe wiha nivîsandibû: *Kî ku were vî warî, bi ezet û îkram wî biezimînin, bawerîya wî nepirsîn. Herkesê ku can jê re hatîye bexşandin, layîq e ku li ser sofreyê wî rizq bibîne û bê ezimandin.*”

Disekine.

Teknîsyenê deng dest bi xwarinê dike, ji dengê ku kevçî derdixwe aciz dibe, kevçî hêdî hêdî dibe û tîne, pişt re dev jê berdide û kevçî datîne.
 Derhêner dibêje, “Seyda, em di belgewart de ji bo Qersê girîngîya Xereqanî...”
 Dengê wî dihele, bêdengîya qasek berê guhên min tije dike.
 Di sînga xwe de bi agirekî dihisim. Navê wî dişewitîne. Gotina wî nava dilê min dişewitîne.
 Dengekî ku dibêje Xereqan...Xereqan...dibihîsim, çavekî dibînim.
 Çîyakî bilind dibe, dirêj dibe.
 Di dilê xwe de dibêjim “Xereqan”. Ji alîyekî de jî difikirim ka gelo çawa gotina te ewqas dikare bi şewat be. Şêx dîsa li nav çavên min dinêre, vê carê bi awayekî aşkere dibişire.
 Derhêner dirêj dirêj vedibêje.
 Guhdarî dike. Yên di ekîbê de, çi tiştê ku meraq dikin hene dipirsin. Carinan yek, carinan jî bi du an jî bi sê peyivan dibersivîne.
 Em dertên.
 Me li mekanên ku dîmanên wan dê bînan kirandin digerîne.
 Em dikevin hundirê turbeyê. Derî nizim e. Bi gotina “Haya we ji serê we hebe” me hişyar dike. Em jî xwe xwar dikin û derbas dibin.
 Şofêr dibêje, “Mamoste, vî derîyê kî çêkirîye, xelet pîvaye.”
 “Derîyê dergaha Hezret jî wiha ye”
 Derhêner pîrsa, “Wateyê wê ya taybet heye gelo?” dike.
 “Ji bo nefsbîçûkîyê û ji dev jê berdana xurûrê re gavê pêşî ye.”
 Li dora turbeyê em dibin xelqê.
 Çavên Şêx girtîne, tiştêkî dixweyîne.
 Em jî li pey wî diçin.
 Piştî mayîna qasekî, em ji nav perdeya ku ji daran hatîye çêkirin dertên.
 Di valahîyên nav daran de cara paşî dinêrim.
 Eynî çavî dibînim. Sînga min dişewite.
 Gava ku me verê dike dibêje, “Sibê kerem bikin taştê.”
 Derhêner gava ku got, “Seyda, em we aciz nekin, em ê karê xwe yê piştî nivro li virê...” Şêx bişirî û got, “Li benda we me”.
 Jimêryar, xeta ku li serîya valahîya derî daleqandî ye nîşan dide û wateya wê dipirse.
 “Li ku derê nîyaz hebe armanç Ew e, li ku derê pevçûn hebe armanç mirov e.”

5.

Piştî ku em li bajêr gerîyan û li ser cîyê kişandina belgewartê me qerar da, em çûn qeweya ku navê Kerbela lê hatîye danîn. Li dora soba sac me çaya bi şekirê kitleme vedixwar û bi merivekî extîyar re ku navê wî Hiseyn bû, me hinek sohbet kir. Wexta rabûnê, merivekî lewaz ê ku li kêlekê me guhdarî dikir nêzî me bû û got, “Ev camêr ji ewladê Resûl e.”

Ji gundê Xereqanê ye. Ev gund jî girêdayê Ixdirê ye. Pirsra “Li vê derê jî Xereqan hene gelo?” dikim.

“Çawa tunin, vir warê Xereqanî ye.”

“Lê ne ji virê ye...”

“Çi firq dike, xwedîyê virê ye ya...”

Wekî ku bibêjim çawa yanî lê dinêrim.

Dibêje, “Ezbenî, her demsal û qutbekî wê heye, dinya li ser girmila wan disekine, te qet gotina wedet nebîhîstîye?”

“Wedet?”

“Belê, Wedet tê maneya stûnê, stûn. Dinya li wan hatîye emanetkirin, ew mehlûqatan diparêzin, ê ku vê demsalê jî diparêze Xereqanî ye...”

Derhêner diqîre, “Osta em dereng man”

Berîya ku em bifetilin otelê, li loqinteyeke ku xwarinên birûn çêdikin, em zikê xwe têr dikin..

Gava ku ez dertêm odeya xwe, hest dikim ku êşa di sînga min de zêde dibe.

Li wêneya keça xwe dinêrim. Cigarekê pêdixim.

Dinya tarî bûye. Bêdengîyeke ecêb dikeve ser bajêr. Ji vîya xelas nabim, her tişt bêdeng e. Ev Ev valahîya min e, an na bêdengîyek e ku ez ketimê? Yan ew sewsîbûna pelos û bê sîn e ku jê fam nakim. Ew pêçokeyîya ku min zêde diêşîne dîsa dest bi daqurtandina min dike...Hê cigareya min a pêşî naqede ya duduyan pêdixim. Dîsa min bi dehan hev vexwar. Li ser esmanê devê min jehrîya nîkotîn û parasetemolê. Bi halekî jiqudûmketî, xwe diavêjim ser cîyê xwe.

6.

Di xewa min de dibêje, “Ebdîtîyê bidomîne ku jidilî xwe nîşan bide, ji dil û can be ku nûr derê meydanê. Gava ku nûr derket, mîna ku tu wî dibînî jê re îbadetê bike.

Raza vê gotinê dan te. Xwe bi wî ve bigre, xwedî lê derkeve, wî bernede.

Gava ku bû şev û însan ketin xewa şêrîn, tu jî vê bedena ku di binê kincên ji rîs ên bêteşe de diêşe û bi êşan hatîye daxkirin, di binê qamçiyên ji çerm de bixe destrêjkê da ku dilê xwedîyê wê pê biêşê û wiha bibêje: “Ey ebdê min, ji wê bedenê çi dixwazî?” Tu jî wiha bersiv bide: “Te dixwazim.” Wê çaxê dê ji te re bibêje, “Dev ji wê berde. Ew bêçare ye. Ez, ê te me.”

Rojekê dê êşên te deynin, tê ji şêrîn û ji tehl dûr bibî, tê ji her tiştê ku te difetisînin xelas bibî” Bi tirs şîyar dibim.

Cigareyek bêdixim. Li ser qoltixa ku li kêleka şibakê ye rûdinem.

Berf vekirîye. Ronahîya heyvê dikeve hundir.

Roj ronî dibe an jî dertê. Ava bûn û derketin yekin li ber çavên min.

Yek ji wan perdeyên ku li ber çavên min in bala min dikşîne.

Çiqas pir wîzîni, sûret, sî, bîrewerî, peyiv, tişt, mirov, bajêr, kolan, kuçe, wesayît, mal, avahî, pir, park, banka, bîlgîsayar, film, şerr, borsa, term, çek, xwekujî, pirtûk, destmiz, balefir, otel, kamera, mercek...hene di çavên min de. Çiqas pir deng hene. Çiqas pir tîp, kîte, peyv dikelin. Çiqas sebra min bi van şiklên ecêb ê li ser kaxizan tê. Gava li dara ku di nav sermayê de mîna kevir bêtebat e û di nav berf û ronahîya heyvê de disekine dinêrim, tişteki nabînim. Ew zevîyê ku her bi çi awayî mabe; rêya ku bi fetlanek dirêj dibe û digihîje kelê; zinarên mezin ê li milê rastê ya rê; çemê ku di nav wan de derbas dibe; avê, krîstalên berfê ku di binê ronahîya heyvê de diçirsin; bircên kelê û stêren ku heta ser wan daketine tên dîtin. Ev gerokên bi tîrêj ê esman nabînim. Carinan merivên bi papaxê rîs ê reş û bi maskeyên berfê ku derbas dibin, bi derbas bûna wan re dengê ecêb ê pêyên wan ê ku berfê dipelçiqînin firq nakim.

Di çavên min de astengên veşar hene.

Te nabînim. Bi salan e di nav vê hêwirzeyê de, bi wîzîniya di nav min de ye re dijîm.

Ucûda min çiqas giran bûye.

Mi sêwa cigare dikşînim. Bêtebat, di halekî qefilandî de li derva dinêrim.

Hinek be jî dibînim ku her tişt pir zêde ye. Difetilim nav cîyê xwe. Êşa serê min a alîyê çepê zêde dibe.

Serê xwe hedîka datînim ser balgîf. Naxwazim tişteki bibe.

Bila hîçî bibe, xwe tê de winda bikim, dixwazim xwe di wir de winda bikim.

Ew valahî wisa mezin bibe, li wir bêkesîya ku di hundirê min de ye bila winda bibe,

bêteşeyîyên di jîyana min de bila biqedin, dixwazim çi tiştên ku hene û hundirê min diêşînin bila tune bibin.

Tevî êşa serî, çavên min hêdî hêdî tên girtin.

Îcar li turbeyê me.

Şêx xuya dibe û dibêje, “Rojekê berê xwe nîşan dabû û hatina we bi min dabû agahdarkirin”
Tiştêkî fam nakim. Ji ber çavan winda dibe. Turbe hêdîka vedibe.

Bi şaşikeke ku mîna ya Şêx reş e; lê belê kêlekên wê bi xwîn in, bi kolosekî rizandî û bi
cubbeyeke ku bi dehan cî hatîne pînekirin xwe nîşan dide. Ji tîrsa dilê min tîne bisekine.
Dibêje, “Netirse, tu xerîb î, tu dizanî ku xurbetî çî ye...” Ez ji ku dizanim, di vî halî de çawa
bipeyivim, mîna ku mêjîyê min vala bûbe. Xwezîya min hatîye girtin. Dilerizim. Lalokî
dibim, ji devê min “Xe...xerîb...” dertê, nikarim bipeyivim. Peyiv dişkên û ji devê min
dikevin. Dibêje, “Belê, yê ku bedena wî li dinyayê be jê re xerîb nayê gotin. Ne ji vîya re, ji
yê ku dilê wî di tenê wî de ye û ji yê ku sîrrê wî di dilê wî de xerîb e re, xerîb tê gotin.”
Pîrsa ku di dilê min de şîyar dibe newêrim bibîrsim.

Nikarim xeber bidim. Herf ji devê min dişemitin û diçin. Dixwazim lêvên xwe bileqînim,
zimanê min bi esmanê devê min ve dizeliqe.

“Elametê vîya meraq dikî?”

Mîna ku bibêjim, “Belê” serê xwe dihejînim.

“Di dilê xwe de bicihnekirina hezkirina dinyayê ye.”

Di hişê min de ev derbas dibe, “Baş e, ji bo ku hişê min hişyar be divê ez çî bikim?”

Dibişire û dibêje, “Tu çiqas zêde tî bûyî. Wisa bihesibîne ku temenê te qedîya ye û bifikire ku
bêhna te ya dawîyê ji bo ku derê hatîye û di nav her du lêvên te de sekinîye.”

Bi gotina, “Ji min re” diqîrim. Dengê min dertê. Dengê min çiqas ne xweş e. Şerm dikim.

Dibêje, “Bîpirse”. Cara pêşî ye ku sukûneteke wiha dibînim. Dibêjim, “Ji min re alîkarî bike,
rê nîşanê min bide, ez tiştêkî fêhm nakim. Hingî ku dibînim kor dibim. Hingî ku dibihîsim
guhên min tîn girtin. Ji tiştê ku min di temenê jîyana xwe de dît û tiştêkî ku ez ji wan hîn
bûbim tune. Ji min re wisa tê ku mîna ku ez xwe dixapînim, ji bo kêlîyekê ve jî nasekinim û
nanihêrim, valahîya ku ez şemitîmê mezin dibe, bédengîya hundirê min ewqasê ku wê
valahîyê daqurtîne mezin dibe. Ji min re hîmmet bike.”

Wisa difikirim ku wateya peyvika hîmmetê nizanim.

Cara pêşî ye ku wî bi kar tînim.

Dîsa dibêjim, “Ji min re hîmmet bike.”

7.

Bi telefonê şîyar dibim. Yê ku dide şîyarkirin derhêner e. Radibim û pênc heb hevên ser êşê ku her yek ji wan çar sed mîlîgram in vedixwim û dikevim dûşê. Di vê hênê de mîna ku çend car telefon lê dikeve. Av bi kirêc e. Çermê min hişk dike. Jehrîya îlacan heta zimanê min tê. Xwe ziwa dikim û kincên xwe li xwe dikim. Li derve dinya tav e. Kamera, akuyên yêdek, çentê melzemeyan hildigirim û dadikevim jêr. Di taştê de qaşarê wê deverî, çeçîl, rûnê malê û dims. Merivê mîna me ku temenê wan bi gerê derbas dibe, bi taybetî serê sibê zêde dipeyivin. Carinan wîzînî û qerebalixa maseya kêlekê bi awayekî xweşnedîtî guhdarî dikin. Ji dergaha Şêx xortekî tê. Li ba derhêner rûdinê. Qasekî dipeyivin. Di destê derhêner de pirtûkek heye. Nizanim ji bandora îlaca ye gelo, tu tehmek ji cixara pêşî nay hişê min. Ya duduyan pêdixim, qeweya xwe tije dikim. Li ser sandalye ya ku li hemberî derhêner û xort e rûdinê. Derhêner, pirtûka ku di destê wî de ye nîşan dide û dibêje, “Ji vira min pirsan derxist, ez ê wan bipirsim, ez hêvî dikim ku ewê tişteki nebe, dê hêsa bibersivîne.” Xorto dibişire, xeber nade. Derhêner meraq dike û dipirse, “Çi bû?” Xorto xeber nade. Ku derhêner dîsa dipirse, xorto dibêje, “Gotinên wî yên ji derwêşekî ku hatibû dergaha wî re digot hatin hişê min.” Meraqa min zêde dibe û dibêjim, “Tu dixwazî vebêjî?” Xorto dibêje, “Rojekê derwêşekî ku pirtûkek di destê wî de ye tê û ji Hezret pirs, “Ez, gotinê ji vir dibêjim, tu ji ku derê dipeyivî?” dike. Hezret jî wiha bersiv dide: “Waktê min wextekî wisa ye ku, di gotinên pirtûkan de bi cih nabe.” Derhêner dibêje, “De haydê rabin, roj baş bilind bû, em derng man.” Ez ji wî pirs, “Em ronkahîyê bînin.” dikim. Dibêje, “Çi dibe çî nabe, em bibin çêtir e.”

8.

Li ser kîtabeyê dinivîsîne ku piştî zayîna Îsa di salên hezar û pênsedî de hatîye çêkirin. Bi fermana sultanê Saltûqî Melîk Îzzeddîn, wezîrê wî Fîrûz Akay daye çêkirin. Gava ku mînubusa me bi kelê ve dikişê, bîrewerîya nivîskar tê hişê min. Di qonaxeke kevn a Osmanîyan de mezin bûye. Di zaroktîya wî de bavê wî, wî birîye maçeke futbolê. Gava ku qale û qalevan dibîne diheyire û dibêje, “Çawa wisa dibe, gelo qaleya wiha li ku derê hatîye dîtîn, ji hesin û fîleyên biçûk, kanê bircên vê qalê, kanê bendên wê?” Bavê wî bi wî dikene. Bi bagêra kulek van dera wêran bûne. Lala Paşayê ku bi fermana Mûradê III. tê bajêr, benda kelê ji alîyê derve de ji nû ve dide çêkirin. Mînbûs heta cîyê ku diçe me dibe, em çend sed metre dimeşin û peyre bi derbejêrekî tîk ve hildikişin. Li ser kîtabeya Sûkapisi (Derîyê Avê) û Çerîbaşiyê (Mîralay) tarîxên veher û nîşeyên wan hene. Dertê ser birca herî bilind. Ekîp li jêrê, ji bo ku cîyên kişandinê kifş bikin li hev diçin û tên. Sir û seqemekê zêde li sûretê min dixê. Li kumbet û Ewliyayê dinêrim. Hinek li pêş Camîya Mezin bilind dibe. Bala min dikşîne ku li gor dîtina mirovan bilindbûn û nizimbûn çiqas diguherin. Li gor dîtina cîyekî virê nizim... Jêra cîyê herî bilind, nizimê herî niziman e. Cîyên ku bi daketîna meriv bilind û mezin dibe jî hene. Cîyên bi xwarbûnê ku meriv bilind dibin. Ji klûbeya ku piştî xwe daye dîwar, a ku li jêra derveyê sûrê ye û li cîyê ku baş panoromaya bajêr dibîne hatîye çêkirin, merivekî ji kincên wî dîyar e ku peywirdar e derket, di destê wî de çay, nêz dibe. Jê re spas dikim û çayê ji destê wî distînim. Çayeke gelek xweş e. Di vê sermayê de baş tê. Dibêje, “Bi hezaran însan xistine hundirê camîyê û ew wan şewitandine.” Jê pîrsa “ku derê?” dikim. Camîya Mezin nîşan dide. Bala min dikşîne ku bajêr çiqas birîndar e, rengê herî zêde mor e. “Çima mor?” “Tu dizanî, mor rengê şahî û xemgînîyê ye.” Diheyîrim, “Du hestên li dijî hev.” Pîrsa, “Çaya te tije bikim?” dike. Dibêjim, “Ji kerema xwe re” Îskanê ji destê min distîne û ber bi klûbeyê ve dimeşe. Li pey wî, di ber xwe de dibêjim, “Hûn ji ku de zanin ku mor rengê şahî û xemgînîyê ye?”

9.

Şêx dijraberyê rave dike.

Ji zimanê zanayekî dide agahdarkirin.

Ew ji qelbê xwe dide ragihandin.

Ew ragihandin ji kîjan çavî dertê nayê zanîn.

Ji me re ne aşkera ye.

Ji bo çav berê ayn hatîye gotin.

Ayn, çav bû ye, çavî bû ye, cîyê derketina avê bû ye.

Tê wê maneyê ku ew tişt bi xwe ye.

Şêx wisa dibêje,

“Em dibêjin ya, ev eynî ji vî vîya ye, bi vî awayî em hem behsa heyînên wan û hem jî behsa dirûvlêxistinên wan dikin.”

Teknîsyenê deng dibêje, “Yaw, ev camêr çi dibêje, tu fehm dikî gelo?”

“Nizanim...”

Em li dergahê ne.

Xeynî ekîbê du heb xort hene, li nêzî derî li ser çokan rûniştine.

Lê belê qet li Şêx nanihêrin, di şûna xwe de sekinîne, gava ku di dilê wî de daxwazeke wî çêbibe, bi carekî ve hest dikin û bi lez tînin cî.

Şofêr dibêje, “Mîna ku xewn dibînim.”

Derhêner dibêje, “Rast e, em di xew dene, lê hê me yek çarçikekî jî nekişandîye, divê em şîyar bibin.”

“Lê belê dostno, di erebî de gava ku meriv dibêje “Ev eynî ji vîya ye” nayê maneya ku dirûvê wî pêdixe, tê maneya ku ew bi xwe ye. Gava ku meriv dibêje afirîner eynî mîna tiştan e, em dibêjin ku rastîya tiştê ku afirandîye ye. Ayn rastîya Wî ye. Lê belê ne bi pênc hest û têgihanê me, gava ku em ji alîyê kifş û heqîqetê ve binêrin wisa ye. Gava ku em bi vê nêrinê nenêrin, divê em bibêjin Heq Heq e, mirov jî mirov e.

Dide xuya kirin ku Şêx raza wî rave nake.

“Raz, ew e ku ji ber sirûştîya wê nayê aşkerekirin. Ji ber ku gava bê ravekirin ji sîrr bûnê dertê jê re raz tê gotin.”

Vîya jî Şêx dibêje, em fêm nakin.

Em tenê guhdarî dikin.

Pişt re tê ser dijraberyê, çîrokekê vedibêje. Dibêjim çîrok ya, ev ne ji wan çîrokan e ku ji ber xwe de tên gotin, eynî bi xwe wekî rastîyê ye.

Di wextekî de zanayek Besrayî, derwêşekî xwe dişîne cem Xereqanî û jê re bibêje, “Li wir kesekî ku bi zikir xemilandî heye; lê belê ji çavan dûr e, ji wî re Ebûl Hesên tê gotin, silavên

min ji wî re bibe û bibêje, ji min xwest ku ev dahol û sancaxê bînim dergaha te, ser rûyê erdê teslîmê te kir û çû.

Derwêş tê, dertê hizûra wî û wî dide agahdarkirin. Qasekî bêdeng disekinin. Şêx bi tu awayî hînê hevnasîya kesekî din nebûye. Derwêş şîretekî jê dixwaze. Xereqanî dibêje, “Gava ku Ew bixwaze ji merivekî re bexşînê bike, ji xeynî xwe çî hebe ji dilê xwe derdixe. Wê çaxê ebd matmayî dimîne; lewra bi vî awayî sermaya wî ji destê wî tê stendin. Piştî ku matmayîbûna wî qasekî didome, di dilê wî de xwestekeke xwe nîşan dide. Û dibêje, “Ez te dixwazim.” Dîyarîyeke ji vîya mezintir nayê dîtin.”

Derwêş êdî fêma dîke ku wextê çûndina wî hatîye; lê belê destê wî ji wî nabe.

Di vê hênê de agahîya ku du heb mêvanên din jî hatine digihînin hundir. Gava ku Xereqanî dibêje “Bila kerem bikin” du heb derwêşê ku ebayê ji rîsê bêteşe li xwe kirine, bi çokên rehtbûyî û bi rûçikên bê mehde ketin hundir. Rûdînên. Yek ji wan bi gotina, “Ezbenî” dest pê dîke û didomîne, “Em her du li ser mijarekê li hev nakin, ez wiha difikirim û dibêjim ku xemgînî ezê li ebedî ye, hevalê min jî dibêje na şahî ezê li ebedî ye.”

Xereqanî qasekî difikire, li her du merivê ku li hemberî wî bi edeb rûniştine dinêre û dibêje, “Min zanakî rojava naskiribû, wî nedigot xemgînî, digot “kabz”. Lewra wirê cîyekî wisa ye ku ruh li wir teng dibe. Ji bo şahîyê jî gotina “bast” bi kar dianî. Wisa bawer dîkir ku bêhna ruh li wir dertê...”

Careke din bêdengî çêdibe, pişt re, li cîyekî ne dîyar dinêre û dibêje, “Meqamê me ne xemgînî ye, ne jî şahî... Li ba Rebbê me wext tune ye, behsa serê sibê û êvarê nayêkirin, behsa tengbûn û firehbûnê nayêkirin, wê çaxê xemgînî û şahî halekî ku taybetmendîya Wî be nîn e. Tiştê ku çawanîya me ye, paşîyê hatîye çêkirin, nemumkune ku yê paşîyê hatibe çêkirin ezê be...”

10.

Gava ku em dikevin klûbeyê, objektîfa kamerayê ji hilm û gulmê sipî dibe.

Paqij dikim.

Dîsa hilm û gulm digire.

Li hilm û gulmê dinêrim.

Halekî te yê ku tu naxwazî bibînî heye.

Tu çavên min î; lê belê tenê sê rengan dibînî. Ez li kursê hîn bûbûm ku tu ji rengan re korî; lê belê ji bo ku ji te fêhm bikim pêwîst bû ku bi salan te bixebitînim. Çiqas pir derewên min ji tirê qey ez hîn bûme hene. Min ji tirê qey paşîyê vana bala min kişandine. Ez hîn bûm ku şik û gumanên min ne zanîn in. Destpêkirina hînbûna min jî derew bû. Hînbûna min bi xwe jî...

Min digot ya derew bi xwe jî derew e, min baş nizanibû ku vîya rast e an na.

Her tişt, gava ku meriv di vir de lê dinêre, mîna bajarekî geremol ku meriv destê xwe bide tevlihevîyê meriv hest dike. Her wiha gava ku ez li vî bajarî bi toz û tibar, bi berf, bi herî, bi mirov, bi kurm, bi parsek, feqîr, bêav, qefilî, şidandî, tevî çopên ji tabelayan, peykerên bêteşe yê ecêb ku bilind kirine, avahîyên betonarme ku du hezar salî, pênsed salî ne û derbasî hev bûne, tevî kela hundir, ku wekî dirûvê wêraneyê pêdixê, cîyê bajêr ê berê û yê nû ku serê wan di nav newalên zozanan de dirêjî hev bûne û bûne wekî girêkekê dinêrim, her tişt nedîyar xuya dike. Kameraya min sê rengan dibîne, yê din jî dirûvê wan dixê rengê her sisêyan.

Çavên mi jî tiştê ku dibîne jê tirê qey şî, sor, zer û kesk in. Tiştê ku kesk dibînim berahîn jî kesk e gelo, ez ê çawa baş dizanibim ku wisa ye.

Helbestvan dibêje, “Em ne fatimok in, ji ber vîya em nikarin nêzî hev bibin...”

Gava ku em di rêya trêne de derbas dibin tê bîra min.

Li kêleka hev, di rêyeke bêdawî de tenê mîlmekî jî bê dûrbûn û nêzbûn, li kêleka hev bi wî awayî dirêj dibin. Mîna me herduyan. Nikarim destê xwe bi te bikim. Li cîyê ku herî nêzî te dibim, ji te herî dûr dibim. Lê mixabin her tişt çiqas xweş dest pê kiribû. Bi êşa nexweşîn, rehtî û têkçûyîne; bedena xwe ya ku bûbû mîna kulîncayekî, min kaşo kaşo anîbû wî bajarî. Roja piştî wî ez te dîtîm, dema ku tu diketî salonê, li ber xeberdanê. Ketim hundir, Pêşî ez te dîtîm. Piştî salên ku bi ser de çûn min hê ji nû ve fêhm kir ku min ji tirê qey ez te dîtîme. Ez dibêjim şikra min fêhm kir, ev jî derew e. Êdî bawerîya min a ku min digot her tişt ji gumanê pêk tê qewî bû. Ji xeynî vîya, hema bêje bawerîya min bi tu tiştêkî nayê. Tê bîra te, şevêkî li ser banka Altinparkê (Parka Zêr) em rûniştibûn, di wê sir û seqemê de li me sar bû û ez ji te pirsî “Gelo tiştê ku meriv dîn dike, kesereke ku nayê cih e?” kiribûm. Te gotibû, “Tiştê wiha ji min nepirse. Êdî nepeyive. Hiş be.” Her tişt pir giran dibe...Her tişt pir zêde ne...Ji ber vîya tebata min nayê. Tebata min nayê ji ber bedena min, ji dengê min, ji tilîyên min, ji sîyên min, ji van dangan, ji van bîrewerîyan, ji van êşan... Min zanibûya ku ev ewqas zehmet e, min

tişteki nedixwest. Min li tişteki nedinihêrt. Min tişteki nedixwend. Min tu gotin guhdarî nedikir. Min qet tîp û peyivan nas nedikir. Ez te nedidîtim. Ez nedihatim vî bajarî. Li vê balefirê siwar nedibûm. Van zarokan çenedibûn. Van mezinan wan nedifetisandin. Van bajêran ewqas tevlihev nedibûn. Di van dibistanan de wextê me nedirizîya. Em li ser van sirayan rûnediniştin û me van tiştên tewşîkî guhdarî nedikir. Em nediketin van kuçên ku dernayên cîyekî. Me li wê derê rêkî nedidît û me hewl nedida ku em derên. Van mirovan nedihatin kuştin. Yê kuji bo keserên xwe dîn nedibûn.

Yên ku guhdarî dikirin yek ji wan got, “Yê te ramanekê wisane ku dixwaze derê ber bi ronahîyê ve; lê belê bereday e.”

Min jê re got tu rast dibêji. Xwezî ku ez çewtîya Muhemmed bûma!

11.

Vîya jî Şêx vedibêje.

Em ji wî hîn dibin.

Em guhdarî dikin; lê belê jê fam nakin.

Herkes di nav bêdengîyê de ye, dilê wî bi giramî tijî ye, serê wî di ber wî de, bi edebeke ku hingî diçe mezin dibe guhdarî dike; lê belê tiştêkî fêr nake. Piştî dibêje dev ji famkirinê berdîn. Zanîn û nezanînê jibîr bikin. Vana tune ne. Vana em diafirîn. Em xwe afirîner dihesibînin. Jibîr bikin, tenê jibîr bikin. Bi jibîrkirinê dest pê dike her tişt.

Li gorî gotina we çima yan jî çawa dê çewtî û Muhammed werin cem hev! Rast e, vîya li zanîna we û li aqilê we rûnanê. Hetanî ku tewşîkî jî dibîne. Di serê pêşî de divê ez vîya bibêjim ku ji gotina tiştê tewşîkî netirsîn. Vîya ji hinek cîyan tê bîra min. Gelo dibe ku Tractatûs be? Na, ne ew e, têkilîya wî û vîya bi hev tune. Vîya Şêx vegot, me jî guhdarî kir. Êdî Şêxekî me yê ku dibêje ji gotina tiştê tewşîkî netirsîn heye. Di roja me ya duduyan de bi gotinên gelek hindik çiqas pir tişt ji me re vegot. Ji gotina tiştê tewşîk metirsîn; lê belê divê hûn guhên xwe bidin wan tiştan!

Her tiştê ku ji wî guhdarî dikirim pêşî ji min re ecêb, bêteşe, nelirê, nakok, piştî nexuya, xuman, duvre bi gîzem, bi raz, nedîyar û paşîyê îngilapger tîn ji min re. Ev wisa bi sanco dibe ku dibê qey can ji ten dertê. Ez ê wî ji ku derê de zanibim gelo? Tenê min xwend. Ez wî jî xwendim. Belê, mîna gulîyekî bi dirrî ku ji nav hirîya şil tê kişandin ruh jî wisa ji mirov dertê. Tenê mirov dimirin. Belê yê ku vîya dibêje jî mirov e. Nemirîye. Yê ku berîya mirinê, mirinê dibêje jî mirov e. Mirov ewqas wêrek e. Ewqas dîn û har nîn be dê çawa pîrgirêkên din çareser bike? Heta ku ji yê din dîntir nebe dê çawa haya wî ji dîntîya wî hebe? Jîyan bi mirinê, aqil jî bi dîntîyê hatiye dorpêçkirin.

Şêx dibêje, “Gava ku çewtî gotin tiştêkî ku jê nayê hezkirin li ba we çêdibe; lê belê xeletîyê rêberan jî hînker e. Bîlal ecem bû, şîr’an sîn digot, gava ku azanê dixwend di şûna “eşhedu” de digot “eshedu”. Hinek ji dostên wî rojekê vîya gilîkirin. Qasidê Xwedê yê bijartî wiha axivî, “Rast e, zimanê Bîlal ne erebî ye; lê belê dilê wî erebî ye, sîn’ên wî li ba Xwedê şîr’in...”

Li ser vê gotinê Ebûbekir girîya û got, “Xwezî ku ez çewtîya Muhammed bûma!”

Derwêş gotina xwezî nabêje.

Gava ku wî guhdarî dikim wisa difikirim ku hevoka ku xwezî herî lê tê ev e.

12.

Di dergaha xwe de li xerîban mirinê nede tamkirin.

Ez xwe nikarim bigrim, li hember mirina xerîb.

Ez ê xwe negrim ku bibêjin, “Di tekyaya Ebûl Hesên de xerîbekî mirîye.”

13.

Gava ku li ser bircê li bajêr dinêrim, derketina te ya di kêleka bêjedarîyan de tê hişê min Zemanê berê merivên ku xwe digirtin xelwetxaneyan hebûn. Vana wisa bûdela yan bûcirk bûn e gelo? Niha, mirovên wiha ji bo ku jîyana xwe bidomînin, serî li rêbazê wiha xistibin, pirsgirêk, bi ihtimaleke mezin dê ne pirsgirêkeke biçûk bû ya!”

Duh gava ku em ji dergahê derketin ev fikir hatibû hişê min; lê belê gava ku em çûn hûrfiroş di wê qerebalixê de ji hişê min çû bû. Kekê hûn ji kîjan televîzyonê tên? Hûn çî dikşînin? Kekê, em esnaf bi xwe...Qaşarê baş li ku derê tê dîtîn, dimsê ku ji tûyan çêdikin kî tîne difiroşe, li vê derê cil û girêdan erzan in, înternecafe heye, em li ku derê dikarin fîlman erzan bidin tabkîrin, an na em bibin Enqerê, şarza we ya nokia”yê heye gelo, ya min bila bêşekir be, bila bi şîr be, ji kerema xwe re hûn dikarin hinekî mastê din jî bînin, ez ê mejîyekî din jî bixwazim, ê ku dixwaze heye...Şêx gotibû pirsgirêk ne biçûk e, ji ber vî Hezret dibêje, “Ji Tirkîstanê heta Şamê di pêyê yekî de sitrîyek here, ez jê berpirsyar im. Dîsa ji Tirkîstanê heta Şamê pêyê yekî bi kevir bibe, zirara wî jî yê min e û ger ku xemekê bikeve dilekî ew dil yê min e.”

Derhêner gava ku bi gotina, “De haydê hevalno, ronahî zêde dibe” diqîre, ez jî dadikevim xwarê. Topa ku ji dagirkirina Êrîsan maye dixê plana pêşî, em giştîyên bajêr dikşînin. Em bajêr mîna wêneyekî dihesibînin. Em planên nêz û nîvend tomar dikin. Di dest de dimeşe, bilind dibe, disekine, peya dibe, heta nîvro em xwe mijûl dikin. Gava ku em dadikevin xwarê giştîyên kelê dikşînin.

Derhêner, Lala Mistefa Paşa û çîroka dîtina gora Xereqanî dipirse. Peywirdar dibêje, “Bûyer gava ku Mûradê III. Paşa dişîne sefera Gurcîstanê diqewime. Di hişê min de hêjî rengê mor ku hem rengê şahî û hem jî rengê xemgînî bûyîna wî digere. Di havîna hezar û pêncê û heftê û nehê de, tevî sed hezar leşkerî derketîye sefereke mezin. Li cem hezret pirtûkeke bi navê Nûsretname heye. Min di wê pirtûkê de xwendibû. Mistefa Alî Çelebî yê ku ji Gelîbolîyê ye vedibêje, ev meriv dîroknas e. Em ber bi mînbûsê ve hêdî hêdî dimeşin. Li bendên derva yê kelê ku hatine veherkirin û li birca çavdêrîyê dinêrim. Li hinek beşên dîwar ê ku piştî xwe dane zinarên qirase. Çelebî di dema Mûradê III. de dertê gera Rojhilat ku donzdeh sal didome. Ka bila derê. Ev camêr munşîyê artêşê bû ye. Munşî... Mîna ku peywirdar fam kiribe, tê

wateya katib, vana wê çaxê dîtîye yanî di şerê Çildirê de û her wiha...Ka bila bibîne. Raporekê nivîsandîye û pêşkêşî Padîşah kirîye. Ka hiş be. Teknîsyenê deng aciz dibe û dibêje, “yaw ca hiş be, eybe li hemberî camêr”. Şofêr hiş dibe. Mîna ku tu pir birçî bûyî. Şofêr dibêje belê, ji hewa wî ye yan na ji ava wî ye...Di pirtûkê de min mînyaturekî dîtibû, halê bajêr ê ku piştî îmara Lala Mistefa Paşa. Turba Hezret jî heye li wirê. Seyîd Lokmanê Ûrmîyeyî jî li wirê hebûye, ev camêr helbestvan bûye, ew jî berhemekî dinivîsîne û pêşkêşî Padîşah dike. Mihasebevan di ber xwe de dibêje, “Yên melaq”. Teknîsyen di binê çavan de awiran didê. Derhêner hişyar dike, “Hevalno, eyb e ji we re...” Di pirtûkeke din de min mînyaturên Nakkaş Osman dîtibû. Dema îmara kelê leşkerê bi navê Hafîz Osman xewnekê dibîne. Ji Serdarê xwe re vedibêje. Di xewna wî de extîyarekî bi rû xwe nîşanê wî dide, yekî sûret ronî. Jê re dibêje, “Ez Ebûl Hesen im, li virê radizem, ku ti ji min nîşanekî bixwazî li ber lingên min bîreke kûr heye, şeş arşin kûr e, wê bikole ku tu ecêbê bibînî.” Bi tirs şîyar dibe. Serdar tê û Lala Paşa dide agahdarkirin. Ji devê derîyê mezin pê ve bîst û heft gav dijmêrin, dikolin, mermerekî çargoşe yê somakî dertê. Şervan bi navê Xwedayê jor derdixin. Li serê bi nivîseke xweşik, “Menem şehîdê Seîd Xereqanî” dinivîsîne. Laşê wî hê sipîsax e, hê jî ji birîna wî ya pazû ku di herbê de sitendîye xwîn dinizile. Wî derdixin û tînin cîyê wî yê îroyîn....”

14.

Gava ku em diçin loqinteya Gulşen, Şêx li qata jorîn e, mîna her gavî em wî li ser maseya dirêj a li jêr rûniştî dibînin. Servîs hatîye vekirin. Selete, tirşîn, rûnê malê, hingiv, dew, mehit, mast hatîye danîn, lawaşên bi kuncî hatîye, hilm û gulma wî radibe.

Derhêner li alîyekî Şêx, dengvan jî li alîyê din ê Şêx rûdinê. Herkes ji xwe re cî dibîne. Şêx tenê bi şorbeya sebze qîm dike. Heta ku pirs nêkîrin napeyive.

Heta ji me tê em zikê xwe têr dikin. Li ser sandalyeyan xwe vedizelînin. Qeweyên me tên. Derhêner dibêje, “Seyda, hingî me xwar bêhn ji me dernayê, em ê çawa belgewartê sofî bikşînin?”

Tenê bi gotina, “Hûnê rabita bikin” qîm dike.

Kes newêre ku bipirse ka gelo ew çî ye.

Derhêner pirsê, “Lê belê divê meriv hindik bixwe, ne wisa?” dike.

Dibêje, “Rojekê, zanayê Xereqanî ji derwêşekî dipirse, “Te qet jehrîyê vexwarîye?” Derwêş ku dibêje, “Yê ku jehrîyê vexwe qet dikare bijî?” wiha xeber dide, “Wisa be te qet xwarin nexwarîye.”

Qulpik tên Mihasebevan. Bi destê xwe devê xwe digre, “Biborin”.

Dîsa kes tiştêkî fêhm nake.

Dibêje, “Li gorî Sofîyan vexwarina jehrîyê ji xwarina xwarinan hêsantir e.”

Behsa kîjan jehrîyê dike? Dixwaze çî bibêje?

Derhêner dipirse, “Bi gotina jehrîyê hûn dixwazin çî bibêjin Seyda?”

Bi dengêkî ku bi zorê tê bihîstin dibêje, “Ew tişt e ku hîsabê wî nayê pirsîn. Vexwarina wî, ji xwarina helawa ku hîsabê wî tê pirsîn çêtir e. Mirov gava destê xwe dirêj dike, ji bo tiştê ku dê bixwe bi tu awayî zirarê nedê, pêwîst e ku çêkirina xwarinê an jî tiştê ku di wê xwarinê de ye bibîne. Jehrî, zirarê dide can. Can, perdeya nav dostan e. Jehrî, wê perdeyê radike, xwarin jî qewî dike, qewetê dide can. Sofî, ji tiştê ku ji ber çav perdeyê radike, ji tiştê ku perdeyê çêdike zêdetir hez dikin.”

Çay tên.

Muhesebevan dibêje, “Ox be! Nava dilê me şewitî.”

Derhêner dipirse, “Baş e, rê li ku derê dest pê dike, gavê pêşî çî ye Seyda?”

Dibêje, “Xwestin e”.

15.

Min her tim tu xwest, ez te daxwaz kirim, çavên min li rêya tu man, li hêvîya te mam.

Ez dizanibûm ku hatina cem te di behrekî de ye ku ew behr jî ji sê çeman dimije.

Di wê kêlîya de ku ez ketim avê fetisîm.

Binav bûm, min dest bi perpitandinê kir, hingî diperpitîm diçûm binî, di gavê pêşî de winda bûm.

Dizanibûm, xwe jê dûr xistin bû gavê pêşî. Xwezî ez nizanibûma, çi diguherîne, ji çi re kêr tê ka!

Gavê pêşî tirs bû, fikare bû, rîyazet bû.

Ger ku di gavê xwe yê pêşî de neçûma xwerê, min ê gavê xwe yê duduyan biavêta camêrîyê.

Ger ku ez wirê derbas bibûma, ez ê hînê ne hewcebûna mexlûqên te bibûma.

16.

Em ji bo derwêş dibêjin, “Kesê ku ji dinyayê bêagahdar e.”
Hûn şaş in. Derwêş ew e ku di nav xwe de ne xwedîyê ramanê xwe ye, her çiqas dikaribe xeber bide jî napeyive, her çiqas dikaribe bibêje jî nabêje, her çiqas dibîhîse jî nabîhîse, her çiqas hiş bibe jî hiş nabe, her çiqas bixwe jî tam nastîne, sukûnet û tevgerên wî tunin, derwêş ew kes e ku xemgînî û şahîya wî tune.
Ev çawa dibe, mirov çawa dikare xwe tune bike?
Ew bi xwe dikare ji holê rabe?
Gava ku radibe çi xuya dibe?
Ku xuya bûn çênebe dê bi xwe winda bibe?
Derwêş ew e ku pirsan napirse, pirsê wî û bersivên wî tunin.
Te misêwa pirsan pirsî.
Te ji min pirsên ku bersivên wan zehmet in pirsî.
Te hêvîya bersivê ji min kir.
Te ji min pirsan xwest.
Divê ez ji te qet nepirsîyama. Hingî min pirsî canê min zêdetir êşîya. Divê min qet meraq nekira. Divê meraqa min jî nemaya. Hetanî ku ez xwe winda nekim, ez ê çawa te bibînim? Ez ê çawa bibim tu? Dê çawa dirûvê min bidaya te? Ez ê çawa ji te bitirsîyama? Min ê çawa hez bikira? Dê çawa haya min ji bêçareyî ya min hebûya? Min ê çawa qebûl bikira?
Dê çawa bêqewetîya min li min rûniştîya?
Wê xwestekê her tim bi min re hebû.
Min xwestibû, ji te re, ji tunekirina te ya sînoran re, ji bêqeraxîya te re, ji pêlên te re, ji êşên te re ku laşê min didan ber kevira, ji îlhamên te re ku dilê min dişidandin, daxwazkarê ezmûnkirinên te bûm.
Te dixwazim.
Min tu tiştekî mîna te nexwestibû.
Ji bilî vîya ji te daxwazeke min a din tune bû.
Lê belê di gavê pêşî de winda bûm.
Gava ku vîya dibêjim jî guman di dilê min de ye ka gelo zimanê min û dilê min yek in an na. Binêre, niha gava ku dikevim dergahê, dixwazim ku bi min re eleqedar bibî.
Lê belê, li ber derçika derê te, li ber pêderîya binî, divê ez li cîyê ku sol li wir tîn danîn bisekinîyama, divê tu ji min xweşbûyayî.
Ez dixwazim bixapim, ez ê çawa bibim murît, ez ê çawa dikaribim îrade bikim, ez ê çawa dikaribim bixwazim?

Tu ji min re dibêjî govendê bigre. Gava ku pêyên xwe li erdê dixim, tenê ser rûyê erdê dibînim. Her tiştê binê erdê hetanî ku nê dîtin; gava ku min serê xwe rakir, cîyê herî bilind ê esmana ku ez nebînim, ez ê çawa govendê bigrim.

Tu ji min re behsa gavê paşîyê dikî, hetanî ku di nava min de vê fetsanokê hebe, ez ê çawa pêşî dengê xwe bibihîsim, wî firq bikim û pişt re bikevim halekî wisa ku wî nebîhîsim? Her tim ji ber derçika derê te revîyam. Gava ku ezmûn hinekî zehmet bû, êdî tebata min nehat.

Tu ji min re behsa Mecnûn dikî. Ez hê di hundirê aqil de me. Bi ser de sînorên te jî nizanim. Bi vê mîdeya ku tê de cih nemaye; bi vî hişê ku bi zanîne hatîye jehrîkirî, ez ê çawa dîn bibim?

Wexta ku bi heyîna te hatibûma dorpêçkirin, dê elameta min çi bû ya?

Dê di eyneya min de çi bihata dîtin.

Ez qurbana te me qet nebe jî hema vîya bibêje.

Ez dibêjim ku tu dibînî.

Ez xwe berdim gelo?

Bi gotina ez dest pê bikim?

Hevokên bê ez bi kar bînim?

Tu dibêjî çi, nabîhîsim.

Hiş bibim û guhdarî bikim?

Hiş dibim êdî.

Ez xwe berdidim, ez ê bê ez bipeyivim.

Hiş dibim.

Êdî hiş bûm.

17.

Ji te re jî silav be, ji ku derê yî, ji ku derê hatî?
Ji Xereqanê me ezbenî.
Baş e ku tu hatî...
Ezbenî ji bo zîyaretê hatim.
Li welatê we derwêş hene gelo?
Belê ezbenî.
Kî henin?
Ezbenî, Ebûl Hesen heye, ew bi xwe Pîrê min e.
Ji min re behsa gotineke wî ya ku te ji devê wî guhdarî kirîye bike.
Ezbenî, Ew dibêje ku:
"Razên ezelê ne tu dizanî ne jî ez
Vê muemmayê ne tu dikarî çareser bikî ne jî ez
Li pişt perdeyê yekî ku min û te dide xeberdan heye
Ger ku perde rabe ne tê bimînî ne jî ez."
Min bibe cem wî, hemin ku te vê gotinê ji wî anî, min bibe sirra wî.
Ka em herin ezbenî.

18.

Rabe pêya, barên xwe deyne, dev ji zêdehiyên xwe berde, bila tenê bedena te bimîne, hemû lebatên te, bila tev hevo hevo ji hev biqetin, bila heyîna te înkâr bike, tenê ez heme, bila min bibîne, bila min guhdarî bike, bila mi bibihîse, bila min bêhn bike, bila li min binêre, bila destê xwe bi min bike, bila min jibîr bike, bila ez werim bîra wî, bila min bihelmijîne, bila min dorpêç bike, bila bi min bê dorpêçkirin, bila were cem min, bila bazde ba min, bila ji min derê, bila ji min biqete, ji min vegere, bila min bigre...tenê ez heme, xwe înkâr bike, tenê bi min re bîmîne, bi min re be, bi min re bibîne, bi min re bibihîse, bi min re bimeşe...binêre hikmê min li ser behr û çîyayan derbas dibe, li van esmanan binêre...van sitêran di qevdîka destê min de ne, di wir de li min binêre, di sitêran de min bibîne, mîna ewr xwe winda bike, serxweş bibe, ji dînbûnê metirse, dev ji vî aqilî berde, dev ji vê îradeya xwe berde, tedbîrê ji dest berde, bêçareyîya xwe tam bike, êşên xwe û bîrewerîyên xwe jibîr bike, wan tune bike, tu ji min î, tu bi min re yî û tê vegeerî ba min, mîna ku tu ji ba min çûyî were, her reva te bila bibe vegeer, ji bo ku vegeerî min ji min biqete, min neyne hişê xwe, bîranîn karê kesên ku jibîr dikin in, min qet jibîr neke, aqilê xwe derxe û biavêje, her tiştî ji aqilê xwe derxe, bi min tije bibe, dilê xwe kişf bike, di wî de bi cih bibe, xwe bispêre wî, tê li wê derê min bibînî, ez li wê derê me, ez mîna te di dilê şikandî de me, mala min bi xemgînîyê rohnî dibe, dilê xwe bi xemgînîyê bişo, bi êşan xwe xwedî bike, bila êşên te bibin zadê te, dev ji daxwazên xwe berde, heta ku tu ji daxwazên xwe xelas nebî tu nikarî tiştê ku dixwazî bibînî, tu min dixwazî, haya te jê tune, çima nabînî, çawa wisa tu kor bûyî, nabîhîsî, çima tu wisa kerr bûyî, heta ku ez nexwazim tu nikarî êş bikşînî, heta ku ez nexwazim tu nikarî ji êşan xelas bibî, ger ku ez nexwazim tu aramîyê nikarî bijîy, ger ku ez îrade nekîm tu nagihîjî hizûrê, ku ez ferman nekîm tu nagihîjî sukûnê, dengên xwe berde, bibe bêdeng, êdî hiş be, hiş, hetanî kengê tê bipeyivî, tu nabînî ku van peyivan jî bêçare ne, ewqas vala, reben, bêqewet, nava vana vala ye, dev ji wan berde, bi min re tîp û peyivan bi kar neyne û biaxive, zimanê min bêçareyî ye, li vî zimanî binêre, tu wî dibînî, ew di hundirê te de ye, ji hundirê te re, ez dibêjim nêrînên xwe bifetilîne dilê xwe, ez li sûret û qalibê te nanêrim, li laş û telê te nanêrim ez, tu jî li xwe binêre, li wê derê behrek heye, xwe berde, netirse tu nafetisî, ew ne av e, li wê derê peyiv tunin, li wê derê tu tiştekan tune, wê derê hîçîfî ye, xwe berde, ji serî hetanî binî, bawerkirina bi min ê her lebatên te, li destê te, li lingên te, li çavên te, gava dişo, gava diçe, gava dibîne, gava ku ji dev û pozê te hilmijê vala dike jî, mîna Mecnûnê her tiştê ku dibîne jê re dibêje Leyla, divê tu jî bibêjî tu, ji min re bibêje tu, nebêje ez, dev ji ez berde, tenê bibêje tu, bibe tu, tenê

bê min meriv dikare bibe tu; her tiştê ku rastî wî tê, li behran, li kuçeyan, li malan, li mirovan, li dîwaran, li keviran, li caman, li çavan, li dilan, li gihayan, li kurmikan, li ewran, li pîran, li çeman, li her tiştî li her tiştî, Mecnûnê ku dibêje “Leyla Leyla” binêre, cîyê di dilê wî de binêre, wî cîyî bibîne, li wê derê min bibîne, tê min bibînî, ez li wê derê me, di dilên xemgîn de me...

19.

Rojekê zanayekî Daxistanî hatibû dîtina wî.

Gava ku destê xwe xist tasa li berê a tije av û masîyekî ku diperpitî derxist,

Got, “Divê meriv ji avê ne masî, meriv agir derxe”.

Dostê wî jî got, “Wê çaxê, were em bikevin hundirê vê tendûrê, ka dê kî ji me sipîsax jê derê?”

Wî jî got, “Were, em xwe biavêjin tunebûna xwe, ka em binêrin dê kî bi heyîna Wî derê meydanê?”

Dostê wî sekînî.

20.

Teknîsyenê deng dibêje, “Ez pir tî bûm, em hinekî bêhna xwe bidin.” Derhêner li ser tetika ye, bi gotina, “Kekê wisa nekin, hê me sê kare tomar nekirîye” dixeyide. Qasekî şûn de ji dergahê yek dertê, di destê wî de surahîyekî, çaya ku hilm û gulma wê belav dibe û teyfikekî kûrabîyeyên ji arvan heye.

Derhêner dibêje, “Subhenallah, wellahî hûn nav dilê me dixwînin.”

Mêrik dibişire.

Em ji alîyê derve de dîmenên kumbetê dikşînin. Bi nêrîna berfireh, mîna dara li nav deştê, tena serê xwe, bi xemgîn dixuye. Carinan wî dikim alîyê çepê yê çarçevê carinan jî alîyê rastê, wêneyên tijî tenêtî û valahî dikşînim. Ez mîna ku xwe bikşînim, wan bi wî awayî dikşînim. Mîna ku li vê avahî û dîmênê nanêrim, li hundirê xwe dinêrim.

Bi salan e, êvaran bedena xwe mîna mirî diavêjtim ser cîya û xeweke xweş dikirim, xewnan nedidîtim.

Ji duh de ye misêwa xewnan dibînim.

Di xewna xwe ya dawîyê de min bi kî re xeber da, çi got ji min re, min çi bersiv da wî nayê bîra min.

21.

Şerm dikim, ji ber ku min behsa beka û fenayê kir ez xwe şermezar dikim. Ez dizanim ku van peyivan ji devê min dertên; lê belê navbera wan û dilê min wisa mezin e ku şerm dikim. Ji ber vî canê min dişewite. Dizanim tu hewldan min nêzî te nakin. Dûrîya tenê tu dikarî nêz bikî. Tu nêz î, ez nîn im. Tu ji min jî nêztirî min î, dibêjî nêzî min bibe. Sujde bike, nêz bibe. Nexwe sedemê nêzbûnê wirê ye. Ji bo ku dakevim wirê xwe dirêj dikim. Ji çixareyên ku berîya razê min kişandîye li hundir ji dû ewrekî çêbûye...Deng ji bajêr hatîye birrîn. Çit tune. Herkes radizê. Her tişt di xeweke kûr de ye. Dibe ku hinek şîyar bin; lê belê deng tune. Bêdengî heye. Bêdengî tişteki mîna deng e gelo? Mîna ku deng dertê ew jî wisa tê gelo? Li ser esmanê devê min dîsa jehrîya nîkotîn û îlacan. Di serê min de êşeke hindik. Ecêb, wisa hînê êşe bûme ku bêêşî ji min re zêde ecêb tê. Dixwazim dev ji çî tiştê ku bûne û yê ku dê bibin berdim û herim.

Li wêneyê keça xwe dinêrim.

Em ketin meha heftan.

Heft meh e ku li wirê yî.

Tenê dizanim tu li wirê yî. Ez ê kîngê dikaribim keça xwe bibînim? Gelo ez ê dikaribim te bibînim? Gava ku ez te nabînim çiqas dilê min diêşê; lê gava ku te dibînim...Ev dûrîyeke çawa ye, nêzîyeke çawa? Gava ku ez te difikirim di hundirê min de cîyê gaveki jî namîne.

Tu dizanî ez girtîyê te me. Gava ku te nafikirim nava min namîne. Bênav, dibim mîna qalîkê vala. Gava ku te jibîr dikim nabe, gava têyî bîra min namîne. Ji anîya min çiyakî dipeke, asfaltekî diqelişe, hestîyên min dihelin, min, te ji te nesitend, te ji min re gotibû, nefsa ku vala dimîne mirov helaq dike, ne îlmê min ne sakoyê min ne bêr û ne jî zendê min heye. Dervayê vê îlmê heye. Dervayê derva heye. Hundirê wî jî heye. Dervayê wî û dervayê dervayê wî gotinên min û te ne. Hundirê wî gotinên egîtan in. Hundirê hundir jî sîrrên bi Wî re têkildar in. Ji bo min ji wirê re rê tune, ez dizanim.

Berf dest pê dike, hebên gir dikevin, hêdî hêdî dadikevî.

Tu hundirê her tiştîyî. Cîyê ku tu lê xuya dibî her tim winda dibe. Ê ku dimîne û didome tenê tu yî, heyîna te ye. Tu ezel î, ez ê paşîyê me.

Te her tim ji min re digot ê ku paşîyê dîtîye. Ez êdî te nabînim. Bê te yî mîna mirinê hêsan bûya, qet nedisekinîm û min ê van zendên bêqewet jêbikira...Binêre ji heyîna hildiçim, binêre heyîna te hildiçe, dibî berf û dibarî ser rûyê erdê. Zendên min jêbike, dixwazim xwîna xwe birijînim. Ez heyrana te me min bernede, dev ji min bernede. Min li çeperên van avahîyên

bilind ê bêteşe nexe. Ji aliqê min vê perdeyê rake. Perdeyekî din jî heye, wî jî rake. Perdeyek din jî. Wî jî rake. Perdeyek din jî heye di binê de, wî jî rake. Yekî din jî heye wî jî. Dîsa. Dîsa. Ji van perdeyan e ez nabînim. Ew min kor dikan. Dîsa...dubare dibî... ez dibim gava ku tu dubare dibî. Ez bi tu awayî hînê vê jihevdukbûnê nebûm. Qet hînê vê dûriyê, vê xerîbîyê nebûm. Çima tu ewqas bar li min dikî? Tu nizanî ku ez nikarim bikşînim. Ez tu tiştê nizamî, çawa dibe ku tu ji min vegotina her tiştî dixwazî? Hingî sûret pir dibin hişê min tevlihev dibe. Bi tevlihevbûnê re perdeyê aqilê min zêde dibin. Niha li eyneya banyoyê dinêrim. Mîna ku li te binêrim li xwe dinêrim. Ev nîn bû ku te li dilê min xist. Min virvirand qeraxên te. Ji van nazîyên xwe yên ku di eyneyên ezê de ne nakerixî? Tu nazî dikî? Cîlwe çi ye, ez ji te hîn bûm. Cîlwe, şeva gerdekê vekirina tula ser çavê bûkê ye. Vîya jî te hînê min kir. Te min bi min da nixamtin. Te min bi xwe da veşartin. Ji bo ku gencîneyan ji min vebikî, ez dikarim çi bikim?

22.

Min di xewna xwe de pirs,

“Yekbûna dil û ziman meriv ji ku derê fêrî dîke? kir.

Te jî got,

“Rast e, divê zimanê meriv bi dilê meriv re yek be. Belawela bûn a gotinê, ji perîşanîya dil tê.

Dil behr e, ziman qerax e; gava ku behr pêl dide tiştên ku di nav wê de ne diavêje qeraxê xwe.”

23.

Ez, xwe ber bi banga te ve digrim û tēm. Nisîbê xwe yê di fermana te de dixwazim bizanibim, ku ez hînê vê bibim, gelo ez ê nisîbê xwe yê cem te jî bibînim? Çavên min, guhên min, dest û lingên min, zimanê min tu yî. Ez ê wan paqij bikim. Divê ez wan ji bo te amade bikim. Çavên min li wêneyê biqirêj û reş dinêhêrin, min ji wan xelas bike. Çi tiştên ku min ji te dût digirin hene, wan ji min dût bigre. Êdî ji ber van tebata min nayê, min biqewet bike. Hemû qelsîyên xwe ji te re vedikim, li ber derçika derê te bêqewet û bêçareme. Çavên min dût bigire. Tiştên ku nayên dîtin bibînim. Tiştên ku tên dîtin ji min biveşêre. Bila guhên min dengên nexweş, gotinên reş nebihîsin, ji min re bibe alîkar. Tenê ez te bibîhîsim, ji xeynî gotinê ku te dibêjin, çî hebin ji wan re kerr bibim. Ji her awayên bîranîyan re min hişyar bêle. Tenê dixwazim te bibîr bînim. Gotinên wekî qalikê vala û bêwate ji zimanê min paqij bike. Min ji hestî û ta dût bigre. Min di behra xwe de bişo. Baranê bibarîne çavên min. Destên min û lingên min jêke, min bê dest û bê ling bêle, min hînê ber bi hatina te ya bêgavavêtinê bike. Li stûyê min bixe. Piştî min bişkêne. Kincên min derxe. Min bê giranî, bê bar bêle. Zêdeyayîyê min ji min bistîne. Çiqas zanavê min ê ku hene tune bike. Wan bimalêş e. Min xurî bike. Îradeya min tune, taqeta min nema, hêz û qewetê ji min bistîne. Min bixe dirûvê xwe. Min xwar bike, biqurifîne, jêke, perçewesle bike, bişewitîne, kêmbike, bide xuyakirî, min bixe dirûvê xwe. Min ji minbûna min derxe. Xwebûna min hilîne, tedbîra min bide berdan. Ez nebêjim ez, ez bibêjim tu. Têm te. Niha tēm ber deriyê te. Min, dev ji hemû derîyan berda, hemû derçikan berda, ji hemû odeyan derketim, dev ji hemû dîmenan berdidim, kincên xwe diavêjim, dev ji giranîyên xwe berdidim. Ez tēm ba te, min ji xwe re bîne. Hişê min bîne serê min, ez tēm te. Li dilê te dinêhêrim. Ez tēm ji çavên te re, kanê ez reşahîya çavên te bûm. Ronahîya çavên min li ku derê ye? Te çî kir ji wî? Çima di nav ev kincên min ê tarî yê bilîk, yê bikufik, yê nexweşik, yê pelte, yê berjewendperest, yê dijmin û yê reş de; di ev behrên bikukirt de, di quleteynên gemar de, di hêlînên bikurmik de te hişt birizim? Ka kaşo dilê te tune bû? Ka tu di dilê min de bi cih dibûyî? Ka li ku derê ye ew soza ku min da? Çima ez li gotina xwe xwedî derneketim? Çima min sonda xwe xwar? Min pêlî sonda xwe kir û zivirîm. Min îxanet li te kir, ji ber derçika derê te revîyam. Min tu nas nekirî, min tu veşartî, min tu virvirand di nav dûyên fikaran de, te... te... ji te pir hez dikim. Min zehf bêriya te kir, tebata min nema. Min pir bêriya keça xwe kir, te çima min ji van êşan re hişt? Te çima li min wiha kir? Te çima sî avêtin ser xwe? Tu çima çûyî wan avahîyan û hatî, te çima ew telefon bi kar anîn, te gotinên wan merivên bitaxim ên lacîyên ecêb bi cih anî? Çima te ev agir xist nav laşê min, çima tu min dişewitî? Çima tu nava min xwînî dikî?

Destên min ji xwînê paqij bike, dil û deriyê kesî nede lêxistin. Nîşanê min bide ku tu çawan bi destê xwe li lewha mehfûzê nivîsan dinivîsînî. Tu dizanî ku rengê kincê herî nêzî min reş e. Ka ez wî çawan dikarim biqelişînim? Ger ku birçîbûn li irasê bihata firotin, ji wê pêştir min tişteki nedistend. Min ew kêmbike nedikir li cem xwe. Hemû tiştên ku dê wî birçî bikin, minê jêbikira. Minê milên wî, destên wî, lingên wî jêbikira. Ez dixwazim wî tune bikim. Ew

astenga herî mezin a li ser rêya ku digihîjîne te ye, divê ez wî ji holê rakim. Divê ez wî bikujim.

Resepsiyonîst ecêb ecêb li min dinêre. Bi çavên nîv xewî jê re dibêjim şev baş. Mîna ku bêje jixwe kesî bîaqil me nabîne, li min difetile û dibêje şev baş.

Gava dertêm derva çizîya bayê xwîna min diqefilîne. Dengê bajêr hatîye kişandin. Xwelîyekî heye ku zirê xwe wînda kirîye; lê belê berfê ser wî jî girtîye. Lembeyên kuçê pêxistîne. Rêza “Min nimêjê dît nimêjê dişewitînin” tê bîra min. Li ser lewhê Cûmhûriyet Caddesî -Kolana Komarê- dinivîsîne. Lihevçûnûhatin kêmbûye. Her tişt bêdeng e. Bêdengî zêdetir naskirî tê ji gîyan re. Hêlîna di nav tarîti û ronahîyê de zêdetir baş e... Pêyên min dişemitin, dişewişim. Ji pirê derbas dibim, tîm kuça ku digihîje mizgefta Ewlîya yê. Li rastê firoşerê tekelê, yê bi navê Kûmrû Çerez. Bêhna rizandinê. Virê bajêrekî wisane ku mîna bajêrekî ku yên di navê de dijîn ji vî bajêrî hez nakin. Min bajêrekî wiha gemar, bêxwedî, betilî nedît. Çend sal berê gava ku ez çûm Dîyarbekir ketibûm nav tişteki wisa. Hatim mizgeftê. Kes tune. Şadirvan vala ye, bêdeng e. Valahîya dervayê min, ji bêdengîya nav min bêxeber e. Xirecir datîne. Hewa qerisîye. Bi guhên xwe nahisim, şoqa xwe ya ji hirîyê derdixim, serê min xweydan daye. Diqefilim. Sakoyê xwe derdixim, lingên xwe, goreyên xwe... Kanîyê vedikim. Çawan ku ev, hazirîya cîyê ku ez ê ji te re bitewim e, wisa jî bi tena serê xwe paqijbûnekîye jî. Bi awayekî ecêb hişê min bi kar tê. Bi salane vê peyvîkê bi kar tînim û disekinim, hiş çî ye, li ku derê ye, ji çî karî re dibe, çawan bi kar tê nizanîm. Misêwa tişt tîm hişê min, wisa bihêz, tiştên ecêb dibezin hişê min, êdî diwestim, dev ji wan berdidim, dixwazim dev ji wan berdim... Av zelal e. Ez ê xwe paqij bikim. Çizîyeke ku mîna kêrê jêdike. Bi navê te dest pê dikim. Gava ku navê te dibêjim, derî û şibakên ku di sînga min de ne dilerizin. Çatîya şadirvanê diheje. Pir sar e, diranên min li hev dikevin. Pêçikên xwe, destên xwe dihijdînim. Av zelal e. Hestên xwe paqij dikim. Ez ê aqilê xwe çawan paqij bikim? Ava semawî li ku derê ye, ez ê aqilê xwe bi wî paqij bikim? Rê nîşanê min bide, li vir tu rêç tune. Av mîna ku dibêje ez çavkanîya jîyanê me diherike. Devê xwe dişom. Napeyivim. Av nade xeberdan. Zimanê xwe dişom. Va ye paqij dibim. Ji te re tîm. Derçika te paqij. Paqij dibim û tîm. Av bi ser xwelîyê ve diherike. Xwelî ez im. Xwelî laşê min e. Av çavkanîya min. Av rehê min. Di nav du çavkanîya de me. Ku av tunebûya, minê xwe bi xwelîyê paqij bikira. Milên xwe dişom. Bi şuştinê re difetilim çavkanîya xwe. Bi şuştina destên min, lingên min û sûretên min re aqilê min jî paqij dibe. Aqilê min, ber bi paqijîya xwe ya eslî ve diçe. Dibêjim ey aqilê min ê bêçare. Berê xwe bide cîyê ebdîtîya xwe ya xweser ku kelama xwe ji te re bixweyîne. Ji îtiqada xwe derê. Îtiqat akî e. Akî gihîn e. Xwe girê nede. Bereday xwe mijûl neke, tu nikarî wî bisînorkirî. Ceda te bereday e. Ew di tu tesewirê de bi cih nabe. Ez hest dikim, tu bi tu îtiqatê nayê bisînorkirin. Tu li her derê yî, her dem î. Ne cî ne jî demî tu. Tu bêcih û bêdem î. Cardin destê xwe û sûretê xwe dişom. Sûretê xwe naşom, aqilê xwe dişom. Ey aqil, ji îtiqata xwe derê. Wexta ku bangî te dike bêje, bersiva ku tê bidî wî nefîkire. Tu jî gihîn î. Derê ji navê. Tiştên di nav te dene jibîr bike. Bêje tu nikarî tu tişteki bidî min. Dev ji min berde. Min paqij bike ey aqilê min. Tê çawa di nav tîgihîştina xwe de avê bi cih bikî. Tê çawan xwelîyê girê bidî. Dev ji vê tesewira xwe ya bisînorkirî berde. Dizanîm tu nikarî bersiv bidî min. Bersivê te tune. Tu nikarî bangî min bikî, ez dizanîm. Bi şuştina sûretê xwe, ji te xelas dibim. Bi şuştina devê xwe, bi şuştina dest û lingên xwe, ji te paqij dibim. Niha li ber sîya navê te me, hest dikim. Tenê navê te dibînim. Dizanîm ku vê zanîna min tişteki naguherîne. Hebûna min û tunebûna min bi te ve ye. Niha navê te yê ku di binê tedbîra wî de me bang dike: Ez dibêjim Rebbê min... Belê gotina te rast e; lê belê nikarim bersiv bidim te. Tenê dikarim bibêjim ku “Tu yê herî mezin î”. Belê belê, tenê dikarim vîya bibêjim. Bê hemdê xwe dibêjim Allahûekber. Nikarim wateya navê te bizanibim. Dizanîm tu nayê zanîn. Tenê meriv li ber te ditewe. Tenê li ber te serî xwar dibe. Hemû nav, te nîşan didin. Tecellî bi wesfê

te re ye. Tu nîşandana meznahîyê nikare te bide naskirin. Tu derbasbûn nikare te derbas bike. Tu, yê hemû derbasbûna derbasbûyî yî.
Te bangî min kir ji bo ku ji te re munacatê bikim, va ye hatim li ber derê te me.

Derîyê bikundekar ê du qane vedikim. Kes tune. Hundir sinahî ye. Ronahîyên ku di şibakadan tîn, tarîfîya hundir dibirin. Têm cîyekî nêzî mîhrabê. Gava ku dimeşim, min ji tirê qey mîna ku di derenceyan de dikevim erdê. Tu bangî min dikî ku ji bexşandîna te nisîbê xwe bistînim. Dilê min biçûk dixî, min feqîr dikî. Kêm dibim, sivik dibim, paqij dibim. Di her tekbîrê de destê xwe bilind dikim, di vê tecellîyê de tiştên ku te ji min re bexşandîye, li paş dimînin. Tiştên ku tu didî, diavêjim tûrikê xwe. Nûrek herî mezintir dixwazim. Ma qey ji meznahîya te re sînor heye? Dibînim ku tiştê ku di vê tecellîyê de te nîşanê min da, ji yê qasek şûn de biçûktir e. Feyza te kêm nabe, zêde dibe. Bexşandinê bernadî. Mezinbûnê bernadî, dixwazim ku serê xwe deynim ber derçika derê te. Bi te re me, ji te re me, di hizûra te de me. Tê, raza berê xwe dayîna qibleyê bi min bidî hînkirin. Ruhê min, ez ji te re dibêjim bi tenikayîya xwe ji min re nebe perde. Laşê min, ji te re dibêjim bi tîrîya xwe ji min re nebe perde. Qibleya di nava min de, ji te re dibêjim ser qibleya dervayê min negre. Qibleya li derveyê min, ji te re dibêjim ser qibleya di nav min de negre. Ez bifetilm ku derê bila bifetilm, tu li wirê yî. Xêzên min, quncikên min, şikestinên min, jêkirinên min winda dibin, ez dibim sûretekî glover, laşê min dibe sûret, ez êdî sûretek im. Te pesnê wî da. Te ji wî re got dildarê min. Kelama ku te jê re bexşandîye hemû gotinan di nav xwe de dihewîne. Bi wan hemû gotinan ji te re hewar û gazî dikim. Tevrata te dikşînim. Încîla te dikşînim. Qurana te û Zebûra te dikşînim. Derî vedibin. Dikevimê. Derîyekî din. Dikevimê. Derîyekî din. Dikevimê, derîyekî din. Bi vebûna derîyan çavên min vedibin. Du wechên wî hene ku xwedîyê yek navendî ne û gihînekek wî heye ku her du vecha digihîjîne hev. Te ji wî re got fatîha ye? Qê ew feth e? Bi xwendinê vedike. Vedibe bi xwendinê. Wî bixwîne. Vebe... vebe... va ye vedibe. Xelqeya pêşîyê ye ev. Ronahî nîn e, nûr e ev. Ne ronahîye, wî dibînim... hişê min diçe... Xalî, dîwar, mîhrab, mînber, avîze, ronahî, xet, qubbe difetile. Ji wan ronahîyên ku min berê dîtibû nîn in. Ji ronahîyê giloverekî xwe nîşan dide. Bi wî re me. Li wirê me niha. Difetilm. Lingên min ji erdê tîn birîn. Ji zimanê min bi xwe peyiv dertên. Nizanim ku çi dixwînim. Tenê ji te re ebdîfîyê dikim, tenê ji te... niha ji nûrê bûm daîrekî. Difetilm. Gava ku difetilm vana dibêjim. Li peyvikên ku ji devê min dertên dinêrim. Mîna topên sitêrkan difirin. Ji wan re dikenim û li wan dinêrim. Ne wekî parçeyekî goşt, wekî parçeyekî ronahîyê dibînim. Dişewite. Dilê min mîna fanosê tîrêj dide. Qê te fatîhayê di nav min û xwe de kir du qeşt...? Qê te çar ayetên pêşî ji xwe re hilanî? Sê ayetên dawîyê ji min re dihêlî? Em tenê ji te alîkarî dixwazin... Qê bi vî tu min bi xwe ve girê didî? Tu gazî min dikî ku ez werim wê berzahê? Tecellîyên birqok bi vîya vedikî? Tu hem wateya rebtîyê û hem jî wateya ebdîfîyê vedişêrî? Ew heft wesfê te dikşîne? Wecheka wî li ba te, ya dîn jî li ba min pêk tê? Li menzîla yekemîn im. Min gavê pêşî avêt. Êdî ditirsim. Ji min tîrsê distîni. Di payeya daketina pêşî de me. Di berzaha nav rûbûbîyet û ûbûdîyetê de me ku rûbûbîyet wêneya qîyamê ya di nav erd û ezman de ye û ûbûdîyet jî wêneya sujdeyê ye. Li virê yê bilind û nizim digihîjin hevûdin. Erd û ezman digihîjin hevûdin. Gava ku meriv bilind dibe ezman, di vê berzahê de meriv derbas dibe. Va ye du tabîetên min. Xirînî ji sînga min tê. Ji sînga min deng dertên. Ucûda min dilerize. Çi dibe ji min. Ditirsim. Xwedawo çi dibe ji min, min bigre. Dîsa difetilm. Ji wê daîreyê derbas dibim, daîreka din vedibe. Hişê min diçe. Rast derdixim. Dibêjim ew ê ku jê re hemd tê kirin dê bihîstibe. Dengê min dernayê. Ev deng ne yê min e. Vîya tu dibêjî. Bi awayên zimanê min tu dibêjî. Dîsa difetilm erdê. Dîsa ber bi te ve bilind dibim. Daîreka nû xwe nîşan dide. Bi xwesteka nêzbûnê dişewitim. Mîna te dadikevim. Ji sisîyan yek ê şevê de wekî daketina te ya yekemîn ezmanê dunyayê xwar dibim ji sujdeyê re. Dibêjî sujde bike nêz bibe. Te dibihîsim. Dibêjî ber bi min ve xwar bibe. Dibêjî gavekî ber bi min ve were, dê ber bi te ve bazdim. Dilê min dê vîya çawan hilîne. Xwar dibim. Anîya xwe datînim erdê. Anîya xwe danaynim erdê

datînim ser destê te. Li xwelîyê difetîlim. Difetîlim eslê xwe. Li wir dimînim. Destên te hest dikim. Virê menzîleke ku ji nûrê hatîye çêkirin e. Vira cîyê ku ez û te gihîştibûn hev bû. Bêhna te dibîhîsim. Li çavên te dinêrim. Tecellî kurt didome. Dertêy dertêy û winda dibî. Tu winda nabî, çavên min tîn birîn. Çavên min tîn nakin. Mîna rûn diherike. Navê te gazî nêzbûnê dike ji min re. Tu dildarî ez evîndar. Ku ez dildarbûma, teyê bigota sujde bike tu nêzî. Te got sujde bike nêz bibe, dildar tu yî. Girêkên di nav min de vedîbin. Gihîn sist dibin. Mîna ta sivik dibim. Mîna bêkişandina erdê. Li ser xwe ti giranî hest nakim. Tenê xwe, goştê xwe, hestîyê xwe hest nakim. Navê xwe nizanîm. Anîya xwe digrim. Ji anîya min de min diqefêlî. Feyîza ku ji destê te dikeve anîya min qet naqede. Ê ku hişê min ji serê min dibe dibînim. Êdî ji ber bandora wî dûr im. Êdî nikare ti tiştêkî ji min bike. Êdî nikare min bixe binê bandora xwe. Daîrekî din jî heye, nikare wirê derbas bibe. Li dervayê xêzê qefîlîye, hişkolekî sekinîye. Li min dinêre û digirî. Dibêjim “Tu qet digirîyay?” Dibêje, “Tu efsûn li ser min dihêlî. Gava ku anîya xwe datîmî erdê ez bêçare dimînim. Min diqefîlîm. Êdî ji bandora min dûr î. Nikarim ti tiştêkî ji te bikim.” Dibêjim “Baş e, gelo çima tu digirîyay?” “Neçûna sujdeya xwe ya ji wî re difikirim” Didêjim “Ji kî re?” Dibêje “Ji Adem re” “Êê çi bûye? Te wisa xwest.” “Dawîya xwe dibînim” ji ber çav winda dibe. Xwelî anîya min maçî dike. Eslê xwe maçî dikim. Eslê min destê xwe bi min dike. Virê cîyê bi eslê min re hevdtîne ye. Anîya xwe hiltînim, dîsa datînim. Vê carê dirêjtir didome. Dibêjim “Xwedawo, ronahîyê bide çavên min.” Çavên min tîrêj didin. “Ronahîyê bide destên min.” Destên min tîrêj didin. Destên min mîna sotik pêdikevin. Anîya min tîrêj dide. “Xwedawo, nûrekî bide guhê min.” Dengêkî dibîhîsim. Ev dengê te ye. Tenê dizwazim dengê te bibîhîsim. Min ji dengên din re kerr bike. Nûrekî bide alîyê min ê rastê, ronahîyek bide alîyê min ê çepê, pêşîya min, pey min, ser min, binê min... Cîyê ku anîya xwe datînim şil dibe. Biîskînî digirîm. Dengê min di mizgeftê de olan dide. Dengê xwe dibîhîsim. Dengê min dikeve nav dengê te. Dibêjim, min bike nûr. Dengê min olan dide. Dibêjim min bike nûr. Ji dîwar, ji qubbê, ji mîhrabê deng tê: Min bike nûr. Dibêjim, tu nûr î. Deng tê: Tu nûr î. Dibêjim, min bike tu. Deng olan dide: Min bike tu. Xwedawo, min bike tu. Dengê min dîsa difetile: Xwedawo, min bike tu. Disekinim. Dengê te li anîya min dikeve: Ez ê te bikim min. Xwedawo, min ji min bistîne û bibe yek heyîna min ku çavên min tenê bi te bibînin. Tu dibêjî te dikim min. Dengê te tê min, tu min dikî tu. Hêdî hêdî rast dibim. Cara dawîyê rûdinê. Te erd û ezman di şeş rojan de afirand, pişt re erşê rabestand. Mîna ku erşê rapêçînim rûdinê. Êdî perdeyek nema. Çavên min sivik dibin. Laşê xwe hest nakim. Xwe hest nakim. Hişk bi dilê min digrî, bernadî. Wî di kefa destê te de dibînim. Tenê çavên min dibînin. Tenê wî dizanim. Ji te pêştir tiştêkî nayê dîtin. Gotina min a dawîyê dibe Hû. Bi gotina Hû diqedînim. Naqede dest pê dike, her tişt niha dest pê dike. Gavê xwe diavêjim jîyanê. Pîyê xwe hêdîka datînim wir. Navê te yê ku can dide wir vedibe. Di wî derîyê de dikevî hundir. Min bi te dest pê kir, bi te dawî tînim. Ji binê sîya navekî te, derbasî aramîya navekî te yê dinê dibim. Selam navê te ye, li te silav dikim. Selam yek ji wan navê te yê xweşik e, ên ku tu ji wan hez dikî silav dikim. Winda dibim êdî. Dixwazim xwe di nav wê windabûnê de bibînim. Êdî wextê cihêtyê ye. Silava xatirê didim te. Te min ji min sitend, ji te diqetim. Ez, xwe ji te re dihêlim û difetîlim.

24.

Bi dengê telefonê şîyar dibim, resepsiyonîst dibêje,
“beyanî baş ezbenî, saet heşt e.”
Dûş distînim û dadikevim. Teknîsyenê deng û Mihasebevan...
“Ooo axawo, meriv te nabîne...”
Qeweyek distînim û cigare pêdixim.
“Yaw birader, gepek tişkî bixwe hê nû dest bi vê keratîyê bike”
Dibêjim, “Kekê dev jê berde”
Teknîsyen dibêje, “Êvarê nehatî?”
“Ku derê?”
“Law mamosteyê zaningehê me vexwendibû ya”
Dibêjim, “Min jibîr kirîye”
Derhêner tê.
“Ji herkesî re beyanî baş, noşîcan be.”
Herkes dibêje, “Sax bin”. Şofêr dipirse.
Mihasebevan dibêje, “Li lobîyê ye.”
“Rast e, bera ew zû radibe.”
Teyfîka xwe heta serî tijî dike.
“Yaw hevalno, av çiqas bi kirêc e, ne wisa?”
Mihasebevan dibêje, “Belê wele, ne ji mecbûrî be ez ê dûş jî negirim”.
Cixara duduyan pêdixim.
“Tu dibêjî qey tu ruh î.”
Dibêjim, “Xwezîî” û diçim ku qewe bistînim.
“Em hemû akuyên zêde bibin ha”.
Dibêjim, “Temam in”.

Em dertên. Sê alîyê bajêr çîya ye.
Muslum Gurses dibêje, “Li serê van çîyayan xwezî berfbûma berfbûma....”
Derhêner bangî şofêr dike, “Ka radyoyê veke”.
Şofêr teyibê digire.
“...Dewleta Norveçê ku li Qafqasyayê veberhênanên wê yê girîng ê petrolê hene, ji bo hevkarîya herême milê xwe hilda. Desteya Norveç û Gurcîstanê ku li Qersê ne, îro li Odeya Pîşesazî û Bazirganîyê bi beşdarîya Serokê Şaredarîyê, Serokê Odeya Pîşesazî û Bazirganîyê, endamên odeyê û sazîyên sîvîl û civakî civînek pêk anîn. Di civînê de hat gotin ku ji hevkarîya dervayê sînor re astenga herî mezin pirsgirêka Qarabaxa Biçîya ye ku di nav

Ermenîstan û Azerbaycanê de didome. Dîsa di civînê de hat gotin ku ji bo hevkarî bê peydekirin, peywîrên girîng dikevin ser sazîyên sîvîl û civakî yê welatên Qafqasyayê û rêvebirinên cîgayî...”

Derhêner dibêje, “Êra tezkere çawa bû gelo?”

Teknîsyen dibêje, “Dê çi bibe, qerarê xwe dan û dê derbas jî bikin”.

Mihasebevan dibêje, “Biryar nedane”.

“Nedane?”

“Bera rast e, nedabûn”.

Şofêr dibêje, “Kekê nûçe tunin.”

“Temam, li kêfa xwe binêre.”

“Bajêr berbat e, lê belê planê kolanan û kuçeyan bala we kişand?”

“Erê yaw, berahîn jî ecêb in”.

Mihasebevan dibêje, “Di salên hezar û heşt sedî de muhendîsên Hollandî xêzkirine.”

Teknîsyên dibêje, “Berahîn jî?”.

Muhesebevan dibêje, “Belê”.

“Bi planê mîna izgarayê, kolanên ku hev bi tîkî dibirin...”.

“Kekê, Êris û Ermen di wextê de bajêr ser û bin nekirine.”

“Ez qurban, qey kolanan jî xera nekirine”.

“Ji kerema xwe re li rastê bisekine.”

“Dîmen û kişandin heye?”

Derhêner peya dibe, di kuçeyekî ku kolanê dibire de li avahîyên Êrisan dinêre, bi destan çarçoveyê dîyar dike û dibêje, “haydê”.

Em peya dibin.

Di bandora xewê de me. Li çarçoveyên ku çedikim, însanên ku li kuçê vir de wir de diçin û tî, zarokên ku pîrsa “kekê hûn çi dikşînin” dikin, gotinên derhêner, tevgerên kamera mîna ku nabînim, nabihîsim û dikim.

Bûme mîna yê ku di xew de digerin.

Ekîp hetanî nîvro, kitekitên bajêr, kuçeyan, mirovan, avahîyan dikşîne.

Ji bo xwarinê em diçin loqinteya ku navê wê Azer e.

Dîsa xwarinên giran ê bi goşt û bi rûn. Mast û girara birinc dixwazim. Bi lez dixwim, saetên şixulandinê yê piştî nîvro hîn dibim û pîrsa, “Ez ê herim cafeya înternetê, em li ku derê hevûdin bibînin?” dikim.

Derhêner dibêje, “Saet di duduyan de, li ber derfîyê dergahê em hevûdin bibînin.”

25.

Ji min re behsa derî bike?

Derî?

Belê.

Ne derî, ez dixwazim behsa tiştê ku wî digre bikim.

Çawa yanî?

Zanayê Xereqanî wiha dibêje:

“Mîlê ku derî digre, sî sal di guhên min de bifetile jî, ji halê min ê ku ez ê nizanibim dê Xwedê ji min çi bike hêsantir e.”

26.

Tê bîra te ku te gotibû, “Wisa bifikire ku merivekî di odeyekî de ye, derê odê li serê ne qeflekirî ye û derî ji alîyê derve de tê vekirin. Vî merivî jî ku derî tehm bide alîyê derve û fam neke ku ber bi xwe ve kaş bike, ew meriv girtî ye.” Jîyana min bi tehm dana derî derbas bûye. Carekî nesekinîme û nefikirîme ku derî ji kîjan alîyê de vedibe. Min vîya roja ku me hevûdin berda, wextê derketina dadgehê, gava ku te silava oxirê jî neda min û ji ber çavên min dûr bûy û min jî li te nihêrt, firq kir. “Li ne hevkirineke dijwar...” Ne bawerîya dadger bi vîya tê, ne tu fam dikî û ne jî ez... Em li cîyekî ku aqilê me hatibû girtin bûn. Rêyeke ku meriv ji wirê derê tune. Rê qedîya. Di şerekî me de ku were bîra te gava min gotibû, “Sibê dê derê meydanê ka ji me kî zêde êş kişandîye.” te jî gotibû, “Hih, ne bihuşt heye ne jî dogeh, her du jî di hundirê me de ne, dojehê ku ji me herduyan xweşiktir be heye gelo?” Lê belê ji bo ku tu bibî bihušta min, min te ji xwe re xwestibû. Ji bo ku bibim rêhevalê te.

27.

Tê ragihandin ku xwendevanek ji zana daxwazeke, “Destûr bide min, ji bo dîtina Qutbê Alemê ez herim çîyayê Lubnanê” dike. Zana destûr didê. Gava ku hat teniştaya çîya, dîte ku civatekî li ser termekî rûniştîye. Ji wan re got hûn çima sekinîne. Wan jî got, “Em hêvîya hatina qutbê alemê ne; lewra rojê pênc wext tê vir û meletîyê dike.”

Kêfa wî hat.

Qasek şûn de herkes mîna kevokên ku ji hewşa mizgeftê radibin tevgerîyan.

Matmayî mabû, li tiştê ku didît ecêb mabû, Şêx derket pêş û tekbîr anî.

Ji heyecanê xeriqîbû. Wexta ku hat ser hişê xwe mirî veşartibûn, zana jî çûbû.

Pirsa, “Ew stêr kî bû gelo?” kir.

Gotin, “Zanayê Xereqanî bû.”

“Dê kengê dîsa were?”

“Wexta nimêjê.”

Mêrik got, “Ez girêdayê rêya Wî me, rêwîyê dergaha Wî me, zû de ye ku ez derketime seferê, ez dixwazim vegerim cem Xereqan, alîkarîya min bikin.”

“Wê çaxê bisekine”.

Gava ku wexta nimêjê hat, zana mîna ewrekî dakete xwarê û derket pêşîya civatê.

Hanhaneka xwe avêtê, bi pêşa wî ve zeliqî, hejmetkar ma, lertz pê girt. Gava ku hişê wî hat serê wî, li ser çavkaniya Reyê bû, ber bi Xereqanê ve diçû.

Gava ku nêzî dergahê bû, li hemberî xwe Zana dît, Zana jê re got,

“Ji kesî re nebêje min dîtîye; lewra min xwest ku li her du dinyayan jî min biveşêre. Ji xeynî zindîyekî kesî min nedît.”

Fetilî, berê xwe da dergahê, gava ku hat ber derî sekinî, nihêrt û got,

“Beyazidê Bîstamî bû”.

28.

Li ber derîyê dergahê em hev dibînin.

Derhêner dibêje, “Hevalno, em ê îro li Tabyayan dîmenan bikşînin.”

Mihasebevan dipirse, “Lê çima em li vir in?”

“Yê ku em ê pê re gotûbêj bikin dostekî Şêx e. Bi ricaya wî qebûl kir. Em ê li virê gotûbêjeke pêşî bikin û piştê em ê herin kişandinê.”

Dikevim hundirê dergahê. Li odeya kêlekê, li cîyê xwe yê her gavî, bi murîdan re dipeyive.

Li tenîştê derî hêdîka rûdinê. Serê xwe hêdîka dihejîne û silav dide min.

Yek ji wan derheqê Xizir de pirs dike.

Dibêje, “Rojekê zanayê Xereqanî ji derwêşekî pirsê, gelo tu dixwazî bi Xizir re bibî dost? kir. Mêrik jî got dixwazim. Tu çend salîyî? Pêncî û sisê. Nanê Xwedê yê ku te pêncî û sê salan xwarîyê bide, tiştêkî çewt e ku te ji rizqê wî xwaribe û di ser de jî bi Xizir re bibî dost. Ku hûn dost bixwazin Ew bes e. Ger Ew dost be her tiştê dost e.”

Çavên wî li cîyekî dinêrin, mîna ku ji wirê dixweyîne û dipeyive.

Peyivên wî wisa meriv aş dikin ku her gotinekî ku dikeve guhên min, birînekî nav dilê min dibîne, wî baş dike.

“Tê bîra we ku min ji we re vegotibû ka gelo zana kî ye, çi kes e. Dirûvê çivîkekî pê dixê ku ji bo dîtina xwarinê ji hêlîna xwe dertê, tiştêkî nabîne, gava ku difetile jî rêya xwe şaş dike, matmayî dimîne û wînda dibe. Îcar ên ku axîn dikin û bargiran in hene, yên ku axîn dikin ew kes in ku birîne wan hene. Lê yên ku barê wan giran in karzanê wextê ne. Yê ku birîndar dibe baş nabe, divê dilê meriv bi yê ku barê wî giran e bişewite. Tiştên ku ji Pêxemberan re daxistîye û anîye xwarê ji welîyan re bişanda, dê ti kes nemaya ku bibêje, “Ji xeynî Wî tu îlah tune.” Yê ku ji Mistefa (s.x.l.) re hatîye ku ji çîyayê Qafê re daketîya dê parçewesle bibûya. Wê çaxê hûnê bibêjin, divê qutê me çi be, em çawa bijîn? Rast e; lê belê ez nikarim hîne we bikim ku bi gerê nayê dîtî, hûn vîya tenê bi tamkirinê dikarin bizanibin. Di gavê pêşî de bibêjin Xwedê heye, xeynê Wî ti tiştêkî tune, di gavê duduyan de hewl bidin ku bi Wî re bibin dost, paşîyê nefikirin dê çi bibe, piştê hûnê bişewitin. Zanayê Xereqanî rojekê ji murîdê xwe re behsa firavînê kir. Ji xeynê xelîfeyekî wî, kes fêm nekir ku behsa biharê dike. Wiha gotibû: “Hûn dizanin ku firavîna ciwanmêran çi ye? Ew kesên wisa nin ku mehdê wan direve, wekî behran tije şeraba muhebbetê vexwin jî têr nabin... Ji bo ku bixapin pêwîste gavekê din jî biavêjin. Lê belê yê esl bazdan e, gava ku bazdidin vîya nabînin, tenê ber bi wî ve bazdan...Gava ku bazbidin bi awayekî tî bimirin. Hûn dizanin dirûvê çi dide vîya? Merivekî ku li çolê ava hindik qîmî wî nake û xwe diavêje bîrê, bi halê xwe yê tî difetise...Li wirê dê ji wî bipirsîn, “Li cîyê ku tu mirî, te xwîna xwe dît gelo?” Ger ku bibêje, “Li cîyê ku ez mirim ti tiştêkî afirandî tune bû” wê çaxê xwîna wî li wî helal e. Bi giştî sê armancê rêwîyên rê henin: A yekê, mîna ku Ew te dizane tu jî xwe bizanibî. Ez dibînim ku ev hindik in. A duduyan, hem hebûna xwe û hem jî hebûna Wî bizanibî. A sisîyan, her tiştê ku bibe Ew û tu jî wînda bibî.”

Di vê hênê de derfîyê odeyê hêdîka vedibe.
 Şêx gava mêvanê ku ji derî dertê dibîne tevdigere.
 Pişt re derhêner dikeve hundir.
 Piştî xatir pirsînê tên ser mijara xebata belgewartê.
 Şêx, di navberekî de li min û derhêner dinêre û dibêje, “Dostê min dostê we ye jî, lewra hûn jî dostên min in. Li wî baş binêrin, zêde wî newestînin, me qîmeta wî nizanibû.”
 Mêrik dibêje, “Eman ezbenî estaxfîrûllah.”
 Şêx dibêje, “Heke hûn hemû dinyayê bikin gepek û bixin devê wî, dîsa jî hûnê heqê wî bidin”.
 Mêrik, şerm dike, ji şerman soromoro dibe, bizorê dibêje, “Ezbenî wisa nekin...”
 Şêx gotina xwe didomîne, “Heke hûn ji bo ku wî bibînin, ji rojhilat heta rojava bimeşin jî dîsa hûnê baş nemeşiyabin...”
 Mêrik dest bi girî dike.
 Şêx dibêje, “Hûn dizanin ku rêwîyên rastîyê kengê digirî? Gava ku dil digirî, hêstir xwîn digrin; gava ku guh dibîzin hestî dihelin; gava ku wext tê her tişt tune dibin...”
 Mêrik dizîka digirî. Herkes li ber xwe dinêre. Ji xeynê hîqînê mêrik li odeyê ti deng tune. Di navberekî de li derhêner dinêrim, ji bo kişandina belgewart li ser pepîka ye.
 Şêx dibêje, “Em hemû xwedîyê nexweşînekî ne. Gava ku nexweşin yek be, dermanê wî jî dê yek be. Li ser me hemûyan nexweşîna xefletê heye, werin em hişyar bibin!”
 Murîdekî dikeve cezbê, ji sîngê wî dengê “Hayy!” dertê, qasekî di cezbê de dimîne.
 Mêrik bêdeng digirî, lê dinêrim; mîna ben, ji sûretê wî de hêstir dibarin.
 “Zanayê Xereqanî dibêje ku ehlê dil ew e ku dilê xwe diparêze. Ê evîndar jî di dilê xwe de her tim fikara bîranîne dikşîne. Ji Xwedê re ku di berîka ebdê xwe de ji xwe pêştir tişkekî nebîne xweşiktir çi heyel!”
 Teknîsyen û Mihasebevan di şibakê de dinêrin. Gava Şêx fîrq dike ku li wan dinêrim, şerm dikim.
 “Zanayê Xereqanî, bi hîkmeta ku jê re hatîye bexşandin dipeyivî. Rojekê wiha gotibû, “Tu dizanî gelo agahîyeke qasid heye?” pîrsa “Çi ye ezbenî?” kirin. Wî jî wiha bersivand, “Xwedê, hîkmetê dişîne û heftê hezar melek jî pê re dikevin milê hev û digerin. Dixwaze bikeve dilekî ku tê de hezkirina dinyayê tune û di wir de bi cih bibe. Gava ku cîyê xwe dibîne jî, ji melayketan re dibêje, “êdî hûn jî vegezin cîyê xwe.” Û hîkmet jî roja piştî wê, bi zimanê kesê ku di dilê wî de bi cih bûye dest bi xebardanê dike.”
 Mîna ku hevoka xwe di nîvî de hiştibe disekine.
 Bêdengîyeke kurt dibe, piştî dîsa tevdigere û dibêje, “De haydê kerem bikin, em li hewşê çay vexwin; heval jî bila li karê xwe binêrin...”
 Herkes radibe ser pepîkan.
 Em dertên.
 Teknîsyen nêzî min û derhêner dibe û dibêje, “Kekê roj qedîya, em ê hê herin setê saz bikin...”
 Bêsebrîya derhêner hinek danîye.
 “Temam e, em ê çayekî vexwin û herin.”
 Şêx xatir dixwaze û diçe.
 Mînubusa me ber bi Tabyayan ve dimeşe.

29.

Gava ku em ji wirê dertên, kaxizekî ku murîdekî xiste destê min vedikim.

“Li ber derê kî salekî bisekinî, dê paşîyê rojekê bibêje ku “Ka were, ewqas wext tu çima sekinî?”

Li ber derê Wî pêncî sal bisekine, ez ê bibim kefilê te.

Duh min jê xwestibû ku ji bo min ji rêzê rûpelekî pirtûkê veke û hevoka ku pêşî ket ber çavên te, ji min re nîşe bigre.”

Li binî bi nivîseke ku hêsan nayê xwendin, “Ê ku kefil e: Xereqanî” hatîye nivîsandin.

30.

Rojekê ji merivekî gervan ku hatibû dergaha te, te pirsra, “nîşaneyê merivê ku aqilê xwe nas kirîye çi ye?” kiribû.

Mêrik wiha bersivandibû, “Ew kes e ku destê xwe diavêje hûçikê xwe û tiştê ku heta niha nexistîyê derdixê. Te gotibû, “Na, merivê kamil ew e ku her tiştî bi aşkere dibîne û hewcê berîka xwe nabe ku destê xwe biavêjê.”

Ez ji van gotinên te fêhm nakim. Gotinên te ez dişewitînim, nikarim bisekinim.

Qasê carekî dikevî xewna min, gazî min dikî ku werim ber derê te.

Tu dizanî ku ez birîndar im, gelek gunehkar im, ti av min nikare paqij bike.

Gava ku ez zarok bûm min digot ez ê mirî ji mirî nestînim, ji min re zanîn ne lazim e; min digot ez ê tenê ji te bixwazim. Qet hevalên min çênebûn. Tena serê xwe bûm. Di kêmkorineyek de, di şiverêyeka ku ji qula sêncên binîya beçê me de bû ku min vekiribû, derdiketim û şiverêya bêdeng de bi şevan dimeşîyam. Ne di kuçê de di nava tirsê de dimeşîyam. Mîna navbireke tirsê bû.

Min tenêtîyê li wirê dît. Dirûvê mirovan pê dixist.

Min wê çaxê dîtibû ku dirûvê tenêtîyê herî li mirov dixê.

Êdî piştî wî min dirûvê mirovan jî her tim dişiband tenêtîyê.

Carinan li cîyekî kuça ku ez lê disekinîm, min li valahîyê dinihêrt.

Destekî serê min radikir, digot li esmana binêre, tu ji wirê hatî, warê te wir e, bikeve ronahîyeke ku şayanê wir e. Ez ê vîya bi çi awayî bikim?

Îlimê xwe ji zindîyekî ku namire bistîne, mirî ji mirî nestîne.

Min vî dengî bihîstibû.

Min jî gotibû, ez ew defter im ku hemû raz têde tên nivîsandin, ez bitûnê wê defterê me.

31.

Em li ber tabyaya bênav in ku ji hendekên li hev didin girêdan ên li ser girê Korkûyûyê (Bîrakor) û ji çalên tankan ên li bakûr û başûrê wî ne pêk tê. Hemdî efendî, bi behsa tezkereya Fahrettîn Erdogan ku bi îmzeya general Asser sitendîye dest bi gotinên xwe dike. Li karûngayên ku zevîyên der û dorên wan vekirî dane binê agir dinêrim. Piştî ku zinarên li hinek pêşîya avahîya sêgoşe ku ji tabyayên Ereb û Karadagîyan hatine çêkirin dîmenek digrim, di plana pêşî de dîmenekî giştî tomar dikim, wêneyekî nêz dikşînim. Mîna tabyaya Ereban ku bi hendekên siwaran hatine dorpêçkirin, virê ji bo ku hêzên dijmin bikşînin û tune bikin nehatîye sazîkirin.

Hemdî efendî dibêje ku general tezkereyê li ber tabyayê, di halekî mewzîgirtî de, ajanseke ku ji Qûleya Eyfelê derketîye jî pêve datîne û dişîne. “Piştî ku Êris vedikişin, hikumetên cîgayî ku li Qafkasyayê tên ava kirin, ji bo ku xwedî li cîyên dagirkirine derên belgeyên pênsed salî derdixin û delîl nîşan didin. Dibêjin van erdan yên me ne, vana jî delîlên wan in. Yên ku vîya nikaribin nîşan bidin, nikarin tu heqekî li ser cîyê ku dagirkirine bixwazin. Dewletên lihevkişî dê îdiayeke wiha qebûl nekin...” Hemdî efendî dibêje kurtasîya tezkereyê ev e ezbenî.

Fahrettîn Erdogan dikeve nav fikara, bi gotina, “Hevalno em ê bersiveke çawa bidin van a?” difikirin. Çareserkirina pîrsgirêkê dide ser xwe. Rojeka Înê, çaxê nîvro, rica dike ku heyeta Îngilîzan werin cîyê ku mizgefta Ewliyayê li wir e. Ew jî komekî ava dike, bi Serpel Foltînê ku serê heyetê ye re hevdtînek pêk tînin. Piştî ku xelk ji nimêja Înê belav dibe, ew jî derbasî turbeya Xereqanî dibin. Xereqanî li binê sindoqeke dirêj a ku serê bi potekî hevrişim hatîye girtin radizê. Fatîha dixwînin. Birîtanî jî şewqeyên xwe deranîne, bi hurmet disekin. Li ser kevirê mermer ê ku li şûna serê wî ye, tarîxa mirina wî çar sed û bîst û pênc dinivîsîne.

Serpelê Îngilîz pîrsa, “Kî radizê li vir?” dike. Fahrettîn Erdogan dibêje, “Li gorî ku em ji Ewliyaya Çelebî hîn dibin Ebûl Hesênê Xereqanî ye.” Tiştê ku di derhêqê wî de dizane dibêje. Di derheqê bajêr de ji Îngilîzan re tenê ev tê gotin. Îngilîz jî bi awayekê îqna bûyî diçin. Hemdî efendî piştî ku van tiştan dibêje, pîrsa duduyan a derhêner dibersivîne.

Dibêje, belê rast e, bûyer li Mizgefta Mezin a ku di nav kelê de ye qewimîye. Însanan bi saxî şewitandine.

Wexta nimêjê bûye.

Komkujîya Başbaglarê tê bîra we gelo?

Derhêner dibêje, “Belê”.

Mîna wê bûyerê.

Piştî em mizgeftê dikşînin.

Hemdî efendî dibêje, ev mizgeft di dema Sultan Îbrahîm de ji aliyê Dîlawer Paşayê Mîrê Qersê ve di sala hezar û şesed û çil û sisîyan de hatîye çêkirin û di wexta dagirkirina Êrisan de hatîye xerakirin. Ji êrişên Ermenan herî zêde Qers zirarê dîtîye. Ji Wanê zêtedir meriv li vir hatine qetilkirin.

Ji berîka xwe tomarekî kaxizê kevn ê ku çilmisîne derdixê û dibêje, “Binêrin, van sûretan ew name ye ku ji alîyê Mela Ahmed ve ku meleyê karyeyê ye, di roja sisîyê meha heftan a sala hezar û sêsed û sî û şeşan de, ji bo efradê Ersînekê, ji Serfermandariya Cepheya Şerqê re hatîye şandin.” Dest pê dike û dixwîne: “Birayên min ê misilmanê ku her yek ji wan eskerên Îslamê ne, serê pêşî bi hezar silavên germ li we silav dikim, destê mezinan radimûsim û çavên biçûkan jî maçî dikim. Birano, hûn dizanin halê yê ku dîl bikeve destê kafiran çawan e. Lê belê dîlî û heqareta vê carê ti wext nehatibû dîtin. Ji çaxa bavê Adem vir de zilmên wiha ne bûne û ne jî dê bibin. Nayê ser zimanê meriv ku meriv bibêje û jixwe ziman qîm nake jê re. Lê belê li ba xelkê ayan e. Dengê sebî û pîrekan li esmanan olan da, felekên wan girîyan. Ger ku dijminê me dijminekî mezin bûya dê mirov xemgîn nebûya. Lê belê bi bêwijdanî û bi bêheqîqetîya me, berîya kuştina bi destê çar neferên ermenî ku bi awayekî stûxwar û çavên bi hêstir li wir bi kêran qetilkirina me ya bi ezayên mezinê herî mezin, em hatin kuştin. Miletê carekê ji mal, hesp û dewaran destê xwe kişandîye. Namûs nema. Ger ku ji can bê pirsîn, ji nêvî zêdetir ê Îslamê, belkî ji sisêyan yek maye ya nemaye. (Gava ku ji gundên Qersê yên li dora Merdenîkê, ji karyeyên Bûrgoş û Mîhrîlê goç dikin, li nêzî Ersînekê cîyê ku jê re dibêjin Karçûkbogazi, ji merivên ku goçkirine bîst û heşt cinaze veşartin û yê din jî ku ji karyaya Arsînekê [Ersînek] mîna çaran yek dût e û li wir ku jê re dibêjin çemê Parsîlê, ji vana maada ermenîyek bi zimanê xwe dibêje ku vana dê çi bibe li cîyekî ku jê re dibêjin Ayideresî ku li Allahuekberê ye, di şikeftê de ji van goçan heştê nefer kuştine. Serfermandarekî me yê ku navê wî Qesab Paşa ye heye. Dê wiha gelek qesabîyan bike.) hat nivîsandin...”

Derhêner xwe nagire û tomarê dide sekinandin, Hemdî efendî hişyar dike, “Ji kerema xwe re bersiv bidin pirsên min, ger ku di derheqê bersiva we de be ji kerema xwe re belgeyê bidin me, em dîmenên wan jî bikşînin... Di şûna xwe de nexwînin.”

Hemdî efendî dibêje, “Biborin, min got belkî ji bo temaşevanan feydeya wî hebe û bi wî bawerîya wan baştir pê were.” Derhêner jî dibêje bêguman we bi wê nîyetê xwend; lê belê ev mesele ya dîroknas û yên ku pê re têkildar dibin e, ev pirsgirêk hêjî tên nîqaşkirin. Û bi ser de jî em rastîya belgeyan baş nizanin.” Ku Hemdî efendî xemgîn dibe, derhêner dibêje, “Temam, bila belge nên xwendin, tenê çend bûyeran ji me re vebêjin, yanî em dixwazin gotinên we bikşînin. Hûn amade ne? Baş e, tomar, fermo...”

Hemdî efendî piştî çend sanîyeyan ku difikire xeberdana xwe didomîne, “Bêguman van bûyeran li ser herdu alîyan jî, yanî hem li ser misilmanan û hem jî li ser ermenan birînên kûr hiştin. Bi jirêderxistina Avrûpayê, bi taybetî jî bi bayê nijadperestîyê re hin komên ne misilman ku ermen jî di nav wan de bûn rabûn ser pêyan, ku tehçîra zorê jî derket her tişt li nav hev ketîye, qetl û qitûl, îşkence û tecawuzên li derveyê mirovahîyê yên hovane hatinekirin. Tecawuzên ermenan bi taybetî sibata hezar û neh sed û bîstî de zêde bûne, bîst û heşt gundên derdora Şuregel, Akbaba, Zarûşad û Çildirê hatine wêrankirin. Nêzî du hezar nifûs hatîye qetilkirin, mal û milkê gundîyan û heywanên wan jî talan kirine. Cîwan û pîrekên misilman birine Gumrûyê, bi sedan pîrek û zarokên ku ji van gundan revîyane û xwe avêtine serê çîyayan li wir qefilîne... Gelê misilman ku vana dibihîsin tên xaleyanê. Zilma ku di nav sînorên hikumeta ermenan de li misilmanan têkirin, ji alîyê Rawlînson ve ku nûnerê Îngîlîzan ê Erziromê ye hatîye piştrastkirin. Heyeta Harbord a Generalê Amerîkî jî perîşanîya macirên ku zar û zêçê xwe winda kirine û di halekî nehal de xwe avêtine stara Osmanîyan dîtine û şahîdî kirine. Ermenan bi zanayî xwestine ku dubendîyê bixin nav eşîrên kurd û tirkên derdor ên gundî. Li ser vê armanca xwe jî gotinên mîna “Li herême hikûmeteke Kurdistanê hatîyê avakirin; Wan, Bêdlîs, Erzirom û Tirabzon ketîye destê Ermen an” belav kirine. Û gotine ku yekî mîna Şerîf Paşa ku xwefiroş e, nikare li ser kurdan gotinekî bibêje. Her wiha li her derî, bi taybetî jî ji hikûmetên lihevkiirî re çend caran gotine ku bi ti awayî dê kurd ji camîaya Osmanîyan veneqetin...”

Dengê Hemdî efendî tîz dibe. Hemû van çîrokên alîyekî kabûsek ku meriv di xewna xwe de dibîne nîşan dide. Îcar alîyê din ê dîwar heye. Li wir jî çîrokên heta tu bibêjî hene. Min di

belgewara bi navê “Mezalima Ermenan” de ji van çîrokan gelek guhdarî kiribû. Derhêner, piştî hevokeke dirêj a Hemdî efendî ku gava bêhna xwe dide ew jî tomarê dide birandin û dibêje, “Ji min tirê qey dê bes be.” Gava ku gotina Hemdî efendî cara duduyan tê birandin baş dilê wî dimîne.

Piştî sekneke çend deqe yên nexweş, derhêner dibêje, “Bi rastî me bi taybetî dixwest ku ji devê we çîroka şêr tomar bikin. Ji bo wê jî hûn dixwazin em Pirakevir (Taşkopru) bikin mekan.”

Gava ku kabloyan û sehpayê dicivînim xwe bi xwe dibêjim em mekana bikartînin.

Em her tiştî bikartînin.

Çend deqe şûnde em di mînîbusê de ne. Nakeve aqilê min ku ewqas arazîyên berfireh û vala hene; lê belê bajêr di cîyekî teng de ava kirine. Ji bînayên bilind û ji wan “sîte”yên ecêb li vir jî hez dikin. Xwe bi xwe dibêjim, “Gelo çima derveyê me ewqas bêteşe ne.”

Teknîsyen dibêje, “Osta, tu îro baş î gelo?”

Mihasebevan li Teknîsyen difetile û li ser min dibêje, “Belê, misêwa xwe bi xwe xeber dide.”

Gotinek ji devê derhêner dernakeve.

Hemdî efendî, pirsra şofêr ku dibêje, “Merivê qaşarê kevn ê baş li ku derê bibîne?” dibersivîne...

32.

Tê hişê te ku derwêşek te yê dilpak hebû?

Jixwe tê çawa jibîr bikî.

Rojekê ji te re gotibû,

“Ger ku ez pêşîya te bimirim, di wexta sikratê de tê li ber serê min bisekinî gelo?”

Te jî gotibû,

“Ger ku sî sal berîya te jî bimirim, di wexta mirinê de ezê dîsa li cem te bim.”

Derwêş girîyabû.

Çend roj şûn de tu çûyî ser dilovanîya xwe.

Di navberê de sî sal derbas bû.

Îcar Ezraîl hat ba derwêşê te.

Dostên wî li dora wî digirîyan.

Bi çavên nîvxerîqî li derî dinihêrt.

Gava ku te dît bêhna wî derket.

Got, “Hiş bin, ronîya çavên min hat, ji min re hêsanî ye êdî.”

33.

Em diçin ser pira ku du çavên wê hene. Pir her du alîyan digihîne hevûdin. Ne wisa ne ku em hevl didin da ku piran di navberî hev de saz bikin. Em piran diavêjin û dixwazin xwe di wir de bi cih bikin. Gava ku em di wir de diçin û tîn, di hişê meriv de bi cih bûn derbas dibe. Te digot çî, bi gotina te ya em çûn cem ustadekî ecêb mam. Ez tu car neçûm ba murşîdekî, ustadê min Ew bû. Murîdê min jî çênabe, jixwe îddîfayeke min a wisa jî tune, min tenê got Xwedê, ewqas.

Mîrza Hemdî bi gotina “Ellah...heq Ellah” dibênije.

Gava ku pir xuya dibe, Derhêner ji şofêr re dibêje bisekine.

Em disekin.

Pir yên vir û wir bi heva girê dide. Du qeraxan digihîne hevûdin. Du alîyan digihîne hevûdin.

Ev ewqas sal min bi daxwaza gihîştina te derbas kir.

Gava min di xewna xwe de didît ku ji turbê derbas dibim, te dîyarîya ku dişibe xemgînîyê ku ruhê min dorpêç dikir ji min re zêde dît. Derhêner şûna kamerayê belî dike. Sehpayê tînim û bi cih dikim.

Dengvan, mîkrofona mîrza Hemdî girêdide.

“Em amade ne?”

Dibêjim, “Temam e.”

Derhêner bi gotina “Tomar” diqêre.

“Ezbenî, hûn dikarin têkilayîya di nav Îbnî Sîna û zanyarê Xereqanî ji me re vebêjin?”

34.

Ey dilber, herkes dikare ebdîtiyê bike, ew nîn e derdê min.
Ez dixwazim ji emelê wî xelas bibim.

35.

“Ezbenî, hûn dizanin, Îbnî Sîna alimekî mutebahhîr bû. Di pirî Fenan de hunerwer bû. Feylesof bû. Hekîm bû. Derhêqê ezman, stêrk, heyv,tav, tevger û sekina dinyayê de xwedî agahî bû. Lê belê gava ku di derenceyan de derdiket li cîyekî sekinî, pêplûk qedîyabûn. Li vahîyê nihêrt. Tiştêkî nedît. Qasekî bi awayekî bêçare li wir ma, peyre xwe bi xwe got, “Divê ya ez vegerim an jî bisekinim.” Dest bi seknê kir. Qasekî dirêj wisa sekinî lê ti ronahîyek nedît, wisa fikirî ku ji vegeerê pêştir çareya wî tune. Peya bû. Li dilê xwe nihêrt. Agirekî Xereqan ketibû nav dilê wî, dişewitî. Xwest ku here zanyar bibîne, ji wî destûr bixwaze û xwe bi wî ve girê bide. Lê ev jî nisîb e. Bi xwestinê nabe, xwestin gavekî ye. Divê meriv ji dil û can daxwaz bike. Daxwazkirin jî tena serê xwe nabe. Divê meriv bigere. Bi gerê jî nayê dîtin. Tê gotin ku yên dîtine ew kes in ku gerîyane; lê belê hûn xwe bi vîya jî nexapînin. Dibêjin ku xebatên rêwîyên vê rêyê çil sal e. Ji bo rastbûna ziman divê meriv deh sal zehmetî bikşîne. Di deh salên duduyan de dest rast dibin. Di deh salên sisêyan de çav, di deh salên dawîyê de jî dil paqij dibe. Kî ku çil sal wiha rê here û ji doza xwe re dilsoz bimîne, ji zimanê wî meriv dikare hêvî bike ku dengêkî bê xwebûn jê derê. Wisa tê dilê min, gava ku Îbnî Sîna dihat Xereqanê li pey vî dengî bû. Vê hêvîyê wî kaşî wir kir. Tê gotin ku nanê feqîran hêvî ye. Carekê Mehmûdê Qazneyî Îbnî Sîna vexwendibû qesra xwe. Lê belê banga wî neanî cî. Li ser vê dan pey wî. Ew jî revîya, xwe veşart, demekê li Dehîstanê ma. Gava ku gihîşt Xereqanê li devê gund mêrikekî kal dît. Pirsra, “Tekyaya Şêx li ku derê ye?” kir. Mêrik got, “Kîjan Şêx?” Gava ku got, “Ebûl Hesen” mêrik gotina wî birî û jê re got “Te bereday xwe reht kirîye, vegere, ew dibêje ez xwedî sirr im; lê belê bingeha karê wî tune.” Îbnî Sîna li ser gotina xwe bû. Got madem ku hatime, heta ku ez wî nebînim naçim. “Tu dikarî cîyê dergaha wî bibêjî?” Li gorî salixdayîna mêrik çû û tekyayê dît. Li derî xist. Hêdîka vebû. Li pişt derî pîrekek bang kir, “Hûn çi dixwazin?” Îbnî Sîna zanyar pirsî. Jinik bi gotina “Hûnê çi bikin ji wî kotîyê!” bi sûfê wî ket.

Ku deng nehat, jinikê gotina xwe berdeyam kir, “Ne li malê ye, çû ku ji daristanê êzigan bîne.”

Ecêbmayîna Îbnî Sîna zêde bûbû.

Jinikê bi gotina, “Hûn ji ku derê tîn, hûn kî ne?” ji Îbnî Sîna pirsî.

Got, “Ji Harîzme.”

“Hûn çî karî dikin? Çima li wî digerin?”

Got, “Ez zanyar im, ez hewceyê feyza wî me, ji bo vî hatim.”

Jinikê got, “Ew dînekî wisa ne ku xwe xwedî sirr dihesibîne, dê feydeyê wî nehigîje we.”

Îbnî Sîna got, “Hûn çîyê wî tîn?”

Got, “Ez pîreka wî me.”

Ji ber derî veqetîya, ber bi çolê ve meşîya. Piştî qasekî din zanyar tevî sê şêrên ku êzing barkirî bûn derket û hat. Îbnî Sîna ji xwe ve çû.

Ku nêz bû got, “Şêxê min ev çî hal e?”

Zanyar got, “Belê, heta ku em barê gur ê malê nekişînin, şêr jî barên me nakişînin...”

Îbnî Sîna bi dil û can bawerî bi vî gotina wî anî.

Vegerîyan dergahê.

Heft roj li vir ma. Gava ku vegeyîya bû ji hevalekî xwe yê zana re wiha gotibû, “Hemû tiştên ku em bi aqilê xwe dizanin, ew bi dilê xwe dikare bibîne.”

Hemdî efendî wisa difikire ku bersiva xwe zêde dirêj kir û disekine.

Derhêner piştî ku qasî deh sanîyeyî tomar tê kirin dibêje, “Baş e; lê belê qet perwerdeyê nedîtîye, wek mînak zanînen wî yê diderheqên hedîsan de ji ku derê tê, qet seydayê wî çênebûne?”

Hemdî efendî dibêje, “Divê meriv li derve nenihêre, meriv li dil binêre. Di hundir de yekîfî heye. Gava ku derve pirayîyê derxist holê, hundir li dijî wî dertê. Gava ku hundir jî yekîfîyê derxist holê, bi piranî derve jî bersiv dide wî. Lê belê yê ku dipirse jî û yê ku bersiv dide jî bi heyînen xwe yek in. Zanyar dibînin ku ew bi xwe jî mîna tiştên ku paşîyê hatine afirandin, eynî Heq in. Bûyîna eynî Heq jî, bûna reşahîya çevên alemê ye. Xereqanî jî wisa bû. Feyz, bi navgîniya wî digihîşt yê ku hatine afirandin. Ji ber ku çavkanîya wî giştî bû, jê re mirov dihat gotin. Hemû rastîyan dorpêç dikir. Ji hemû tiştên alemê mînakek pêre hebû. Ji bo Heq di menzîla reşahîya çav de bû. Çawa ku reşahîya çavên wî bi tiştan têdigihîjî, Heq jî tecellîyên xwe bi wî didît. Madem ku reşahîya çav e, zanîna wî jî ji Wî ye. Hewce nake ku bixebite û sey bigre. Jixwe sekinandina wî ya deh salan a li ser turbeya Bayezîd jî vîya nîşan dide. Dikaribû biçûya medreseyekî û deh salan li wir bima. Ew, tiştên ku bê hewl dan meriv digihîjê xwest. Ez bi we re behsa bîrewerîyê wî ya li ser vî meseleyê parve bikim:

Tê neqilkirin yekî ku dixwest îlim bigire û li ser vî xwesteka xwe ji bo ku hedîsan bixwîne diçû Îraqê.

Rêya wî ket cîyê Şêx.

Şêx jê re got, “Te li welatê xwe yekî zana ku jê hedîsan hîn bikî nedît ku diçî siriştên din?”

Mêrik got, “Min nedît” û ji Şêx pirsî, “Lê belê we li ku derê perwerdeyê dît, we ji kî xwendinê girt?” Xereqanî got, “Ez ummî me, çî ji min re bexşandibe, minet nekir û ji îlimê xwe da min.”

“Baş e, lê hûn hedîsan ji kî guhdarî dikin?”

“Ji Pêxember.”

Ev gotin xweşa mêrik neçû.

Ew şev li wir bû mêvan.

Di xewna wî de zanyarekî ku wî nas nedikir jê re digot, “Zanyar tiştên rast dibêjin, ji ba wî neçe, tu dixwazî çî hînbibî ji wî bistîne.”

Serê sibê biryar da ku dê li wir bimîne.

Ew roj di seya pêşî de Xereqanî ji wî xwest ku hedîsên di hişê wî de ne yek bi yek bibêje.

Mêrik digot, Şêx jî bi gotina, “Belê, ev gotina Pêxember e.” piştrast dikir.

Piştî ku çend hedîsan got û gava ku hat ser hedîsekî Şêx got, “Na, ev ne gotina wî ye.”
Mêrik li ser gotina xwe ma û got, “Lê belê yên ku vîya ragihandine bawerî bi wan hatîye û agahîyeke qewî ye jî.”

Şêx jî got, “Na, ev gotin ne mumkune ku gotina wî be.”

Mêrik jê pirsî, “Hûn çawa ewqas ji xwe bawer in, hûn ji ku derê de dizanin ku ne gotina wî ye?”

Şêx wiha got, “Gava ku te hedîsê dixwend herdu çavên min li ser birûyên Pêxember bûn. Ku Pêxember birûyên xwe kir cot û mêze kir, ez fêhm dikim ku ev gotin ne ya wî ye...”

Gava ku gotina wî diqete dehêner destên xwe li hev dixê û dibêje, “Baş e, pir xweş bû kekê, tamam e, zor spas Hemdî efendî, saet xweş.”

Dibêjim, “Mîna qesekî sewîyeya ronahîyê ket, em li tomarê binêrin gelo?”

Derhêner dibêje “Ka em binêrin.” Paşve dilefînim û bi hev re em temaşe dikin. Pirsgerê tune. Bi gotina, “Mîna ku di vir de çavên te kûr de çûbin, ji min tirê qey tu birçî bûyî...” henekan bi Hemdî efendî dike.

Hemdî efendî jî di bin gotinê de namîne û dibêje, “Ku hûn destûr bidin ez dixwazim xwarinekî îkramî we bikim.”

Em xwe ji çûndinê re amade dikin. Em diçin tendûrvanê ku li hemberî mala Hekîm e.

Cîyekî biçûk ê paqîş e.

Gava ku servîs têkirin dibêjim, “Dê qasek şûn de ez ê werim” û dertêm derve.

Derhêner diqêre, “Tu dereng nemînî ha.”

Hemdî efendî devê xwe tije dike ku bibêje, “Meseleyeke din jî heye...” derhêner jî di ber xwe de dibêje, “Meseleyên wî naqedin.” Dengê wî qut dibe.

36.

Ger ku hûn wêrekîya min bibexşînin, ez dixwazim bipirsim ka wateyêke taypet a wî kolosê serê heye yan na.

Wêrekîya we tiştekî sipehî ye. Kolos ji çar tîpan pêk tê. Kaf, bangî dûrbûna ji xerabîyan dike. Lam, fermana lutûfkarîyê dike. Elîf, ji girîngîya wateya wî re îşaret dike. Hê, dibêje ku nasnameya xwe di Hû de bigere.

37.

Ey Nasirê Husrev nifetisim, bêhn li min diçike. Ez dizanim ku heta danekevim nav tevlihevîyên berê, ez ê rehet nekim. Lê belê newêrim. Misêwa direvim. Ji pirsan, ji dangan, ji mirovan, ji rastîyan, ew tiştên çawa bin, çi bin, kî çawa wan belî dike jî ji wan, ji xewnan, ji bîrewerîyan, ji pirtûkan, ji xwe direvim. Ev ne sancoyê peyivên nû yên ku li ber zayîne ne jî. Ez nizanim ev çi ne. Kolan çiqas gemar in. Ji bo ku pêlî çalekî nekim, nekevîmê, neşewişim, bala xwe didimê, diwestim. Peykerê jineke tazî, li balê bufe, gava ku cigare distînim wê nîşan didim, dibêje, “Ez nizanim keko, şaredarîya me dibêje peyker û ji me re xizmetê dike...” Îro gava ku bi Mihasebevan re me rojname disitend, tê bîra min li hundir camêrekî ku dirûvê karmendekî malnişîn pê dixist, behsa Sorosê dikir û digot, “Heta ku sînoren Ermenîstanê negihîjin Erzeromê vana rehet nasekinin, yên ku ji memleket re xizmet kirin bi tewanbarîya îxaneta welat hatin daleqandin, cezayê vana darexaçî jî nikare bikşîne...” Peyre bi gotina, “Dixwazin camîya Kumbet dîsa bikin dêr” gotina xwe berdewam kir, “Dixwazin ji bo kullîyeya dergahê bikin gelemperîkirî, lê bi rêya waqifan pêşî digirin, dixwazin dilê Qersê xera bikin...”

Hinek gotin mîna tov in, gava ku mezin dibin darekî ji nav wan dertê. Êdî her gotinên ku dibihîzim, bi barekî wiha li mêjîyê min dikevin.

Dikevim înternet cafeyê. Gava ku Inbox’ê vedikim sehekên min piştrast dibin. Mi mehan e dengê ji te nedihat. Rûpelê vedikim. Defterên berê vedikim. Ez dizanim tê dîza min biêşînî. Du peyamên te hatine. Ya yekê vedikim: “Ger vê kilamê bibûya berahîn û min dikaribûya bigota, ji bo min tu mîna herkesîyî...Dê ewqas dinya bi zehmet nihata ji min re, dê ewqas bi şewat nîn bûya. Ez dixwazim cara dawî bangî te bikim. Ê min dixwest ku bawerî bi vê kilamê bînim. Ger ku peyiva jibîrkinê hebe, ji min tirê qey dê ew bi xwe jî hebe, dibe ku navê tiştêkî ku tunebe hebe? Bi dîtina te jibîrkinê heye? Ez heyrana te me ku dizanibî ji min re vebêje, rêyekî nîşanê min bide, ji min re bibêje ku tu di vir de bimeşî dê tê derêyî silametê. Bîrewerî, dîmen, deng, vana her roj min tarûmar dîkin, taqeta min nema. Xewna min rast derket. Nizanim gelo tê hişê te? Hê berîya ku tê bihatîyayî vir bû. Min ji te re behsa xewneke xwe kiribû. Min gotibû ku: min daristanekî dît di hişê xwe de, li wir hêlekanên mezin û malekî hebû, bêhn li min çikîyabû, min destê xwe dabû ser dilê xwe û li daristanê dimeşîyam. Bi carekê ve min xwe li kolanekî bitoz ya Enqereyê dît û ew deng: Nîvê şevê, li daristanê çi karê keçîkekî heye... Toz zer bûn. Gava ku min vê xewnê dît, min hest kiribû ku dê rojekê qeder were û min bibîne. Bi rastî vê hestê hergav bi min re hebû, gava ku min li çemekî dinihêrt, gava ku min li darekî dinihêrt û diponijîm, gava ku min li sûretekî bihêvî yê zarokekî dinihêrt jî hergav min vîya hest dikir. Dîsa jî min dixwest ku li wê daristanê, li bin pelên darê ku bi bayê diçûn dihatin û bi heyvê re dileyîstin bijîm. Dê şev me biveşarta, dê em ê xwe biveşartana jî qerebalixên kolanan. Gava ku min tu nas kir bi carekê ve min fîrê kir, tu jî dizanî wî cîyî, cîyekî ku mirovan nekiribû çol hebû. Ew cî hê jî heye û ez li wir dijîm. Nenihere ku ez li bajêran, li kuçan digirim, ev xeyal û leystîkekî ye...”

Her tim çûndina kokê tê ji bîr kirin, daketina bingehê... Nîşaneyê pirsê baş li cî nayê danîn. Tu hêjî min diêşînî. Tu çiqas xweş min diêşînî.

Peyama te ya duduyan bi zorê vedikim:

“Duh Zeynep ji min wiha pirsî, Dayê, tiştêkî ku Xwedê neafirandibe tune ne wisa?”

“Belê keça min, Wî her tiştî afirandîye.”

Got, “Lê belê ez dizanim ku Ew nikare xwe biafirîne.”

Mîn jî got, “Ew her tim hebû keça min a delal.” Peyre min sûreya Îxlasê jê re xwend û meseleyê vegot.

“Hebûna Wî ya bêdawî çî xweş e...”

Dûvre got, “Dayo, min bêriya bavê xwe kir” û dest bi girî kir, fetilî û raket.

Tu dibînî Nasirê Husrev, tu dilan paqij dikî, ez kaxizan qirêjî dikim.

Gava ku min firq kir her tiştê ku min wek dîyarî didît ji min re bûn wekî pirsgrêkeke ku divê bê çareserkirin û ew roj pê de min xemgînîyê, yanî ji bo tiştên berê kesirandin û xemgînîya tiştên nemumkun, ji xwe re kir kar û bar.

Ji min re behsa Xereqanî bike ey Nasirê Husrev, agirê nav dilê min geş bike, min bişewitîne, xeynî van tiştan çî gotin biqîmettir e ku meriv bibêje?

Tu dibêjî çî, ez fêm nakim, gava ku tu dibêjî ucûd dixwazî çî bibêjî?

Heyîn e?

Nasirê Husrev Ew çî ye, heyîn çî ye?

Ez dizanim ku ev gotin bi min nakevin.

Ax bêjedarîyên din! Ax xwezî xwe xapandinê!

Wisa be tu bibêje: Kes li ser xwe bi qasî bejna xwe dikare bipeyive û binivîsîne. Kes li virê li ser çîmên xwe yan jî bi derenceyan ve nekişiyaye, li ser pêyên xwe yê tazî ye. Ji min re vebêje, gava ku Nasirê Husrev hat hizûra te çî got.

Dibêjî, “Got gava ku bi laşê xwe gihîştim hizûra Wî, min gazî dil kir, hat.

Peyre min gazî bawerî, yakîn, aqil û nefse kir.

Hatin.

Mîn ji nava her çaran dil hilbijart û girt.

Ew jî rakir yakîn û emelê salih.

Emelê salih jî rakir kiryarê.

Paşîyê gihîştim Heq.

Hatim cîyekî wisa ku êdî min xwe nedît.

Tenê min Wî dît.

Paşîya paşî wan çar tiştên min ê ku min bir; aqil, nefis, bawerî û yakînê hewceyê min kir.

Çima tu fêm nakî ku ez hewceyê te me? Çima tu hêjî destên min jêdikî? Naxwazim her tiştî bi dirêjî ji te re vebêjim. Dengê min, min diwestîne, çima tu min didî xebardan? Te ez hiştim û çûy. Te got ez dixwazim herim. Me du heb avahîyên xurûrê ava kiribû. Çavên me li berê diçirîsî. Peyre me fêm kir ku ew der hucreyeke teng e. Êdî her tişt derbas bûbû.

Me wî xera nekir.

Me nikaribû bikira. Wî me xera kir.

Avahîya te li ser te de, ya min jî li ser min de xera bû.

Va ye em di binê xirb de ne.

Li ser me blokên betonê, sitûn, kolon, kêrîş, çîmento, tûle, toza kirêca şewitî... Difetisim, êdî nenivîsîne, deng nede min.

Te çî xwendibe jibîr bike. Te çî nivîsandibe bişo, bavêje avê.

Pirtûkên xwe têxe sindoqan, bixê binê erdê.

Ji keça min re bibêje ku min pir bêriya wê kirîye.

Jiyana te çawa dimeşe?

Xwezî ku min zanibîya. Xwezî ku min xwe bidîta.

Mîna ku ez li hespekî siwar bûbim, ger ku cirxweş be dê min bikşîne, ne wisa be ez ê qûçî erdê bibim... Mîna wî, mîna te, siwarekî bereday im, ez rastîyê jî qeraxê wê jî nizanim. Li pey wî paş de mayîna qasî rêyeke ku du salan dûr e jî nizanim.

Ji min re behsa çûndina xwe ya Xereqanê û çawa bêhna wî ya xweş di dilê te de belav bû bike ey Nasirê Husrev. Ji min re behsa bersiva wî ya pîrsa, “Ez ê çawa dev ji paşgo berdim û bi ehlê hal re bibim heval?” bike.

38.

Bi van gotinan bangî min kiribû, “Ey bêçare, ey merivê saf, ka tu çawa dikarî bi min re bibî heval. Bi salan e tu bûyî girtîyê aqil. Min, roja ku pêyê xwe avêt meqama egîtan, dev ji aqil berda.”

Demekî li dergaha wî mam. Min dest bi rîyazetê kir.

Min pir hindik dixwar û vedixwar. Xwarina min perçeyek nanê ceh û tasek av bû.

Ez nedipeyîvîm.

Roja çilî min verê kir, çûm Xorosanê.

Tu dizanî, malabateke min a zengîn û bi navûdeng hebû. Hetanî temenê xwe yê çil û sisyan li qesra Qazneyê xebitîm. Çaxa ku Belh ket destê Selçûkîyan çûm Mervê. Di dema Çagrî beg de di qesra Selçûkîyan de jî xebitîm. Min gelek mey xedixwar. Demên ku hişê min li serêmin bû kêr bûn. Her cure şahî û araqê min tehm kir.

Şevê di xewna xwe de min dengê bihîst.

Digot, “Tê heta kengê meya ku aqilê te ditevizîne vebixwî? Çima tu aqilê xwe nadî serê xwe.”

Min jî jê re got, “Fîlozof, ji bo ku derdê dinyayê kêr bikin, mecbûrî vedixwin.”

Got, “Tu nikarî bi hindakirina xwe û bi tevizandina aqilê xwe bigihîjî aramîyê. Tê bi bêaqiltîya xwe ji însanan re rêberî bikî? Tişteki ku aqil û hişê te paqij bike bixwaze.”

“Ez dikarim wî li ku derê bibînim?”

Got, “Ê ku bigere dê bibîne.” û qîbleyê nîşan da.

Gava ku şîyar bûm, bêsekin çûm qesrê û ji peywira xwe derketim.

Derketim sefera qîbleyê.

39.

Me Te bi tişteki newesifand. Tenê em bûn eynî ji wesfê te.
Te xwe ji me re vegot.
Kîngê ku em te bibînin, mîna ku em xwe dibînin.
Kîngê ku em xwe bibînin, mîna ku Tu xwe dibînîyî.

40.

Vedigerim loqenteyê.

Bêhna derhêner teng bûye, ji min re dibêje, “Mamoste li ku derê mayî, me ji tirê qey tê nêyî.”

“Gihîn hêdî bû, bi ser de jî min nikaribû bi klavyeya Q binivîsanda, biborin”

Bi gotineke kurt dibêje, “Ne girîng e, bi lez bixwe em rabin.”

Bi nîyeta ku ez ê di rê de bixwim xwarina xwe dikim pakêt.

Berîya ku em ê bikevin rêya kelê, dikevin milê rastê û di qeraxa çem de diçin.

Dibêje, “Piştî ku me çem kir fon, em ê çarçoveyeke ku dar, çîya, av û peyvdar tê de bin çêbikin.”

“Baş e.”

Em li ser kanîyeke ku ji Osmanîyan maye disekin. Çawa ku em peya dibin berf dest pê dike.

Şofêr dibêje, “Apê Hemdî hûn di erebeyê de bimînin, hazirîyê wan zû bi zû naqedin.”

Berf zêde dike, ji xeybê destekî dirêj dibe û her derî bi rengê sipî boyax dike.

Şofêr milê xwe sipartîye cama erbeyê û dibêje, “Êêê, dê dawîya vî karî here ku apê Hemdî?”

Dibêje, “Law, ez ji van karan fêhm nakim; Lê belê lazim e ku dil di dawîya kar de bigihîje cîyekî wisa ku divê dengê dilê xwe bi guhên xwe dikaribe bibihîze, gava ku dengê wî qut bibe jî, nura dilê xwe, divê bi çavên xwe yên ku di serê wî de ne bibîne...”

Şofêr dibêje, “Apo te gotinên mezin got.”

Derhêner dikeve nav heyteholekî û dibêje, “Hadê hevalno, hinek bilezînin, bila efekta berfê ji destê me neçe.”

Qasî lepê meriv berf dibare.

Hemdî efendî dixwe nav çarçoveyê.

Dibêje, “Li vir, di derheqê Şêx de çi tê ser zimanê we vebêjin...Bila jixweberî be.”

Hemdî efendî ji gotina jixweberî tiştêk fêhm nake; lê belê dibêje, “Baş e.”

Dest bi tomarê dikim.

Dibêje, “Ezbenî, mîna ku hûn dibînin berf me dorpêçkirîye. Wisa be ez dixwazim behsa dorpêçkirinê bikim. Rojekî ji Heratê zanyarekî û dostên xwe hatin zîyareta Şêx. Gava ku tîna nêzî Xereqanê, dilê hinek ji wan diçe helawa ku nû çêbûye. Yek ji wan dibêje, “Ez ê helawa germ bixwazim.” Zanyarê Heratî dibêje, “Ez meraqdikim ka gelo ji gotina “Xwedê esman dorpêç kirîye” çi fêmkirîye.” Derwêşekî jî got, “Ez meraq dikim û dixwazim ku ji Şêx hikmeta ramana ku dibêjin “Sofî ne ji yên ku hatine afirandin in”, hîn bibim.” Yekî din jî ket nav gotinê got, “Ez dixwazim mezhebê wî hîn bibim.”

Ezbenê ez gotina xwe dirêj nekim, welhasil hatin gund, gihîştin dergahê. Çawa ku di derî de ketin hundir Xereqanî ji murîdê xwe re got ku helawê bipijînin. Helawa ji arvan a germ qasek şûn de hat. Xereqanî, ji bo ku gepa pêşî zanyarê Heratî bixwe, teyfikê dirêjî wî kir. Çawa ku tehmê da devê wî ji wan re got, “Wateya gotina “Xwedê erşê îstîva kir”, dost tenê ji dostên xwe re vedibêjin.”

Peyre, “gotina ku dibêjin “Sofî nehatine afirandin” tê vê wateyê, “Sofî ne ew kes in ku birêve diçin, dipeyivin, deng diçe wan, dixwin, vedixwin û radizên. Sofî, yek ji wesfên Heq in.”
Mêvan mit û matmayî mabûn.

Gotinên xwe berdewam kir, “Mezhebê me mezhebekî rast e.”

Li ser vê gotinê Heratî peyivî û got, “Ez gencîneyeke veşartî bûm, mifteya wî di destê Xereqanî de bû. Li vir ne ez heme ne jî Xereqanî. Li vir ne avahî hene ne jî xirbe. Ka çawa vê sîrrê tê dikaribî bizanibî, nebî ku tu vî sofîyê mîna yekî ku hatibe afirandin bizanibî.”

Derhêner bi kêfekî zêde diqîre û dibêje, “Ustad, tu muhteşem î.”

Difetile û dibêje, “Mamoste tu bi kitekitî bikşîne.”

Dibêjim, “Temam e.”

Kitekitan dikşînim, tiştên ku dibînim dikşînim û digirim.

Bi salan e di nav xwe de kitekitan berhev dikim.

Ev kitekit min giran dîkin, diwestînin, gavên min giran dîkin.

Ez êdî nikarim wan hilbigirim û bikşînim.

41.

Lewra ez ê wê şevê, ji xeynî te, dev ji her tiştî berdim.
Wê gavê ez ê dikaribim bi xwe re xeber bidim.
Dê ji te bersivek were.
Ez ê ji sînorên xwe derê, ez ê barên xwe deynim.
Ez ê bibêjim, “Kerem bike ey Rebbê min, ji fermana te re amade me!”
Ez ê bikevim îhramê. Li dora Te ez ê bigerim.
Ez ê Te tewaf bikim.
Di yekîtîya Te de ez ê tawaf bikim. Dê avahîya mala te min zîyaret bike.
Kabeya Te dê min yad bike.
Melayket dê min sena bikin. Ez ê ronahîya ku di qesra Te de ye bibînim.
Ez ê werim qesra Te.
Gava ku ez ê bikevim hundir dê ji min tiştekek nemîne.

42.

Derhêner dibêje, “Hevalno tamam e, bi ronkahîya serê sibê re em ê dest pê bikin, ji herkesî re spas.” Em melzemeyan dicivînin û vedigerin otelê.

Dertêm odeyê. Akuyan dixim şarzê. Hêla berfireh ji qutîya wê derdixim û paqij dikim.

Kamerayê baş ziwa dikim. Dikevim dûşê. Bi ava germ hinekî sist dibim. Ji banyoyê dertêm û xwe diavêjim ser cîyê xwe, televîzyonê vedikim.

Bernameyek nîqaşê. Pisporekî Îlahîyatnas bi devekî ku tûk jê divirvire diqîre; “Tu eleqeyeke vana û dîn bi hev tune! Ev jirêketin e. Ewliya tê çi watê? Ev, xwedakirina ebdan e. Şîrk e, pûtperestî ye. Dostê Xwedê çi ye? Tu ji ku de dizanî dostê Xwedê kî ye? Hem dost çi ye? Vana Xwedê dikin şûna mirovan, mirovan dikin şûna Xwedê. Tu ji ba Xwedê têyî gelo? Tu nikarî Pêxember jî mezin bikî! Ew jî tenê elçiyek e, postavan e...”

Nîqaşkerekî din dibêje, “Dîn karê aqil e, hele ku dîn ê me dibêje, hûn çima aqil nakin...”

Derbas dibim, nûçeyekî ku dibêje, “Li Mûşê çi dibe?” Pisporekî dibêje, “Meydana balefîran a Mûşê ji ber çêkirinê nehatîye girtin. Dê Amerîka muhîmmat û sewkîyata leşkeran ji vir jî bike.” Derbas dibim, Muslum Gurses kilama xwe ya bi navê “Bê te nabe” dibêje...

“Vê sibê bi tena serê xwe şîyar bûm

Bê te nabe, bê te nabe

Bêhnên her gav tune ne

Bê te nabe

Taştêya min ne taştê bû

Bê te nabe, bê te nabe

Cigareya min a pêşî jî bê tehm bû

Bê te nabe...”

Di nav erê û na de dibêjim, “bi te re jî nabe.”

Telefon lêdikeve. Mihasebevan dipirse, “Mamoste, hûn nayên şîvê?”

Dibêjim, “Na, hûn herin.”

“Çima, tu ne birçiyî?”

“Li hêvîya min neseकिन, ez ê paşîyê derêm.”

Dibêje, “Baş e.”

Ji pirtûkên walêz pirtûkek derdixim. Betanîyê li dora xwe dipêçim û xwe dirêş dikim.

Vedikim, “Yek deh salan Îlim dixwîne, nikare çirayekî jî pêxe. Yek herfeyekî dibihîze, nava dilê wî dişewite...”

Nava dilê min dişewite. Radibim û dixwazim ji dolabê sodayek derxim û vebikim. Ji rehtî û zexeliyê bi xwe re nabînim ku rabim. Çavên min hêdî hêdî tîn girtin.

43.

Qers gazî te nake, Xereqan bangî te dike.
Zanîna Wî ji qelemê dernayê. Tu bandora wî tune ye.
Zanîn di dilê ebd de ku ji îlhama Wî be, ew îlim e.
Min Xereqan dizanibû. Di cîyekî hişê min de razandî bû.
Min vê peyvikê berê zanibû.
Min Bîstam jî dizanibû ku çî ye. Min Kûmîs û Sîmnan jî bihîstibû.
Peyvik gava ku cara pêşî ketibû hişê min, min şewitandibû. Min nizanibû û nedihat hişê min
ku rojekê ez ê li vir şîyar bibim û diltengîya di nav dilê min de dê vê peyvikê têbigîhîje.
Ji min re behsa Xereqan bike, Pîr ji min re vebêje. Ji min re vebêje ka çima ewqas bi şewat e.

44.

Lawo Pîr ummî bû. Xwendin û nivîsa wî tune bû, cahil bû, nezan bû. Nizanibû bigota elhamdu, digot elhemdu. Lê belê Xewsê dema xwe bû. Stara wê bû. Ebdullah Ensariyê ku zanyarê Heratî bû, bi ti kesî re xeber nedida, yekî kovî bû. Ji bo ku ava bêmirinîyê bigere çû Xereqanê. Gihîşt Pîr û ava heyatê dît. Di çavên wî de behrek dît. Ava bêmirinî di reşika çavê zanyarê Xereqanî de bû. Wisa pir vexwar ku xwe winda kir. Ne ew ma ne jî Xereqanî. Heq, ji yên ku wan afirandîye xwestîye ku nîşaneyên ebdîtiyê nîşan bidin. Ji zanyaran jî xwestîye ku nîşaneyek ji wî bidin. Xereqanî, li qûntara çiyayê Bîstamê bû ku ev çiya jî li ser rêya Esterebatê ye. Şûrê eşqê di vî çiyayî de bû, ostayê sobelîyê behrên agir li vî çiyayî dijîya. Ji wî re behra xeman dihate gotin. Dirûvê çiyayan pêdixist, tenê bû, serê wî hertim bi dû û bi berf bû, zinarên wî yên asê hebûn, zaxorên wî yên ku ti kes nikaribû bi wan ve bikişe hebûn... Tav bû, esmanekî bêdawî, zanyarekî rabbanî bû. Ji wî re Qutip dihate gotin. Ew bi xwe, xwe nizanibû. Navenda erdê bû, qutiba ku dikişîne ber bi xwe ve bû. Halê wî bijarte bû, gotinên wî camêr bûn. Li birca rastîyê çavdêr, li ser sûran şervan bû. Herkes ji pêlên îrfana wî qewet digirt, behreke wisa bû.

Ji Seyyîd Nîzamê ku turbedarê dawîyê bû min guhdarî kiribû. Tê hişê min gava ku mir, ez çardeh salî bûm, ji gundê Toklû yê girêdayê Kaxizmanê bû. Yekî jar, sakol bû ku çerm û hestî mabû. Hertim titûnê dikişand, yekî bicezbe bû. Bi şev li ser cîyên xwe yên wê odeya ku vê şibaka biçûk lê dinêre rûdinişt û diket rabitayê. Gava ku êdî îdare nedikir, xwe dirêj dikir û miqnatîsekî mezin datanî ser enîya xwe, ji min re pir ecêb dihat. Gava ku radiket cigara wî jî pêxistî dima. Meriv nikare jê re bibêje raketin jî, hem çavên wî girtibûn hem jî hişyar bû. Hertim îstîxfar dikir. Fise fisa wî bû hin tiştan dixwend... Miqnatîsekî mezin ê gilover datanî ser anîya xwe, gava ku xilmaşî dibû miqnetîs diket erdê, bi ketina miqnatîsê zûzûkan şîyar dibû, cixara xwe di devê xwe de dişidand, radibû çarmêrkî rûdinişt û zikrê xwe dewam dikir. Wî vegotibû. Şevêkî wexta ku eyan bûbû, jê re gotibû, “Binêre lawo”. Bi vê gotinê ziravê wî qetiyabû, û digot, “Jixwe piştî wê êdî xew neket çavên min, çavên min ji wê şevê pê de xewek şêrîn nedît.” Û digot, “Fikreke wisa da min ku hemû tiştên ku Wî afirandîye min di Wî de dît. Ez di Wî de mam, di Wî de bi cih bûm. Şev û roj mijûlayîya wî min girt, ew raman bûn nêrîn. Bû kancî û yarenî. Bû heybet û vakar. Bi wê ramanê re bi yekîtiya wî têgihîştim û hate astekî wisa ku fikir bû hîkmet. Bû şefqet û rêya ripîrast. Ez ketim halekî wisa ku min li hemberî yên ku afirandîye ji xwe bimerhemettir ti kesî nedît. Min digot xwezî ez di şûna mirovan de bimirama, bila kes mirinê tehm nekira. Xwezî hîsabê herkesî ji min bipirsîya, bila di lêpîrsînê de hewce nebûya ku mirov hîsab bidin. Xwezî ku cezayê hemû xelkê bi min bida kişandin, bila ti kes dogehê nedîta. Ji Turkîstanê heya ber derê Şamê di tilîya kî/ê de strî here, mîna ku di tilîya min de çûbe, êş bi canê min diket. Ji Turkîstanê heya Şamê lingê kî/ê li kevîrekî biketa, pêyên min diêşîyan. Xem biketa dilê kî/ê, yê min jî bi pê re xemgîn dibû.” Gava ku Nîzam vana vedigot, gotibû, “Binêre lawê min, kî dibe bila bibe ku virê zîyaret kir bi dilekî xembar vedigere.”

45.

Gava ku ji bo kişandinên li îstasyona trêne ya gundê Keçiyûrdûya girêdayê Sarikamişê em ji otelê derketin, li bajêr heyteholeke nejrêzê û qerebalixeke ecêb hebû. Şofêr ji dikandarê ku jê cigare distîne hîn dibe ku dê bi tevî heytekê ve serokwezîr were bajêr û tevî hin vekirinên rê û resman bibe. Li ser kolanan makîneyên asfaltê qul û çalan tije dikin, virevira wesayîten çopê ne diçin û tîn, li kuçên ku cî bi cîna mîna çopa ne digerin, afîşên pot û kaxiz li hewayê divirvirin, wesayîta îtfaiyeyê nisîvên, “Birêz Serokwezîrê me, hûn bi xêr hatin bajarê me” bi dîrekan ve dadileqînin, wesayîten şaredarîyê û walîtiyê bi hoparloran bangî milletê dikin, bi dengê ku meriv kerr dibe kilaman lêdixin, zarok li dora wesayît û peywirdaran mîna ku her tişt lîstik be, li hevûdin diçin û tîn...Heyteholekê bi yê dengsaz girtiye. Gava ku derhêner dibêje, “Çi bû, te tişteki jibîr kir?” dibêje, “Min kumê boomê yê bayê jibîr kir.”

“Cara paşî te li ku derê bikar anî?”

“Li hewşa dergahê.”

Derhêner dibêje, “Dixwazî em herin lê binêrin, dê li îstasyonê ji me re lazim be.”

Mînbûs ji nav qerebalixa bajêr dertê û ber bi camîya Kumbetê ve diçe.

Li ber dergahê jî xirecîreke mezin heye. Gava ku dengsaz peya dibe û ber bi dergahê ve diçe ez jî peya dibim.

“Kes ji we ava berbesî dixwaze?”

Ji kesî deng dernayê. Ji dikanê cigare û ava berbesî distînim.

Mêrik dibêje, “Baş e ku carinan ji Enqerê merivên mezin tîn.”

Dibişirim.

“Qet nebe rêyên me tîn paqijkirin, çal û kortikên rê tîn girtin.”

Gava ku perê zêde dide dibêje, “Şikra serokwezîrê dê were dergahê jî.”

Ji bo ku nebêje tişteki negot dibêjim, “Waa, nexwe wisa?”

Dibêje, “Belê, jinika kevanî ya îmaretê got.”

Dibêjim, “Xwedê bereketê bide we” û vedigerim mînbûsê. Kumê boomê yê bayê hatiye dîtin.

Em di rêya Sarikamişê de ne. Dengê ku ji deyibê tê hebo hebo dîwanên Aşîk Şenlîk dibêje.

“Were em bi hevûdin re bijimêrin, niha bibîrbînin gencîneyên erşê.”

Şofêr jî pê re dibêje. Dawîyê em digihîjin daristanê, em rastên vala û qotan derbas dibin û digihîjin hêşnahîyê. Şofêr dibêje, “Ûris tam sî sal daristanên Qersê jêkirine û birine...”

Ezman hiphêşîn e. Çend perçe ewr û hewayeke ku mîna camê diçirise xuya dibe.

Dilê min diçe cixarê. Pêdixim. Pêşî Mihasebevan di ber xwe de dipeyive.

Şibakê hema vedikim, bayekî hêdî bêhna axê û çaman tîne hundir.

Em dikevin Sarikamişê. Bajêr ji yekîneyên leşkerî û dikanên ku lazmatîyên wan difiroşin pêk tê. Çend heb malên kevn dikevin ber çavên me, dilên me bi wan re dimîne. Mînubus dikeve rêya gund. Bajêr û daristan diqede, em bi çîya re hildikişin. Wesayîta me bi zorê dertê.

Teknîsyen bi sûtê şofêr dikeve û dibêje, “Kekê, êra tu ji van gotinan fêhm dikî gelo?”

“Çawa fêhm nakim.”

Mihasebevan dibêje, “Êdî serê me êşîya, ji kerema xwe re bigire.”

Dibe pilepila wî û teyibê digre.

Li hemberî me, li ser gazekî rast ê ku ji me bilindtir e, trêneke bar diçe.

Gelo çi dikşîne. Makînîst li me dinêre.

Li karwanan dinêrim.

Her tişt di rê de ye.

Herkes rêyekî daye ber xwe û diçe.

Em hertim ji cîyekî ber bi cîyekî ve diçin. Em bi trêne re diçin.

Gotina, “Hewayeke firok ku jîyanê dorpêç dike.” tê hişê min.

Yê min kêlîyeke wisa ye. Çiqas zû diguhere.

Çûndin û guherîn mîna kilameke bi şewat di gewrîya min de asê dibe, dilê min dişewitîne, sînga min tifetisîne.

Qet ji hişê min naçe, te di nameyêke xwe de nivîsandibû.

“Ewqas dem derbas bûye hêjî mîna sotikê agir dikevî nav dilê min. Du roj berf barîya. Bê sekin barîya. Hindik hindik, hebo hebo. Li hewayê divirvirîn. Min temaşe kir. Bi rê de çûm. Tu ewqas pir ji min hez dikî? Ewqasê ku hezkirina xwe nikaribî dîyarî min bikî. Ewqasê ku dilê min bipertîfînî ji min pir hez dikî? Herim ku derê, berê xwe bifetilînim ku derê li wirê tu heyî. Min ji deman demek xwest, cîyek xwest, cîyekî ku tu ne li wir bî. Ev agir her tim bi min re hat. Ne di mirina birayê min de ne jî ti car min xwe ewqas westîyayî hest nekiribû. Xwezî tu li vir bûyayî, li cem min bûyayî, di nav hemêza te de biketima xewneke şêrîn. Qet şîyar nebûma. Wisa bêrîya te dikim ku carinan tune dibim. Min ti car ewqas zêde nexwestibû ku bikevim xewneke bêdawî. Her tişt wateya xwe winda kirîye. Vîya êdî zêde tê ji min re, nikarim bikşînim. Pir girane, min dipelçiqîne, pir zêde dişewite. Jehrî diherike nava min. Dixwazim wî jêbikim û biavêjim, êdî nikarim bikşînim. Dizane ku ez nikarim ewqas bikşînim. Xwesteka me tune, her tişt bi daxwaza wî dibe, her tişt lê her tişt her tişt... Tu li ku derê yî? Bêhn li min çikîya, li ku derê yî?”

Nabe gula min, wiha nebû.

Lale rast digot, em ne fatimok in, ji ber vî qasî em nikarin nêzî hev bibin.

Digot li daristanê çivêkêk bi lez li dora xwe diçû û dihat. Belê va ye deng wiha tê min, bi lezbûneke ecêb difetile û ji me re dibêje pêwîste hûn birevin. Lewra her tişt gelek zêde ye.

Lale ne neheq bû, ew jî vîya dîtibû. Navê vîya xetere ye. Lewra tu kes, heya ku hevalê meriv jî eşqê naxwazin.

Tu rast dibêjî ey helbestvan, ez ne Uveysî me, ji xeletîyek ber bi yê din ve baz didim, girêdayê rêyekî nîn im, rêberekî min tune, binêre mîna vî trêne ber bi agir ve baz didim, rêya min aşkera ye, nikarim ji wir biqetim, li ser rayan bê hemdê xwe bazdidim ku li cîyan û li çîya bikevim. Di serdabên bîrewerî û êşan de derbas dibim, bi carekî ve her tişt tarî dibe, çend saniye kor dibim, peyre her tiştên ku baş nayên dîtin. Dûvre ev ronkahîyên zinanokî, hinek dibînim lê belê ronkahî têr nake, bera ev trêne çi dikşînin?

Em digihîjin îstasyonê.

Mînîbusê park dîkin û qasekî dimeşin. Li her derê berf heye. Peywirdarekî kal ê ku emekdarîya wî hatîye me pêşwazî dike. Di sobê de çilo dişewite. Çay dem hatîye girtin, çaydanê çînko. Rûnê malê û hingivê mozên xwe ji nanê xwe re kirîye qatix. Pêşkêşî me jî dike. Awê ku dibêje rojê du trêni di vir de derbas dibin. Yêni ku tên pêşwazî dike, yêni diçin jî verê dike. Bîst û sê salê wî li vir derbas bûye. Bêhna herî îstastyona ji vir jî tê. Avahîya wê ji kevîrê jêkirî hatîye çêkirin. Çenteyên pere bala min dikşînin. Ji postê hêştirê hatine çêkirin. Her tişt wisa ecêb û kevn in... Mîna ku dem sekinî be. Mîna ku ev rêwîtiyeke bêdawî be. Pîrsa, “Gelo di nav mayîna li îstasyonê û çûyînan de, yan jî hatinê de çi firq heye?”

Dibêje, “Çûndin mirov belawela dike, bicîbûn jî tiştêkî xetere ye.”

Mirov gava ku tê jî dixwaze hêvî bike.

Lê belê ew jî bereday e.

Dibêjim, “Lê belê bê cî û war bûn rasttir e ne wisa?”

46.

Rojekê zanyarekî gava ku hat dergaha Xereqan rûnişt û qet nepeyivî.
Misêwa guhdarî dikir. Gava ku tişteki dihat pirsîn, bi bersivên kurt dibersivand.
Ji wî pirsî, “Çima tu wisa bêdeng î û xeber nadî?”
Zanyar got, “Ji behrekî gotinbêjek bes e.”

47.

Derhêner ji qeydên îstasyonê tiştên ku hêvî dike nabîne û hêrs dibe, em çend kare qeyd dikin û vedigerin. Li herkesî sar e û westîyane. Ji devê ti kesî gotinek dernayê. Di radyoyê de kilama Sezen Aksû ya bi navê Kavaklar-Hewran lê dixê. Li paşîyê, li kêleka camê me. Li alîyê min ê çepê kamera û çenteyê malzemeyan. Cigarekî pêdixim. “Li wir ma nivê gelpika min, dê xwe li valahîyê tamam bike...” Ez nikarim xwe li valahîyê tamam bikim. Rast e ku êş ketîye dû min û rast e ku cîyê jêkirî yê girmila min misêwa xwîn dibe. Daxistanî digot, “Sî sal e ji tîrsa Xereqanî xew neketîye çavên min. Min pêyê xwe biavêta ku derêç min didît ku ew pêşîya min çûye wir. Êdî wisa bûye ku ev du sal e dixwazim herim Bîstamê, zîyareta turbeya Bayezîd; lê belê nikarim. Lewra ew ji Xereqanê sê fersah dûr e, dê pêşîya min bigihîje wir.” Vîya jî tiştêkî naskirî ye... Kengê li cîyekî ku min berê nedîtîye binêrim, li wir ji êşên nav min sîyek dibînim. Ê ku gotîye rast gotîye, em herin ku derê xwe jî bi xwe re dibin. Ger ku xelasîya mirov ji azwerîyan mumkun be, meriv dikare bibêje ku ev jî bi xwe azwerîyek e. Xwestina xelasîyê, ji bîrakirinê, xwestina nexwestinê... Şêx meseleyek Xereqanî û Şîblî ji min re vegotibû. Rojekê leqayî hev tîn, ji Şîblî pîrsa, “Tu di çi halê de yî?” dike. Dibêje, “Ez nexwestinê dixwazim.” Li ser vê gotinê dibêje, “Ew jî xwestin e, dev ji wî jî berde.”

48.

Gava ku em dikevin bajêr derhêner dibêje, “Em serîyek li dergahê bixin û derbas bibin. Em ê sibê li dora wî bi gel re roportajan bikşînin...”

Gava ku em digihîjin dergahê, di dilê min de derbas dibe ku dê Şêx tirîyê reş û sipî bide me. Em silav didin û rûdinên. Xortekî çay tîne. Dibêje, “Min aniha dema wê girtibû.” Tehma qerenfîlê jê tê. Şêx dibêje, “Kî ku bi hinceta ceribandîne here cem Pîrekî, zîyareta wî meqbûl nayê hesibandî, timatî qet neketîye warê zanyaran.”

Destê xwe dixwe hundirê cubbeya xwe, nanekî tendûrê yê germ û du gûşî tirîyê reş û sipîyê hişk derdixe. Herkes dixwe. Ji berê dimîne, ji yê derve re dişîne.

Dibêje, “Mirov bi fikreke xelet, ji Xwedê mîna rêya du salan paşve dimîne. Çawa ku mar fistanê xwe diavêje, divê wisa jî mirov ji nefsa xwe paqij bibe.”

Derhêner ji bo karê sibê alîkarî dixwaze. Ji mudawîmekî dergahê re dibêje, “Ji dostên me re bibin alîkar.” Em destûr dixwazin û radibin. Gava ku em dertên, di derçika derî de destê xwe datîne ser milê min. Dibêje, “Piştî eşayê hûn dikarin werin, li benda we me.”

Em vedigerin otelê.

Çaxê sibê yê xebatê hîn dibim û dertê odeya xwe.

Gava ku dikevim hundir, dikevim wê valahîya nenîşan.

Diçim ku derê vê tenyatîyê jî bi xwe re dibim. Ev neçarî min dihelîne. Min bêqewet, bêdilxwazî û bêbêhn dihêle. Ez di halekî wisa de me ku nizanim ez ê çi bikim. Ji alîyê sibê de mîna serê derzîyê jî hêvîya min nemaye. Îro û duh bi xweşî nayê bîra min, li ser esmanê devê min îlaç û nîkotîn, di hişê min de jehrîya bêhêvîyê, bêrîya qîza xwe dikim, bêrîya te dikim, tenê bêrîya te dikim; lê belê wan demên ku me hev diêşand, min dorpêçkirine û difetisînin.

Me sala dawîyêç bi ketina xwîna hevûdin derbas kir. Ew çi şerekî hovane bû wisa. Hovîtiyeke wisa bû ku meriv ji ber wê tehemmul nedikir. Ew roja em çûn noterê ku wekaletên xwe bidin parêzger, derengê şevê gava fetilîm malê nîşeya ku min dît peyiv peyiv tê hişê min.

Rojnivîska xwe de min wiha nivîsandibû, “Min navê te ebedîtî zanibû. Xweşikî sûretê te bû.

Rêyên min ji bo ku bigihîjim te hebûn. Te stareya xwe ji destê min girt. Çavên min kor.

Nikarim ber xwe bidim.” Em wisa kor bûbûn, xwezîya ku em ê merhemeta di nav dilê xwe de biparêzin me winda kiribû.”

49.

Gava ku dilê we xemgîn bû, vîya wekî xenîmet bizanibin.
Mirov bi bereketa diltengîyê digihîje cîyekê.
Tu hergav dibêjî bila qûtê te xemgînî be.
Kengê ku ez ji te şîretek bixwazim tu wiha dibêjî.

50.

Ji otelê dertêm. Li sûkê qerebalixek, xirecirek, komek mirov slogan diavêjin, dengên metal ên ecêb... Hinek zarok dibînim ku bi gotina, “Dijmin Serokwezîr” diqîrin. Vir, sûka herî fireh a taxa Alparslan e. Li her aliyê kuçê agir pêxistine. Dengê muzîkê ecêb tê. Jin, pîr/kal, zilam di destê wan de bîdon, teneke, qove; herkes ji xwe re lêdixe. Gazî yekî ji wan dikim û dipirsim, dibêje, “Çalakîya lêxistina tenekeyan e. Desthilatî di xewa mirinê de ye. Em birçîne, birçî!” Heta ji destê min tê xwe naxim nav qerebalixê, dûre dikevim kuçekî û rêyeke ku derê dergahê digirim.

51.

Te ji destekî xwe re gotibû ku sibê di roja rabûnê de hanhaneka dernê meydanê.
Tu lutif î, tebata te nayê, pêşî ez ê herim û qîyametê aş bikim, piştî te werî.
Têm, ez têm.
Tu kengê gazî bikî ezê werim.

52.

Derîyê dergahê bi qirçînîyeke hêdî vedibe. Li hundir tenê me. Şêx xuya dibe, gava ku derî vedibe di pêyên wî yên ku dimeşin de mîna xeyalek tê dîtin. Xwe rast dikim. Silav dide û tê cem min, destê min dixê nav destê xwe, çavên wî di hundirê nîvtarî de diçirisin, li ronkahîya ku di reşahîya çavên wî de ye dinêrim. Ji bo ku çavên xwe jê neqetînim ber xwe didim.

Bi dengê hêdî dibêje, “Em, ne xwedîyê malê ne û ne jî mêvan, em rêwî ne, ber bi yekîtiya Wî ve dimeşin.”

Li cîyê xwe yê her gav rûdinê.

Ji min re dibêje, “Tu qehwe vedixwî?”

Dibêjim, “Zehmetê nebînin ezbenî.”

Li kêlekê, termosê ku li cem rehleyê ye nîşan dide û dibêje, “Binêre, Sefer ji bo te qehwe çêkir...”

Dadigirim qedehê, devê xwe tije dikim ku bibêjim hûn jî vedixwin, ji min re dibêje, “Ji wir dikarî xurmeyek bidî min?”

Binika çayê ku tijî xurmene datînim ber wî. Ji şemşaqê ku li devê şibakê ye, ji xwe re hinekî av dixê. Qurtekî qehwê dixim devê xwe, bê şekir e, tehl e...di devê xwe de nagerînim di gewrîya xwe de berdidim xwarê. Ji bo ku ji bêdengîyê birevim dibêjim, “Gelo serokwezîr hat?”

Dibişire. “Vira dilê Qersê ye, rêya herkesî dikeve vir, derîyê me ji herkesî re vekirî ye...”

Peyre xeber nade. Li pirsê xwe poşman dibim. Dûre dibêje, “Mehmûdê Qazneyî carekê ji bo ku zanyarê Xereqanî bibîne, jê dua û şîretan bigire tê gund. Di wexta sefera ku Rey û Isfahan tê bi destxistin ev pêk tê. Ew çax li Kûmîsê çend roj dimînin. Di demeke kin de, dê ber bi Sumenatê ve derê seferê mezînin. Gava ku dikevin gund serdarekî xwe dişîne û dibêje, “Here ji Şêx re bibêje ku Sultan hatîye dîtina we. Bila ji tekyayê derê û li wir me pêşwazî bike. Ger ku îtaet neke ayeta ku dibêje, “Ji Xwedê re îtaet bikin, ji Pêxember re îtaet bikin û ji emîrên ku ji we ne re îtaet bikin” têxe hişê wî.” Elçî tê û dikeve hundirê dergahê, ji Xereqanî re dibêje hal û mesele ev e, “Sultan dixwaze ku wî li derve pêşwazî bikin.” Wê gavê jî bi derwêşên xwe re ketîye xebirdanê. Qet li rûçikê mêrik nanihêre, di şûna xwe de wî guhdarî dike û dibêje, “Here û ji Sultanê xwe re bibêje, Şêx li ber îtaeta Xwedê wisa mijûl e ku halê wî tune bi te re mijûl bibe.”

Elçî vedigere û tiştên ku dîtîye û bihîstîye vedibêje, Mehmûd matmayî dimîne. Hespê xwe diajo û tê ber derê dergahê. Dîsa xeber dişîne hundir. Şêx dîsa li ser gotina xwe nayê xwarê û dibêje, “Derê dergaha me ji herkesî re vekirîye, bila kerem bike.” Mehmûd mecbûr dimîne, ji hespa xwe peya dibe, ji derîyê berfireh de xwe xwar dike û derbas dibe, dikeve hundir. Li Şêxê ku li ser çoka xwe bêtebat rûniştîye dinêre, silav didê, bersiva silava xwe distîne, xwar dibe ku destê wî maçî bike; lê belê Şêx nahêle, dibêje “Kerem bikin.” Rûdinên. Li hewşa dergahê, li ber derî, li qunçikê derî û li hundir merivên sultan û dervêş rûniştîne. Şêx, xortekî reş ê ku li teniştê derî li erdê rûniştîye, xwe quncifandîye hev û li erdê mêze dike nîşan dide û dibêje, “Di nav leşkeran de çend heb ên mîna vîya hene?” Mehmûd dibêje, “Bi deh hezaran.” “Di nav wan de Xwedê tenê li dilê vîya nihêrtîye.” Sultan ji nişka ve ji şûna xwe radibe, diçe

wî xortî hemêz dike û dibêje, “Ji niha pê ve em birayê hevûdin in.” Ji merivekî xwe re îşaret dike, ji derve kîsikekî ku tê de zêr hene tînin, dirêjî wî xortî dike; lê belê nagire. Li şûna xwe rûdinê, xemgîn e, kîsik datîne erdê. Zêrên ku di navê de ne li ser zilûkê belav dibin.

Qasekî bêdengî çêdibe, peyre Mehmût dibêje, “Ji we şîretan dixwazim.”

Xereqanî dibêje, “Ku mêr xwe bişibînin jinan, ev bi ebdîtîyê nakeve, ji xezeba Xwedê dîsa xwe dispêrim Wî.” Mehmût li ser gotina xwe ye û dibêje, “Ez dixwazim hûn li min wesîyetekî bikin.”

Şêx jî jê re dibêje, “Bila ev çar tişt qet ji hişê te dernekevin: ji Wî bitirse, nimêj bike, destvekirî be, ji mirovan re bi şefqet û merhemet be.”

Û gotina xwe didomîne, “Xwedawo, zilam û canikên bawermend bibexşîne.”

Mehmût dîsa dibêje, “Duayeke taybet dixwazim.”

Şêx fîzar dike, “Hêvîya min ji Xwedê ew e ku rojên te yên ku bên mehmûd bin.”

Sultan vê carê kîsikê zêr datîne ber serê posteka Şêx.

Şêx, ji derwêşan parçeyek nan û hinek avê dixwaze.

Sultan radike nan û dicû. Di gewrîya wî de dimîne. Dike nake naçe xwarê. Qurdek avê di ser de vedixwe, bi zorê diçe xwarê.

“Li ser çavên xwe dibînî ku di qirika te de gepek nanê ce naçe, tu çawa difikirî ku em ê dikaribin van zêran bixwin.”

Li ser vê gotinê Mehmût şermî dibe, serê xwe xwar dike.

Şêx dibêje, “Îro di qirika te de çawa nanê ce dimîne, bi bergîdana wî dê zêrên te jî di qirika min de bimînin, wan hilîne; lewra min, bi sond û telaq dev ji dinyayê û tiştên ku di dinyayê de ne berda, ez nikarim vegerim.”

Mehmût cara dawî dibêje, “Ya ji me tişteki qebûl bikin, an jî tişteki bidin me.”

Xirqeya xwe ya ku bi dehan pîne pê ve ne derdixe û dibêje, “Rake vîya, di roja teng de çi bixwazî ji bo xatirê yê ku vîya li xwe kirîye dê bê dayîn.”

Ji bo ku derê sefera Sumenatê ji dergahê dertê. Di rê de ji wezîrê xwe re dibêje, “Ger ku ez mûzaffer bibim, ez ê xenîmetên ku dê bên belav bikim.”

Di şer de artêşa Sultan dikeve nav zehmetîyeke mezin, hêzên dijmin heta nav dilê artêşê jî hewl didin û tên. Ji hespê peya dibe, xwe xwar dike, xwelîyê maçî dike û ji Xwedayê xwe re hewar û fîzar dike, “Xwedawo, ji bo xatirê xirqeya wî zatê ku te wî mezin kirîye mûzafferîyê bike nisbê min.” Di artêşa neyar de tişteki ecêb dibe, artêşa ku ji milletên cur bi cur pêk hatine bi hev dikevin û di demeke kurt de artêş tê belawela kirin. Mehmût kelan, bajêran, bajarokan distîne; xenîmetan dicivîne û ala xwe li ser bircan diçikîne. Gava ku ji seferê vedigerin, li cîyê ku bêhna xwe dide, di xewna wî de jê re wiha tê gotin, “Ey Mehmût, te çima xirqeya me kir xatir û navgîn û te tenê Sumenatê xwest, te çima hemû warê Hînd û Roman nexwest?”

Sultan gava ku ji seferê vedigere diçe Xereqanê. Vê carê hespa xwe dûr dihêle û diçe Şêx di şûna wî de zîyaret dike. Minet û spasîyên xwe pêşkêşî wî dike. Destên wî maçî dike, duayên wî distîne. Gava ku dê here, Şêx dertê derve û wî verê dike. Berîya ku li hespê siwar bibe li Şêx vedigere û dipirse, “Ezbenî, gava ku cara pêşî ez hatim, min du car jî şand pey we; lê belê hûn ji şûna xwe neleqîyan. Niha jî hûn min verê dikin, sîrrê vîya çi ye gelo?” Xereqanî dibêje, “Cara pêşî bi xurûra xwe ya Sultanîyê tu hatibûy, niha tu mîna derwêşekî vedigerî. Rêya te vekirî be.”

Hingî dipeyive dintengîya ku min dişewitîne belav dibe lê belê naqede. Destekî bi qirika min girtîye û dişidîne, bê bêhn dihêle. Dibêje, “Divê meriv ji bo armancekî jê re ebdîtîyê neke, bihuşt jî ya wî ye, dojah jî... Kîjanî bixwaze dê merivê biavêje wî.” Xwe bi xwe di dilê xwe de dibêjim -çiqas zêde tişt di dilê min de derbas dibin-, “Ez ê vîya bi çi awayî bikim? Ez ê ji vê bîrê çawa derêm? Di tarîyê de û bê derence ez ê çi bikim?”

Gotina xwe didomîne, “Divê meriv li hemberî birçîbûnê berxwe bide. Niha di rojê de ku danekî bixwî, bike sê rojan carek; ku di sê rojan de danekî dixwî, bike çar rojan carek...bi vî awayî vê demê dikarî heta çil rojan, heta ku salekî jî dikarî derxî...Wê gavê tişteki mîna mar

ku dişibe hêkeke çivîkê û sipî, sorikî û di devê wî de tiştêkî dê xwe nîşan bide, devê xwe têxe devê te, piştî wî êdî nexwî jî dibe. Piştî vê rewşê hinek heftê salan carekê şîyar dibin, hinek bîst, hinek deh, hinek jî çar mehan carekê...Hinek ji wan jî tenê di wextê ebdîtîyê de şîyar dimînin. Ji ber vîya ye ku haya dilê te ji tiştêkî nîn e. Êdî têyî asteka wisa ku tu nizanî ka gelo tu ji vê dinyayê bêagahdar î an ji dinyaya din. Hem bi zimanê vê dinyayê û hem bi zimanê dinyaya din biaxivî dê çêtirbe; lê belê dilê te hertim ji vê dinyayê bêagahdar dimîne...”

Ji min re mîna xewnan tê. Ez ji van tiştan fêm nakim.

Dibêje, “Jîyan bi xwe xewn e.” û dirêjî tasa avê dibe, çend qurt av vedixwe.

Afirîner bi mirovan re bi çar awayî bipeyive: Bi dil, bi ziman, bi laş û bi mal...Wiha dibêje, tê herduyan bidî min, herduyan jî ji min bistînî. Tê bi laş ebdîtîyê bikî, bi ziman jî kitêba xwe bixwînî. Tê dilê xwe malê xwe nedîyêyî; lê belê li dinyayê karê te ji herduyan wêdatir e, ger ku bixwazî herduyan jî Ew ê bide te. Divê meriv ne bi bihuştê hêvî bike, ne bi dojhê bitirse, li herdu dinyayan jî Ew ji mirovan re bes e.”

“Ji vê xema nav dilê xwe bi ti awayî xelas nabim. Ez ninazim kengê û çawa min dorpêç kir; lê belê êdî ti car û ti kêl, heya ku di xew de jî, di xewnên min de jî dev ji min bernade...”

Dibişire, gava ku dikene serûçavên wî zêdetir ronî dibe, bi dengê ne ji xwe dibêje, “Derdê me xemeke wisa ye ku bi ti awayî di herdu dinyayan de jî bi cih nabe, ez hêvî dikim ku xema bi te re ye, ew xem e ku dixwazî Wî bi awakî ku bi Wî bikeve bibîrbîn; lê belê dikî nakî nikarî...”

Bêdeng dimînim. Ji dilê min destekî dertê û dilê min zift dike, çiqas xeber dide wisa hest dikim ku mîna dilê min di destê wî de be. Hêdî hêdî sivik dibim. Tişt, eşya, wêneyên ku di mêjîyê min de ne, dengên ku di guhên min de ne, wîzînin datînin, paqij dibin. Dixwazim xwe biveşêrim, ser xwe bigirim, xwe paqij bikim. Dixwazim ji xwe xelas bibim, herim cîyekî din, bibim yekî din.

“Gava ku te xwest dilê xwe paqij bikî dê rêya xwe nîşanê te bide. Netirse. Ger ku tu nabînî jî netirse û lingên xwe biavêje. Bi gav avêtina pêşî ya nav tarîtiyê dê ronkahîya pêşî ya rê vebibe. Dil warê Wî ye, wî paqij bike, bîne halekî wisa ku bila bi Wî bikeve. Yên ku bi dilê xwe yê safî gîzên dinyayê kişî dikin û yên ku çavê dilê wan vekirî ne wiha dibêjin: “Ger ku mûma şewqa ebdîtîyê carekê di nav te de pêketibe, divê êdî wî ji yên ku ne mahremên biveşêrî. Ronkahî veşar dimîne; lê belê tu hewl didî ku xwe biveşêrî. Ji dîtina tiştê nav xwe netirse. Wî bibîne. Xereqanî rojekê wiha dibêje: “Xwedawo, min li cîyekî ku ebdê te hebin biveşêre.” Dengê tê dilê wî, “Ti tişt nikare rastîyan biveşêre.” Bihêle bila mirov te nas nekin, ji te hez nekin, te nizanibin, bila te şermezar bikin; tenê meraq bike ka gelo ew çi difikire, wî û ev tune Ew heye.”

Di nav dilê min de tiştêkî min aciz dike. Tiştêkî di gewrîya min de dimîne. Çavên min tije dibin. Xwe bizzorê digirim.

Bi gotina, “Ev” ku gotina xwe didomîne, hema bi serê çavan li çavên wî yên bi kil ku di bin sîya şaşîkê de ne dinêrim, baraneke merhemetê dibare, “Ev, rojêke wisane ku gava di nav rojê de xêrekî dikî, eynî şev xêra wî jî dibînî. Divê meriv destê xwe ji şehwetê dûr bigire. Ew wisa kerîm e, li yên ku ji laşên xwe şehwetê dûr digirin êşê nade kişandin. Ger ku nezan zanibûna ji destê wan çî diçe, di wê demê de dê bimirana. Ji çavên ku dixwaze mexfretê bibîne re ev tişt hewce ye. Ger ku wêneyê îrfanê bihata çêkirin, dê hemû ronkahîya ser rûyê erdê li ber wî tarî bimana.” Kesereke ecêb di dengê wî de xwe nîşan dide, xwe nagirim, hêstirên çavên min dibarin. Bi dengê xemgîn, zêdetir destê xwe dirêjî tarîtiya nav min dike,

Dibêje, “Lê belê nizamî ku nûra merîfetê ji dinyayê rakirin.

Ku wisa nîn be dê çima mirov di tarîyê de kulmên xwe vir de wir de dawêşînin!

Zemanê berê mirov mîna derman bûn. Tenê feydeya wan digihîşt kesên din.

Lê belê niha, mîna derdê wisa nin ku ji wan deva nagihîje tu kesî.”

Disekine. Gava ku dipeyive zehmetîyê dikşîne; lê belê di bêdengîyê de xwe nikarim bigirim.

Çavên wî li valahîyê dinêrin.

Qasekî li çavên wî dinêrim, dilê xwe qalin dikim û diçim qehweyek din jî tije dikim.

Ferqa nû fêhm dikim, ode hinek din jî ronî bûye.

Wisa difikirim ku êdî çavên me hîn bûne.

Ev çiqas dem e li cîyekî ku li min nayê dijîm.

Mîna ku dengê xwe ji bîrekî kûr derxe, “Gava ku em tên dinyayê bi rojî tîn, gava ku em diçin jî dîsa bi rojî diçin. Ger ku tu bibêjî li dinyayê tiştê ku herî meriv dixwaze bike çi ye, ez ê bibêjim, bîranîna Wî ye. Heta ku nefsa te nemire tu nikarî kincê jiyanê li xwe bikî. Ji gerokekî re gotine, “Kîjan rêwîtiya te zêdetir bi zehmet derbas bû.” Wî jî gotiye, “Sefera min a ji nefse.”

Disekine. Di dilê xwe de dibêjim dewam bike. Lerzekî bi min digre. Şewat bi nav canê min dikeve; lê belê sivik dibim. Dişewitim, cîyekî min naêşê. Bi awayekî nîvserxweşî, xwe, bi awayekî ku cîyê lê me hest nakim û tenê wî guhdarî dikim. Wisa têdigihîjim ku bi xwe dengêkî ye. Tenê mîna dengêkî dibînim.

“Xereqanî şevêkî dengêk dibihîze: “Ey ebdê min çi ji min dixwazî bixwaze? Wî jî wiha bersiv daye: “Ji te pêştir meriv ka çi dixwaze!”

Hewl didim ku bibêjim, “Êş û xem” dengê min bizorê dertê, qirika xwe paqij dikim û dibêjim, “Xem dev ji mirovan bernadin, ji bîrewerîyan xelas nabe, derdê debarê dev ji wan bernade, çi tiştê ku dil xemarî dikin hene di nava jîyana me de ne, li qeraxa wî sobelîya dikin, meriv bi çi awayî digihîje zanîna ku dil paqij dike, meriv çawa dikare ji vê cendereyê derê?”

Bi awayekî aşkera dibişire, peyre xemek dikeve rûçikê wî û dibêje, “Meriv tenê dixwaze. Sebr dike, dişewite, dilê wî li yên din diêşê, dilê wî diperite, digirî, bê bêhn dimîne; lê belê ger ku dev ji seknê bernede dê rojekê bê bexşandin. Baş guhdarî bike, Îbrahîm agirê ku ketê zêde nermûsak dît û gunehê wî bi agir hat. Ji ber vîya ye ku Pêxember piştî ku dengê, “Ger ku tu nîn bûyayî, min ê felekan neafiranda” dibihîze wiha dibêje: “Ewqasê ku li ser rêya min strîyên êş û eleman hatine avêtin, li yê tu kesî nehatine avêtin. Avêtina Îbrahîm a nav agir ji bo wî ne bela bû. Parçeweslekirina Zekerîya ji bo wî êşek nayê hesibandin. Bela û tengasî ev in ku li ser serê min hatine dorpêçkirin. Me ji bo yên esman û ser rûyê erdê kirin klavûz û gunehên herî biçûk ê benî adem jî bi devdelingê fîstanê me yê şefaetê ve girêdan. Ji me xwestin ku yên rêya xwe wînd kirine, em bi wan bidin dîtin û bexşandina gunehan bixwazin. Lazim e ku em karên zexelan bibînin. Carinan me danîn sînôrê heyînê, carinan me şandin ber derê Ebûcehîlê ku tijî bi cefa bû. Carinan navên mîna yê dibîne, yê ku tê dîtin, yê ku mizgînê dide, yê ku mizgînîya wî tê kirin li me hat dayîn, carinan me mîna sêrbaz û dîn nîşan didin. Carinan Cebraîl mîna rêheval ji meriv re dişînin, carinan bê destûr nahêlin ku meriv bikeve Mekkeyê. Carinan kilîdên gencîneyê alema din tînin ber derê meriv, carinan ji bo kulmekî ceh meriv dişînin ber derê Ebû Şahme. Carinan bi şûrê rêhevlekî me derên Hayberê tîn vekirin, carinan bi kevirê yekî ku bawer nake diranê me dişkênin. Bila mirov bizanibin ku rêya me rêya bela û ezîyetê ye. Ger ku sirrê vê rêyê bizanibî, pêyên xwe ji serî de jêbike û biavêje. Ger ku nekî zehmeta ku tê bikşîni bide alîyekî. Lewra di vê rêyê de bi van pêyan meriv nikare biçe...”

Ji tiştên ku di hişê min de derbas dibin şerm dikim, jixwe, laşê xwe, êşên ku di nav min de digerin, sancoyan, bîrewerîyan bê mane dibînim, bayekî nehewceyîti tê û diçe, bi min dibe û derbas dibe. Mîna ku pişt çavên min dibîne xeber dide.

“Rojekê yek diçe ba derwêşekî û jê re dibêje, ez dixwazim çend roj li cem te bimînim û bi te re xeber bidim.” Derwêş dibêje, “Ger ku qebûl nekim tê çi bikî?” Camêr li ser vê gotina wî wiha bersiv dide: “Ez ê bi Xwedê re bim.” Derwêş jî dibêje, “Wisa be ji xwe re wisa bihesibîne ku mîna ez tune bim û aniha here bi Wî re bimîne...” Piştî qasekî bêdengîyê, destûr dixwazim û radibim.

Li ber derî bi destên min digire, bi nêrineke ku çeperên dilê min dike dinêre û dibêje,

“Jibîrkirina Wî mezintir musîbetek tune, jibîrneke ku tu çawa bijîyî, tê wisa bimirî...Şev baş.”

Rêya xwe nizamim, ji hemû kuçe û sûkan bi awayekî bêhiş derbas dibim, dibe ku saetek şûn de be, ji pira kevir derbas dibim, dikevim kuça ku otel ji wir bilind dibe.

Dertê m odeyê, dûşekî digirim, peyre ji bo ku şalika min anîya min hemêz bike xwe xwar dikim, êdî naxwazim ku rabim.

53.

Ezbenî, çavekî bide min.

Bi wî ez wan bibînim.

Gava ku ez li wan binêrim, xwe û te bibînim.

Vîya têr nake.

Ezbenî, hezar çavan bide min.

Ezbenî, bi çavê pêşî yê ku te da, her tiştî bişewitîne.

Bila neh sed û not û nehê wî tenê ez bizanibim ezbenî.

Tenê ez bizanibim.

54.

Mihasebevan dibêje, “Em taştê li derve bixwin.” Ku hevalên din jî piştgirî didin wî, em jî dertên derve. Pîdeyê germ ê bi kuncî ku hê nû ji agir derketîye û qaşarê kevn distînin û em dîsa diçin qeweya ku navê wir Kerbela ye.

Apê Elesker çawa ku me dibîne tê coşê.

Dest bi kilameke ku dibêje, “Ji Xwedê dewlet dixwazim/Ku li Erîvanê rezê min hebe/Di navê de hewiza bi mermer/ Ku li dora wî qonaxa min hebe” dike. Dibêje, “Kilama hevnavê min e. Muxemesa Aşiq Elesker...”

Mihasebevan bi gotina, “Muxemes? Ew çi ye?” dipirse.

“Birazî, ger ku deh rêzên bendê hebin ji helbestê re muxemes tê gotin.”

Li dîwar du zulfîkar çeprast hatine çêkirin, di navê de wêneyê Hz. Alî hatîye bicihkirin.

Li balê pûrtîkekî mezin ê teyrê tawûs.

Çavên Hz. Alî tûj tûj dinêrin. Li serê wî şaşîkek, porên wî heta girmila wî dadikeve.

Li dîwarê din wêneyek şahêmaran ê ku di bin camê de ye. Şîn, kesk, rengên zer ê rewnaq bi awayekî ronî tên dîtin. Zilamekî kal ê jar di şîbakê de li derve dinêre, dûyê cixara xwe berdide, radibe, gava ku li ber me de derbas dibe dibêje, “Noşîcan be”

Şofêr dibêje, “Kerem bikin.”

Dibêje, “Xwedê kêmahîyê nede, min taştêya xwe xwar.”

Gava ku dertê dibêje, “We çima firingî nesitend?”

Teknîsyen dibêje, “Erê welle, te lê dî!”

Mihasebevan dibêje, “De hadê wisa be here bistîne.”

“Welle qusîrê nenêrin, dev ji van teaman bernadim û naçim.”

Apê Elesker di qedehên avê de çay tîne, hebên çayê ku nû vebûye li ser çayê ne.

Ji nan parçeyek jêdike, qaşar dixê navê, dike gebek mezin û diavêje devê xwe.

“Ji we re noşîcan be.”

Dengê çingîniya kevçîyan li hundir olan dide, çawa ku em bi xwe dihisin bi hev dikenin.

Telefona derhêner lêdikeve. Dertê derve û dibêje, “Birêz rêvebir, dengê we diçe û tê, bisekinin ez derbasî cîyekî din bibim.”

Gava ku tê dibêje, “Hevalno, kişandina belgefilmê ma piştî nîvro, walî gazî rêvebirê çandê kirîye, civîn hebûye.”

Teknîsyen dibêje, “Wele pir baş kirîye.”

Mihasebevan dibêje, “Piştî taştê em herin porbirekî, serê sibê teraş nebûm.”

Şofêr dibêje, “Baş e, ez ê jî çemika stûyê xwe rast bikim.”

Em û derhêner li hev dinêrin, dibêjim, “Dibe, yên min jî dirêj bûne.”

Piştî ku Apê Elesker çayên me nû dike kilameke Azerîyan ku dibêje, “Warê Elesker çi bikim/Li dinyayê ji mal çi bikim/Dawîya me axirê mirin e/ Çend gaz xemê min hebe...”
Li dîwarê ku derhêner piştta xwe dayê tabloyeke xwîn û hovîtîyê.
Bi gotina, “Apo ev çi ye?” dipirsim.
Bi carekê ve hêstir ji çavên wî dibarin, bi dengêkî zîz dibêje,
“Lawo, ew Kərbela ye.”

Ez Kerbela me, hêstirên çavên Alî me, goştê canê wî me, xwîna rehên wî me, canê Alî me. Gelo li ba Hezretî Pêxember ji Alî bi qîmettir kî heye!? Ez xemgînîya nava dilê Alî me, ez Hiseynê wî me. Ez efendîyê şehîdan im, ez Hemze me.

Ez şûrê Alî me ku ew şûr ji meydana şer re hatîye şandin, ez Zulfikar im. Kîjan gotin dikare ji min tûjtir bibe! Ez sîrrê nav dilê Zeyneb im. Ruhê Sakîneyê me.

Ez baskên Cebraîl im, êtîmê Muhemmed im. Wî ez mezin kiribûm, ew bi xwe jî êtîm bû, stara êtîman bû. Ez mala wî me. Ez nîjada wî, xweyna wî me. Ez Kerbela me. Werin binê baskên min; lewra ez sewana canfîdayê wî me, ez konê wêrekî û bêhnpakîyê me.

Hurr, yekî wisa bû ku rêya gelek kesên bawermend birîbû û şûrê wî bi xwîna gelek mazlûman sor bûbû. Gava ku ji nav dijmin derket û ber bi min ve dihat, pêşî leqayî Eba Ebdullah hat. Li ber konên Haremê sekinîbû. Silav da Eba Ebdullah û bi gotina xwe ya, “Ez gunehkar im, rûreş im, sûcdarê ku rêya we birî ez bûm...” bexşandinê xwest. Zarokên min Hurr dîtibûn û jê tirsîyabûn. Ji bo bexşandinê hewar û fîzar dikir. Li hev diçû dihat, gotinên poşmanî û tobeyê ji devê wî derdiketin. Ji min pirsar, “Gelo vê vegera min û poşmanîya min dê bê qebûlkin?” kir. Min jî got, “Dê çima nê qebûlkin, ê ku vedigere mîna ku qet tiştêkî nekiribe.” Çawan ku gotinên min bihîst mîna ku dinya bû ya wî, li ber rehma Xwedê kêfxweş û dilgeş bû. Li ser wê dilçoşîya xwe pêşîyaza, “Ji kerema xwe re destûr bidin min, da ku ji îro pê ve di rêya we de xwîna xwe bidim rêtin. Fersendê bidin min, heta ku Xwedê qewetê daye milên min bila şûrê min ê di kefa destê min de xwîna yên ku gef li we dixwin birijîne.” Li ser van gotinên wî Eba Ebdullah bangî wî kir û ew got, “Ey Hurr, tu mêvanê me yî, ji hespa xwe peya bibe û kerem bike da ku em te qebûl bikin.”

Carekê te ji Muawîye re nameyek bi vî rengî nivîsandibû: “Ez ditirsim ku peywira xwe baş nikaribim bikim û heqê berpirsariya xwe baş nikaribim bînim cih. Ji ber vê sedemê ye ku bi te re şer nakim. Tê ser dilê herkesî û dibêjin ku şikra ez ditirsim. Ez wiha bawer dikim ku ne hewceye meriv bi zaliman re şer bike; lê belê gava ku ji Mekkeyê derketim, di nîşeya xwe de min wiha nivîsandibû: Ez ji bo ku misilmanan berîhev bidim, har bibim û zilmê bikim ji Medîneyê neqetîyam. Ez tenê ji bo ku ummeta kalê xwe rast bikim, rêya bavê xwe bidim vejîyandin qîyam kirim.”

Ka gelo egîten ku li ber zilmê berxwedidin li ku derê ne!?

Gava ez hîn bûm ku Muslîm şehît bûye, min got, “Gelo hûn nabînin ku edalet hatîye wêrankirin? Hûn, ên ku mîletê berîhev didin û xerabîyan dikin nabînin? Hûn nabînin ku kes li ber zilm û fesadê berxwene? Li dinyayekî di bin zilm û zorîyê de, divê mumîn canê xwe hiç nebînin gelo? Ez Îmam Hiseyn im, barê piştî min ev e, ji ber vîya qîyam dikim. Di demeke wiha de ku dunya bi şûrê zilmê tê hûrkin, ez mirinê wek derîyê aramîyê dizanim. Hetanî ku ez bi zalim û zordestan re bijîm, mirinê hildibjêrim û hevî dikim.” Gava ku di binçavîya hezar leşkerên siwar de min dibirin Kûfeyê, vê gotinê xistibûm hijê wan: “We dît ku Sultanekî zalim rabû û bixwaze hêmanên Xwedê biguherîne, malê hemû bawermendan bixe binê

teserufa kesekî, sînoran bipelçiqîne û serûbin bike, xwîna misilmanan bêqîmet bibîne; di rewşeke wiha de hûnê li hember kirinên wî bêdeng bimînin gelo? Ger ku wisa be sibê roj hûnê di şûna wî de bikevin nav agir. Îro yên ku bi heqê hêsîr û feqîran seltenat dikin wiha nin. Ji Xwedê natirsin, sînorên îlahî qet nabînin û binpê dikin. Beytul malê misilmanan talan dikin. Wisa be bêdeng nemînin, xwe nekin mîna wan. Çûndina li ser rêça hêmanên kalê min û bicihanîna destûrên Wî, pêşî dikeve ser min.”

Tîrsa xwîna mirinê ketibû nav dilê herkesî. Hêrsa yên ku dilên wan ji qûşxaneyê li ser agir sortir bû û zêdetir diqelîya biserket. Şîmr, yek ji van ê dilkevir bû. Destûr sitend, rabû pêya û wiha got: “Ey emîr, bêguman ew ne li hişê xwe ye, êdî Hiseyn di destê we de ye, ger ku ji vê xirecirê xelas bibe, xelasî tune ji we re û dê we sax nehêle. Ew gav dê karê me zêdetir bikeve nav tevlihevîyê. Qey tu nabînî ku çiqas zêde alîgirê wî hene; çiqas girêdayê bavê wî û yên ku li ser rêça bavê wî diçin hene; çiqas tê hezkirin. Dê sibê êrîşê virê bikin û dinyayê li serê we xera bikin.” Agirê nefreta di nav dilê Ûbeydullah de ku razandîbû bicarekê ve gurr bû, hişê xwe anî serê xwe û bi xwe ve hat. Piştî li Şîmr nihêrt û ji wî re got, “Tu rast dibêjî”. Dûre berê xwe da kurê Sa’d, bi hêrs û xezeba nav dilê got, “Vî nezanî hindik mabû aqilê me tevlihev bike û bibe sedemê ku di nav xefletê de em bîn kuştin û binaxkirin.” Piştî vê gotinê bêsekin jê re nameyekê nivîsand û wiha got, “Me tu neşand wirê ku li me şîretan bikî. Tu wezîfedarekîyî. Çi bê gotin, çi bê fermankirin divê tu bikî. Li te çi ferman bikim, bê pirsyarî bîne cih. Ger ku tu vîya neynî cih hanhaneka dev ji peywira xwe berde û xwe bide alî.” Şîmr nameyê girt û roja Tasûayê, wexta esrê gihîşte Kerbelayê. Ji bo Hiseyn ew roj rojê gelek bi zehmet bû, ji alîyê xêrnexwazan ve hatibû dorpêçkirin. Şîmr nameyê da Umerê kurê Sa’d. Hiseyn di dilê xwe de derbas dikir û difikirî ku dê ew bibêje, “Ezê bi nevyê Pêxember re şer nekim, ez ê xwîna wî nerijînim.” Bi vî awayê dê li stûyê wî bixista û biketa şûna wî. Wekî ku hêvî dikir nebû. Artêşeke ku ji sî hezar kesî pêk dihat, dora konên Hiseyn dorpêç kirin; mîna lehîyê bigurrînê herikî û kekelê pê ket. Dengên hesp û însanan li nav hev ketin û li çolê olan dan. Zeyneb, li binê çadirê, li ber serê Zeynelabîdîn ê ku nexweş bû disekinî. Bi carekê ve xwe avêt derve. Hêzên dijmin hingî ku diçû nêz dibûn. Ber bi çadira Hiseyn ve bilez bazda, bi hewleruhî xwe avêt hundirê çadirê û got, “Birawooo rabe! Rabe ma qey tu wan nabînî? Ka li derve binêre çi dibe? Hiseyn, bi dilekî rihet û bi bêhneke fireh ji Zeynebê re got, “Bêhna xwe fireh bike, niha bi kalê xwe re dipeyîvim. Ji min re dibêje, Hiseynê min, tê di demeke nêzîk de werî cem min, em ê li bihuştê bi hev re bin, jihevduêrbûn diqede, em ê bigihîjin hevûdin.” Zeynebê, perda çadirê rakir û dengê neyarê ku xwîn ketîye çavên wan guhdarî kir, li esman nihêrt. Stêr dişemitîn, pêdiketin, ditemirîn û keskesoreke bi sorî ve xwe nîşan dida. Ti tişt mîna şeva Aşûrayê ji Zeynebê re zehmet nehatibû. Vegerîya çadira xwe. Lazim bû ku çek bêne amadekirin. Cevnê ku azakirêyê Ebûzer bû, li çadira kêlekê amadeyîya çekan dikir. Hiseyn ji wan re gotibû ku, “Îşev çadirên xwe nêzî hev bikin.” Di wê şevê de ku Zeynelabîdîn nexweş bû û Zeynebê jî bi hêvîya başbûna wî li ber serê wî disekinî; Hiseyn li çadira kêlekê, bi alîkarîya Cevnê şûrê xwe tûj dikir û wiha digot: “Ey zeman! Tu çiqas zalim î! Meriv ji dostan dûr dixîni! Belê tu wiha yî; lê belê ti tiştêk di destê te de tune. Me, li ber fermana Wî stûyê xwe xwar kirîye.” Zeynebê îskîniyê xwe diavêt nav xwe, bi Zeynelabîdîn re bêhna xwe girtibûn û di nav bêdengîyê de Hiseyn guhdarî dikin. Girî li wan kêmbû. Zeynebê dawîya dawî xwe negirt û bi birazîyê xwe re hêstirên çavên xwe berdan, îskîni bi herduyan ket. Hewar û gazî dikir, ber bi çadira Hiseyn ve diçû û digot, “Xwedêyo, çi dibû ku min rojê wiha nedîtaya! Xwedêyoo, Te canê min bistenda; lê min şahidîya vê keserê nekira!..” Çawan ku gihîşt çadirê, xwe avêt hundir, nêzî Hiseyn bû û serê xwe sipart sînga wî. Hiseyn jê re digot, “Xwişka min a delal, xemgîn nebe û bisebr be. Bila şeytan şefqet û merhemeta te ji te nestîne. Tu jî dizanî ku kalê me resûlê Xwedê bû, ji min û te mezintir bû. Bavê min, dayîka min, birayê min li pêş min bûn, biqîmet bûn. Ka li wan binêre ku ew hemû ber bi warê axretê ve koçkirin. Ez jî diçim cem wan, digihîjim welatê xwe yê berahîn.” Zeyneb jî jê re got, “Ez qurbana birayê xwe me. Tu rast dibêjî, yên berîya me çûn. Kalê min,

bavê min, birayên min ji dinyayê çûn. Çend kesên ku bi heyînên xwe aramî didan dilê min hebûn. Ger ku te jî winda bikim, ez ê ji niha pê ve çawa dikaribim di binê giranîya vê dinyayê de bisekinim?” Hiseyn zûzûkan gazî Ebbas kir û jê re got, “Nesekine, çend merivan bide ba xwe, herin ji wan fêhm bikin, ka gelo agahîyek heye tune hîn bibin?” Ebbas çû û ji wan re got, “Birayê min dixwaze hîn bibe ka gelo em ê kengê şer bikin.” Umer jî ji Ebbas re got, “Here û jê re bibêje ku ya bila teslîm bibe, yan jî dê bimire.” Ebbas fetilî û Hiseyn da agahdarkirin. Hiseyn li ser vê agahîyê fetilî, li rêhevalê xwe nihêrt û got, “Em ê teslîm nebin, hetanî ku xwîn di canê me de hebe em ê şer bikin. Niha here, bixe hişê wan û bila bizanibin ku ev ne meseleyek wisa ye ku Hiseyn ji bo şeveke din jî zêde bijî, vê pêşnîyaza we fersend û xenîmet bibîne. Ez dixwazim ku îşev li hizûra Rebbê xwe îbadetê bikim û bexşandinê bixwazim.” Hiseyn wê şevê bi nîyaz û duayê derbas kir. Bi ronahîya serê sibê re wiha bangî dostên xwe kir: “Hûn ronîya çavên min in. Ji we hemûyan kêfxweş im û heqê we gelek li ser min heye. Ti fikar û tirsek di dilê min de tune. Vîya baş bizanibin ku derdê wan ez im. Ger ku hûn li pey min hatibin, destûr didim we hemûyan, hûn azad in. Dilşikestineke herî biçûk jî dê neyê ser dilê min, ew kes ê ku wiha bifikire jî bila rehet be.”

Hezkirî û rêhavalên Hiseyn, bi dilên xwe yên peritî, bi çavên xwe yên bi girî, bi canên xwe yên ji qurbanbûnê re hazir, bi anîyên xwe yên bi nûr, bi heyranîya xwe yên rêya Hiseyn; herkesî li Hiseyn nihêrt û bi yek gotinekê gotin, “Em qurbana rêya te ne”. Gava ku Kerbela bi ronahîya pêşî a serê sibê re hat şûştin şer dest pê kir.

Gava ku ew bişewitin, ez ê çawa hênik bibim?

Qasim sêzdeh salî bû. Yadîgarê Hesên bû. Şûrekî li gorî telê wî nehatibû dîtîn. Bê şûr, tenê bi wêrekîya xwe hespê xwe ajotibû nava neyaran. Bi derba ku li serê wî ket ji hespê xwe de ket xwarê. Piştî ku li erdê gêr bû, di nav xwîn û êşa birînê de hewar kir û got, “Apooo... alîkarîya min bike; apooo... min bibîne, bigihîje min.” Bi dehan leşkerên Umer ên ku çav li wan tarî bûbû, li dora wî civiyabûn û dixwestin ku li stûyê wî bixin; lê belê bi dîtina çavên xwe nihêrtin ku çî bibînin... Dîtîn ku Hiseyn mîna şêrekî ku ber bi nêçîra xwe ve bihêz tevdi gere, hespê xwe bi ser wan ve diajo. Wekî rovîyan vir de wir de revîyan. Ê pêşî ku xwest serê Qasim ji ucûda wî biqetîne û li ser wê armanca xwe ku destê xwe bilind kir, bi carekê ve di binê pêyên hespê xwe de gencegence bû. Der û dor di binê toz û tubareke wisa de mabû ku çav çavan nedidît. Piştî ku xirecir qedîya Hiseyn serê Qasim danî ser çokên xwe. Qasimê reben ê biçûk digirîya. Heta ku qewet di canê wî de hebû, serê xwe bi sînga Hiseyn ve baş dişidant, ji êş û elemê birînan neditevitî, pêyên xwe li erdê dixist. Êdî zêde tebat nedihatê û dipirpitî, hetanî ku ruhê xwe teslîm kir serê wî li ber dilê Hiseyn ma. Hiseyn, laşê wî yê bêcan hemêz kir û ber bi konan ve meşîya. Piştî li bedena xwe ya ku di nav xwînê de mabû nihêrt, bi dehan birînê kêran dît, sîya şûr li ber çavên wî çû û hat. Li ser serê wî hênikayîyek çêbû. Nihêrt, ewrek dît. “Di kêlîyeke wiha de, ew jî kî ye ku ser germa tavê ya ku dişewitîne digre?” Ewr bang kir û got, “Gava tu hatî dinyayê yê ku mizgînê da bavê te, yê ku qumatika te bi dîya te re pêçand ez bûm; ez ne ewr im, ez Cebrail im. Tu bibêje, ji bo te çî bikim, canê min bixwaze bidim.” Hiseyn jî jê re got, “Çima tu hatî, ne bi dilê min e ku tu ser min dikî sî, baskên xwe hilîne; lewra tu nahêlî ku kalê min ji esman min bibîne, tu jê re dibî asteng. Dev ji min berde, here li ser birayên min baskên xwe veke. Nesekine, xebera min bigihîjîne Necefê. Bibêje ey Alî, bigihîjê kurê te dimire. Ji bo ku cara dawî li ber sînga xwe wî hemêz bikî bazde, bilezîne... Bila were, serê min bide ber sînga xwe, min di nav milên xwe de hemêz bike, bila Kûfeyî jî bibînin, bila bibînin ku bavekî min ê mîna Alî heye.”

Axx, ey dijminê ku çavên wan têr nabin, ax ku çî ax?!

Cebraîl baskên xwe li ser şehîdên ku di agirê çolê de dirêj kiribûn vekir. Mîna baranekê, li ser herkesî de wekhev barîya. Hiseyn bang kir, “Nesekine, here ji min re dayîka min bîne, ev agir min naşewitîne, hesreta dayîka min janê dide dilê min.” Cebraîl xwar bû, baskên xwe bi xwîna Hiseyn da. Qîrînekê ji dilê Hiseyn bilind bû. Cebraîl ber bi esman ve bilind bû, çû çû heta ku ji ber çavan winda bû. Çavên neyaran ji xwînê têr nedibû. Vê carê Malîk derket û hat.

Careke din şûrê xwe li serê Hiseyn ê ku bi xwînê hatibû şûştin xist. Serê wî bi giranî birîndar bû, belav bû. Ev jî ji wan re Têr nekir, Ebûlhûlûk derket pêş, kevana xwe tikand û tîrê xwe berda serê wî yê birîndar. Dûre Hasîn derket pêş, diranên Hiseyn şikand. Ebû Eyyûb û bi dehan kesên pey wî yên ku tîyê xwînê bûbûn dan pey hev û hatin. Hinek ji wan tîrê xwe diavêtin ucûda wî ya birîndar, hinek ji wan rîman li canê wî dixistin, hinek ji wan jî kevîran diavêtinê... Dilê Ebû Eyyûb rehet nebû, bi destên xwe tîrekî di qirika wî de derbas kir. Wan çiqas lêdixist, Hiseyn jî şîkur dikir. Destên xwe yên ku bi xwînê hatibûn şûştin radikir û sebr dikir. Ji nişka ve dengê hat bihîstin, ji nava erd û esman dengê hat. Erd û esman lerizîn, ev hatina Cebrail bi xwe bû. Hêdîka nêzî Hiseyn bû. Bi baskên xwe birînen wî miz da, bi silavên herî xweşik silav lê kir, mizgînên herî mezin dayê. “Wir de herin, xwe bidin alî, Pêxemberê dawîyê (s.x.l.) tê. Kalê wî tê dîtina cangorîyê xwe, Hiseynê xwe.” Ti tiştekî ewqas dilê Hiseyn dilxweş û dilgeş nekiribû. Birînen ucûda wî bi carekê ve baş bûn, xwîn sekinî, êş danîn, ji tîbûnê xelas bû. Cebrail mizgînîyê dida, “Wir de herin, xwe bidin alî, şêrê Xwedê tê. Sultanê alîyê din, ji bo ku agirê hesret û kesera nav dilê xwe, bi kurê xwe bide tefandin tê. Hesenê ku kezabên wî bi jehrîyê zeng girtîye tê, dayîka wî ya ku bi şevan xewna xwe feda dikir tê, ji bo çavên wî girêbide, ji bo ku ew wî bikşîne ba xwe, pîreka herî bixêr tê, Fatima tê.” Hiseyn gava ku çavên xwe vekir, li ba xwe Hezretî Pêxember (s.x.l.) dît. Serê wî dabû ser çokên xwe. Kalê xwe dît. Êşên xwe ji bîr kir, ji can derbas bû, di dilê wî de gul dest bi vekirinê kirin, dilê wî bû gulîstaneke sor. Çavên xwe ber bi dijmin ve fetiland, heta ku bêhna wî têr kir qîrîya, “Wexta di şûna hêstiran de de ji çavên Zeynebê xwîn hat, min bikujin! Nehêlin can di min de bimîne, bilezînin, ji vê dinyaya zalim min xelas bikin, min bikujin. Bila dinya ya we be, min bişînin warê min ê berahîn.” Vê carê yekî din ku çavên wî tarî bûbûn xwe avêt pêş, xençerê di dilê wî de derbas kir. Axx, hewar e!.. Ez Kerbala me, hewarekî bi min girt. Hewar e, gidîyano hewar e, Hiseyn wînda ye. Hiseyn nayê dîtin. Xwe avêtîye sîwanên ji nûrê. Cebrail Hiseyn vedişêre, Hiseyn xwe ji ber çavan veşart. Ez dilê Hiseynê xwe me, tenê ew tê dîtin. Kuher bi paş ve vekîştin. Li ser serê Hiseyn Alî dîtin.

Wan jî bi çavên xwe Alî dîtin. Melayketên ku baskên xwe li hev dixistin hatin dîtin, Cebrail hat dîtin. Ez laşê Hiseynê xwe me ku ji xwîn û nûrê nayê dîtin. Bi tena serê xwe me. Ji Xwedê pêştir îlah tune, ji çolê ber bi esman ve dengê min bilind dibe. Xwîn li sûretê Pêxember ket, sûretê Wî yê mubarek bi xwîna Hiseyn hat şûştin. Xwîn zaliman girt, çol bû behra xwînê. Dengê Fatima, bi şîna Hiseyn erd û esman tije kir. Sakîne di çadirê de xwîn girîya, Zeynebê ket nav ewran. Qîyamet ji bo roja Aşûreyê şîn girt. Pêxember girîyan, çerxa dinyayê hate dorpêçkirin. Şaxê Necefê li serê xwe xist û girîya, zarîna wî dinyayê daqurtand. Pêxember rakir îmameya xwe û serê wê vekir. Erd û esman dest bi lerezê kir, Cebrail baskên xwe kişand. Ziman hatin girtin, çav hatin kişandin, dest hatin şikandin, mil ketin. Sînga Hiseyn a birîndar bi gîzma cellat hate pelçiqandin. Hey belqitîyo!.. Çawa gunehê te bi xezalê nat, ey nêçîrvanê bêxwîn? Vê gotinê têrî te nake, qîyamet îcabê te nake. Cehennem îcabê te nake, bihuşt îcabê te nake. Çawa gunehê te bi mesûmê Fatima, bi canê Alî, bi çavê Mehemed nehat? Dinya îcabê te nake, axret îcabê te nake. Gotin nagihîje te, agir nagihîje te. Bê dayîna avê kîjan qurban hatiye jêkirin ey mel’ûn, ziman û lêvên mesûm ji tîna şewitî, bêav ma, dilopek av bidinê. Kîjan xençer, qirika yê ku kezaba wî bi agir şewitîye dikare jêbike? Ez Kerbela me ey Muhemed. Ji çavên min ne hêstir, xwîn tê. Ey Muhemed, di agirê çolê de min xençera zilmê xwar, ketim destê zaliman. Ey Mehemed, ji bo xatirê dilê min ê jankirî, ji bo xatirê xwînen ku bêguneh dirîjin, ji Wî re hewar û fîzar bike, ji bo xatirê navên Wî yên xweşik nîyaz bike, bila roja rabûnê yên ku di rêya wî de çûne bibexşîne. Hiseyn bi gotina dawîyê şahidî kir. Rûyê erdê reş li xwe kir, erd hejîya ey Hiseyn. Bayê Sabayê hat. Cebrail taca xwe hilanî û girîya ey Hiseyn. Qendîl temirîn, Kerbela bixwînê hat şûştin ey Hiseyn. Sakîne kete nav lepê zaliman, mala dostên te hat talankirin ey Hiseyn. Xerîbê Kerbelayê tî hat kuştin, esmanên Xwedê xera bûn ey Hiseyn!

56.

Çar qoltixên salona Orkîde Kuafurê jî ekîba me ya karê kêşê tije dike.

Yadîgar osta, porbirê Qersê yê ku herî hindik dipeyive û destê wî herî bi lez û bi merhemet e. Wextekî sunneta zarokan jî kirîye.

Ji şofêr re dibêje, “Lawo, êdî polîklînîk hene.”

Mihasebevan dibêje, “Apê delal, derûdora guhên min zêde veneke.” Yadîgar osta jî bi gotina, “Lawo, ez çiqas bibêjim temam jî, tiştê ku ez dizanim ez ê wisa bikim.” bersiv dide.

Çayên me tîn. Qalfa naylonê dora stûyê min vedike û dibêje, “Kekê çaya xwe vexwe em ê paşîyê dewam bikin.”

Li ser teyîbê gotineke evîndaran, “Piştî xwe nede dinyayê ku ez ê bigihîjim dewletê/Dinyaya fanî ji mirovekî re nema/ne ji seddê Înkender re ne ji Rustemê Zal re/Ji şêrekî mîna Alî re nema”

Şampûan, pêşokên teraşê yên arkoyê, spreya, kolonya, aletên por ê ziwakirinê, ûstûrayên cur bi cur, şe, meqes, mûyên ku divirvirin, postera fenerbahçeyê, wêneyê Menderes, tarîfe, teswîreke Aşîk Şenlîk...

Li vê dinyayê edaleta wî hebû/Di deryayan de ji masîyan xereç disitend/Hemû çûk dihatin dîwana wî/Ji Suleymanê kurê Dawût re nema.

Hingî derhêner dipirse êdî tebat nayê û dibêje, “Aşîk Şenlîk şivanê qaza bû ye. Wexta ku sêzdeh salî ye, li gundê Sûharayê ku girêdayê Çildirê ye gava ku qaza diçêrîne di xewde diçe, xewn dibîne. Li van deran jê re Bibade tê gotin. Êdî çi dîtibe em dizanin, piştî ku şîyar dibe dest bi gotina helbestan dike.

“Bicivin dostno, yaren û rêhevalno/Ez îşev ketim derdekî bê derman/Ji hîmmeta pîr û ji abê zulal/Ji kanîya kewserê min vexwar îşev.

Tabî gundî fêm nakin ku vîya çi dibêje.

Li gund melayek hebûye, wî dibin cem mela, seyda li wî guhdarî dike, “Dersê ji dibistana qudrêtê dan /Ji zahirê xuya bû erş û kursî/Hişê min hat girtin bi erebî û bi farisî/Min luxata îmranê hilbijart îşev.” Seyda jê re dibêje, “Kurê min, ka hinekî din jî bibêje ji min re”.

“Şenlîkê sefil di heq de dît kemalê/Bi vê fikrê divê bibêjin wesfê halê/Min dît cemala xweşik bibedirbûye/Di nav taxayyurê de ecêb mam îşev”

Seyda dibêje, “Çi hatibe serê wî êdî bûye, tiştêkî ji dest nayê. Wisa dixuye ku xewneke sadiq dîtîye, ji çilan dest girtîye. Tiştên ku dibêje tenê alimên Erzeromê dikarin fêm bikin, bibin cem wan.”

Birazî, tiştê ecêb jî ew e ku navê wî Hesên e; lê belê ji xwe re dibêje Şenlîk.

A wele mesela wî jî wisa ye, ew ro îro wisa hatîye û çûye.

Yadîgar osta jî karapapak e.

Gava ku Mihasebevan behsa camêrî û wêrekîya karapapakan dike, di ber xwe de dibêje, “Dev jê berde birazî, ji bo tûtikekî li hev dixin...”

Derhêner dibêje, “Eee osta, serokwezîr jî hat û çû, tu dibêjî dê çi bibe?”

“Wellehî min xwe dîtîye û nedîtîye diçin û tîn; lê belê ti tiştêkî jî nabe.

Derhêner deibêje, “Min ji tirê qey çûye dergaha ewlîya jî.” Ku Yadîgar osta tiştêkî nabêje derhêner gotina xwe didomîne, “Awê ku dibêjin gelek jî berarî hiştîye...”

Tebat nayê osta, “Lê tu dizanî ku Şêx çi kirîye?”

“Ez ê ji ku de zanibim.”

“Duh Seferê ku li dergahê ye vegot. Piştî nimêja Înê derbasî dergahê bûne. Zerfeke tije danîne ser rehleyê û gotine, “Min vîya ji derwêşan re anî, hûn qebûl bikin ez ê kêfxweş bibim.”

Hezret jî li dora xwe nihêrtîye û gotîye, “Wellehî, ê ku berahîn sofî ne bila hilînin. Ez newêrim ku gotina derwêş bidim ser devê xwe.”

Qalfa dibêje, “Van karan meriv jî bi xwe re dibin.”

Gava ku ûstûra di binê çena min de digere diveciniqim.

Mirina kurê zanyar di çavên min de derbas dibin.

Sefer ji min re vegotibû.

57.

Dostekî Şêxê Xereqanê xwest ku here Hecê.

Zanyarekî din ê ku jê pir hez dikir, bi dostên xwe re gihîştin wî.

Gava ku ji Nîşabûrê derketin got, “Ger ku em neçin, ew camêrên azîz dê mecbûr nemînin ku ezîyetê bikşînin.”

Derwêş ji hevûdin pirsar, “Şêx xwest ku çi bibêje gelo? kirin; lê belê ji tiştêkî ji hevûdin dernexistin.

Agahî gihîşt dergaha Xereqanê, “Dê sibê filan zanyar were cem we.” Mubarek gelek kêfxweş bû. Ji kurê xwe yê biçûk gelek hez dikir, mîna Yûsifê Yaqûb. Ew roj dizewicî. Ji gundê cîran, keça zanyarekî bûk dianîn.

Mehra wan birî û ji malê derket.

Qasek şûn de hewar û fîzar ket hewşa dergahê.

Serê lawikê li gewda wî jêkiribûn û avêtibûn ber derî.

Gava ku ji tekyayê derket, pêyên wî li tiştêkî ket û litimî, bala xwe dayê ku ronîya çavên wî.

Bangî pîreka xwe kir û got, “Çirayê bîne.”

Jinikê gava ku ronkahîyê anî çi bibîne!

Gazî çend heb derwêş kir, hatin û wî şuştin, kefen kirin, li nava dergahê şiltayek raxistin, wî dirêj kirin û serê girtin

Derbasî odeya xwe bû heta serê sibê îstixfar anî.

Bi ronkahîya serê sibê re derwêşek derket û hat, ji wî pirsar, “Hevalê min ê hêja li ku derê ma, ka dê bihata?” kir.

Mêrik got, “Duh bi şev rê wînda kirin, heta êvarê encax werin.”

Bi gotina, “Hiş!” bi sîfê wî ket û bi ser de çû, “Ew rê wînda nakin. Cîyekî ku ji bereketê nisîbê xwe nesitendibû hebû, bi gotina, “Ji pêyên dostên xwe pêyekî bi min bide da ku roja rabûnê li hemberî axên din bila dikaribim pesnê xwe bidim, li vê dinyayê jî bila bi bereket bim.” fîzar kir. Ji bo ku xwesteka wê bînin cih azîzan şandin wir. Ew ax hat xelatkirin, em li vir jî ber ku bê wî mane serê lawikê me jêkirin.”

Ku derwêş çûn û pê dan zanîn, zanyar bi gotina, “Yê herî mezin Xwedê ye” qîrîya û ji bo ku here Xereqanê derket rê.

Li ber derê dergahê wî pêşwazîkirin.

Hevûdin hemêzkin.

Got, “Ji birîneke wiha re tenê meriv dikare merhemeke wisa pêbide. Ji hatineke wiha re qurbanekî wisa lê tê.”

Li ber cinaze çok şikandin. Her du jî digirîyan.

“Dost li derve li hêvîyê ne, nimêja ku divê em bikin heye.”

Cinaze derxistin derve, nimêja wî kirin û veşartin.

58.

Piştî kêşa rêvebirîya çandîyê ekîp belav dibe. Têm înternetcafe yê.

Te bi şev di sisê û çil û şeşan de şandîye: “Tê heddekî wisa ku di bin bar de bipelçiqim, lê bi carekê ve rast dibim û vê jîyana berbat didomînim. Dibêjim ya ku didomînim, ger ku ne mecbûr bim, ez ê rakim serê xwe, lêxim û herim, ji bo ku ber bi nebelîbûna mutleq ve herim ez ê derketima rê. Her tim min bêrîya tişteki kirîye û sekinîme. Niha di halekî wisa de me ku ketime valahîya ku di bin wê bêrîkirinê de ye. Derûdora min bi çar alavên agir hatîye dorpeçkirin, li cîyê ku lê me canê min dişewite. Li dinyayeke ku her tişt maneya xwe winda kiribe ,meriv çawa dikare bijî, aqilê min nagire. Ez ji xwe tişteki nizamim, fêhm nakim. Ev rehtî qet naqede. Hatim cîyekî wisa ku xewn li pey xewnan, bêrîkirin li pey bêrîkirinan, azwerî li pey azwerîyan, xwestek li pey xwestekan, bîrhatî li pey bîrhatîyan, sal li pey salan, meh li pey mehan, hefte li pey hefteyan, roj li pey rojan, saet li pey saetan, deqe li pey deqeyan, sanîye li pey sanîyeyan û valahî li pey valahîyan diçin...”

Cêyê ku tu jê re dibêjî bê cî û warî vir e gelo?

Bêdengî hikma xwe li vir dike.

Di eynî demê de wîzînekî ecêbe jî, perdeya guhên min diteqîne, li mêjîyê min dixê.

Canê min pir diêşê li ku derê yî, nava dilê min dişewite.

Li binî ji helbestê Laleyê beşek:

“Divê bexçeyek biçûk ê herkesî hebûya
li serê bi saetan danûsitendina fikr û ramanan
wek mînak ji nav me yek ku dinav bexçê xwe de piştî nivê şevê
tişteki ecêb ku dîtibe divê bê guman
hevalên xwe bigerîya
li ser cîsimên ku diçin û tîn mûmên pembe
divê xwe biveşartana
tam ku bibûya nivê şevê bi carekê ve
divê mona lîsa lê bixista...
di firaqên zîv de xwarineke tamkirinê
divê hebûna...
çi tişteki ne xweş e, niha wexta ku li derve dinêrim
ji te re ewqas xerîb bûme...
me ew qas gazinca kir ku...
lê belê niha gava ku destê xwe dirêjî derve dikim
ji xeynî hînbûna ka gelo baran dibare an na
di derheqê te de nedîtina min a ti tişteki
sedemê ku ez xwe nikarim bi te ve bigirim ku kujer jî li pey xwe
rêça dest dihêlin, çi êşeke mezin...
niha li ser min hebûna eşofmanekî mexmûr ê lacîwerd
ku pi sîmên zer hatîye çêkirin

gelek kêfxweşbim jî hemû vana
û dev ji hemû tiştan berdim
bi kincên tenik ê bi kulîlk
li serê min kumekî sê goşeyê zilûk
li zevîyên birinc ê avî
çi ne xweş e ku dizanim bi te re, li kêleka hevûdin em ê nikaribin bigerin...”

Rûpelê bi zorê digirim û dertêm.
Ne guhdarîkirin ne jî xeberdan, dixwazim herim cîyekî wisa ku li wir ne deng hebe ne jî gotin.
Gava ku dertêm yê ku li ber qasê ye diqîre, “ezbenî, we heqê xwe neda...”
Difetelim, bi nêrînên vala li wî dinêrim.
“Temam ne girîng e, jixwe du sed û pêncî quruş e.”
Pere datînim û dertêm.
Ez ne wêneker im, ez nikarim vê wêneyê çêbikim, ez ti car nikarim van kitekitîyan çêbikim.
Min nexwestibû ku wisa bibe.
Pir xemgîn im.

59.

Ji wî re xem jî tê gotin. Xem, ew e ku meriv derewan nebêje.
Te digot, mirov ku derewan nekin bi têra xwe xweser in.
Rast e.
Ji wî re sekr jî tê gotin. Sekr serxweşî ye. Serxweşî, derbasbûna astengîyên hundir û derve û bi vî awayî çûyîna ber bi wî ve ye.
Tenê ye ku xwe winda dikin dikarin berê xwe bidinê.
Gava ku meriv ji hestan bibe, rawşa mit û matmayînê çêdibe.
Bi vî awayî rêwî di nav mit û matmayînê de dimîne.
Ji wî re, ji holê rabûna hiş û xwe parastin jî tê gotin.
Bi vî awayî di nav hîçîyê de xwe winda dikî.
Tê gotin ku Zanyarê Bayezîd ê Bîstamî heta ku dema ebdîtîyê dihat di nav cezbê de diman, gava ku wexta nimêje dihat difetilîn hişê xwe, piştî ku ebdîtîyê dianîn cih dîsa ji xwe ve diçûn.
Ji vîya re fena jî tê gotin.
Ji nefsê dûrketina xerabîyan e.
Beka jî tê gotin.
Di nefsê de bicihbûna başîyan e.
Ji vîya re vecd jî tê gotin.
Bê ti hewildanekî, xwedîbûna şahî û xemê ye.
Ji vîya re fark jî tê gotin.
Danîşana tiştê derveyê wî ye.
Cem jî tê gotin.
Tenê kînayeya heyîna wî ye.
Di wî de tune bûn jî tê gotin.
Di wî de, hebûn e.
Tu dikarî bibêjî bêyîwîtî jî nemumkun e.
Gava ku digihîjî wî ew jî diçe, ji vîya jî xelas dibî.
Jibîr neke ev bedêl e, tu ne ebdal î.
Tu nikarî bikevî şûna yekî din, ew berê bû.
Berê di nefsê de başîyek dihat, bera xerabîyek dida û di wir de bi cih dibû.
Ew heft kes bûn, çil bûn, heftê bûn
Gava ku yek dîmir ji nav mirovan yek diket şûna wî.
Ew berê bû, niha ebdal kî ye, cezbe kî ye, em kî ne.
Tu vana çima ji min re vedibêjî.
We got ya “Na ez xemgîn im”. Ji ber vî min jî xwest ku ji we re hinek behsa xemê bikim.
Temam min jî we bihîst.
Lê belê tenê min bihîst.

60.

Ku te got Bayezîd, dizanî çî hat hişê min?

Çî hat?

Ji salê carekê ji bo girê ku gorên şehîdan li wir in zîyaret bike dihat Dehîstanê.

Gava ku di Xereqanê de derbas dibû, disekinî, qasek bêhna xwe dida û hewayê dikişand nava xwe.

Gava ku rêhavalên wî jê pirsra, “Ezbenî, hûn çima wisa dikin?” dikirin, wî jî digot, “Ji vî bajarokê muhtekîran bêhna dostekî Xwedê tê min. Navê wî Alî ye, kunyeya wî Ebûl Hesen e, ji min sê pêplûk jordatir e. Gilûra malbatê li ser wî ye, cotkarîyê dike û daran datîne.”

61.

Min ji Şêx pirs, “Ev gotin rast in?” kir.

Wî jî got, “Em wisa bawer dikin.”

Em li ber aşxanê ne.

Berf dibare, destên wî li pişt wî ne, sakoyekî reş lê ye. Li serê wî kolosekî ku ji kulav e.

Dimeşe, gavek li pey diçim.

“Serê pêşî bi qasî donzdeh salan, piştî eşayê tê Bîstamê, cem turbeya Bayezîd û bi gotina “Ji kincê ku tu didî wî bêhnek bide min.” nîyaz dike, dûre difetile Xereqanê û tê gotin ku bi destnimêja eşayê nimêja serê sibê dikir. Di wê demê de li Xereqanê dizî gelek dibe. Di wî wextê de rêgirek piştî ku dizîyê dikir, radikir serê xwe û cim û cela dibû. Gava ku vîya dibihîst, berxwe diket û digot: “Ez li ser rêça vê dozê ji şakîyekî paşdatir nikarim bimînim.” Serê xwe datanî ser axa Bayezîd. Xwe jê re dikir gazî. Lê belê qasekê jî ranediket, lingên xwe dirêj nedikir û piştî xwe nedidayê. Donzdeh salan ji axê li hêvîya dengê ye. Bi hêvîya wî dijî. Paşîya paşî yê ku li hêvîyê ye tê. Bayezîd, wiha bangî dilê wî dike: “Êdî wextê rûniştinê hat.” Wê gavê dikeve nav tirs û fikara, dilê wî diquncife û dibêje, “Heywax, ez ê çi bikim.” Bayezîd jî dibêje, “Netirse, ez dizanim tu ummîyî, tişteki nizanî, tu nikarî kitêbê di ser de jî bixwînî; lê belê gava ku hîmnet hebe, behr vedibin, çîya dimeşin, gencîneyên esman vedibin.”

Dest bi girî dike, diçe ser çokan, bi axê ve dizeliqe û bi gotina, “Ji min re hîmnet dike” fîzar dike.

Dengê tenê tê, “Çi tiştê ku ji min re hatîye bexşandin, hemû ji bo heqê te hatîye dayîn.”

Ecêbmayî dibîne, “Lê ev çawa dibe, tu sed sal berîya min nejiyayî gelo?”

“Rast e; lê belê kengê li dora gundê we de derbas dibûm, min ronahîyek ku dirêjî esman dibû didît. Min sî sal raza vî tiştî pirsî û sekinîm. Paşîya paşî ji dilê min re hat gotin, “Xatirê wê ronahîyê bi bîr bîne ku bila sîrrê wê li ber te vebibe.” Min got, “Baş e, ew ka li ku derê ye, kî ye ew?” Hat gotin ku “Ew evdê me yê bijartî ye, jê re Ebûl Hesen tê gotin...”

Deng tê birîn. Her tişt tikeve nav seknê, êdî armanc hatîye cih, raz vebûye, dil bûye gulistan. Di nav heybetekî de difetile Xereqanê. Gava ku digihîje malê, kitêba pîroz di hişê xwe de dibîne.

Roj di ser de dikelibin, rojekê wexta ku rezê xwe dikole, bi serê merra wî re kûpekî zîv dertê. Careka din jî mera xwe di erdê de radike, vê carê kûpekî zêr dibîne. Li zêr û zîvên ku bela wela bûne dinêre û di ber xwe de dibêje, “Min bi vana nexapîne, ez ti car berê xwe ji te venagerînim.”

Gava ku serê sibê erd diajo û wexta nimêje tê, gîsinê xwe datîne û diçe. Lê pirê caran dîtîye ku ga bi tena serê xwe cot didomînin. Gava ku li wan dinêre jî xwe bi xwe dibêje, “Gava ku ez fêm dikim ku ti tiştêkî nizanîm, ji tiştê ku dizanîm jî şerm dikim, êdî min nexwe şermê.”

Girîyê pir û kenê hindik, bêdengîya pir û xeberdana hindik, dayîna pir û xwarina hindik, bibîranîna pir û raketina hindik ji xwe re kirîye daçek...”

Em li ber kumbetê de derbas dibin û dikevin kuça ku li binê bendên derve ye.

Li milê rastê mala Sancar Kalay. Silav dide, dest û serûçavê camêr di nav toz û tibar û tenîyê de ye, silava wî vedigerîne, wî keremî hundir dike.

Dibêje, “Were” û kursî derdixe.

Çaydanê çînko, du heb pîyaleyên biçûk, bêhna çayê li gewrîya min dikeve.

Em li sikûmê camêr dinêrin... Berê, gava ku min li serûçavê yekî dinihêrt, min ti car hest nekiribû ku mîna ez li asoyê dinêrim. Camêr li alîyekî çep ê bajêr, di nav agir de dijî; lê belê mîna ku di daristanê de dijî asûde ye.

Mursel efendî dibêje, “Hevalê min ê zaroktîyê ye. Wê çaxê em li taxa Yûssif Paşayê rûdiniştin.”

Agir, tenî, bêhna potikê şawitî û qela. Li destê mêrik dinêrim. Ji wî wisa dûrim ku di derheqê wî de nikarim ti angaşê bînim ziman.

Hikm derbaskirina her tiştî, di nav qederê de veşartî ye gelo?

Çi diqewimin, tiştêkî fêm nakim.

Dibêje, “Hevalê me ji Enqereyê ye. Kameraman e.”

Dibişire. Di pêçikên wî de tebeqeyek çermê qalîn ê mirî ku qusîyan e. Birûyên mezin ên rep. Qirika wî qoq e. Zêde jar û bêqewet xwanê dike. Meriv bawer nake ku canekî di nav wî de hikm derbas dike. Ji vî halî tiştêkî fêm nakim, rêzdarîyeke ecêb, awayekê bi edeb li ser kursî sekinî ye.

Holderlîn digihîje hewara wî, “Mirov li ser rûyê erdê bi awayekê helbestvane rûdinên.”

Em destûr dixwazin û radibin. Em dikevin kuçeyêke din a ku kuçeyê bi dergahê ve girê dide. Bi hişekî ne tamam dibêje, “Mursel efendî ermen e.”, li erdê dinêre. Hunermendekî baş e.”

“Li taxa we ermen pir bûn gelo?

Bi dilekî şewitî dibişire, “Belê, lê paşîyê bayekî samî hat, jehrîyê xist nav her tiştî.”

Qasek bêdeng dimîne. Bi gavên hêdî û bi wezin dimeşe.

Disekine û li bajêr dinêre, “Mîna nexweşîneke demdemî bû nijadperestî...li herkesî xist...”

Heya dergahê napeyive. Gava ku em ji hev vediqetin, difikirim ku şewat tiştêkî wisa ye, bi parvekirinê zêde dibe.

Gava ku dihatim vir, di balefirê de, ramanêke ku baş nediket binê kincê gotinê, li dora min diçû û dihat.

Tiştêkî wisa ku mirov êdî îro bi ti awayî û li ti cîyî nikare rastî derûnîya xwe bibe... Her tiştên ku leqayî wan bûm, vîya ber bi valahîya nav min ve tehm didin.

62.

Em li lobîyê ne. Ji zaningehê pisporekî ziraetê, rêvebirên bajar ên çandinî û perwerdeya netewî, rojnamevanek, derhêner û yên din... Pisporekî behsa hatina xwe ya bajêr, tiştê ku dîtîyê û tiştê ku hatine serê wî dike.

“Hûn dizanin demekî dirêj min brokolî li market û mêvîfiroşan nedît.”

Rêvebirê çandinîyê dikene.

“Lê belê bi ser qaşarê we de jî tune.”

Çawa ku derhêner li saeta xwe dinêre, rêvebirê perwerdeya netewî dikeve nav gotinê, “Hay loo, camêrno saet ji donzdehan bihurîye, me wextê hevalan xwar, êdî bila bêhna xwe bidin.”

Gava ku dertêm odeyê dîsa eynî valahî.

Bê mekanî yê gelo, an çûyîna hiş e?

Pirtûka ku min îro ji dergahê girt vedikim.

Nûra Îliman.

Ji Zanyarekî re wiha hate gotin, “Rabe! Bê sekin here Xereqanê. Emanatê me yê ku li wir e bîne.”

Sere sibê gava ku şîyar bû kete rê. Gihîşt Xereqanê.

Şêx li ber derî sekinî bû.

“Got, emanatê te yê ku bi min re ye vê gotinê ye: Zanyar ne ji ritamê ne.”

Piştî ku qasek li dergahê ma û xizmetê kir vegeŕîya welatê xwe.

Demek dirêj li Zanyarê ku ne ji ritamê ye geŕîya, dawîya dawî wî dît û nas kir.

Misêwa wiha digot: “Zanyar jî wekî Wî bê mekan e.”

63.

Bi min re bipeyîve, şîretan li min bike.

Çima tu disekinî?

Ez li ba te nikarim xeber bidim.

Lê belê ji bo ku te guhdarî bikim hatim vir.

Tu nizanî.

Çawa yanî?

Ev raz e.

Lê belê tu dizanî, ji min re vebêje.

Tu kes sirran nizane.

Çawan dibe, tiştêkî ku yek tenê dizane nîn e ew?

Belê yek tenê; lê belê kî ye ew?

Ji kî re bixwaze sirrê nade wî?

Nayê zanîn. Raz, nependîtiya di nav heyîn û tuneyîyê de ye. Tiştê ku Wî nedabe zanîn, dibe yê ku tu kes nizane.

64.

Ji xewê hildipekim û şîyar dibim. Di nav xweydanê de mame.

Di odayê de germeke ku meriv difetisîne. Destê xwe didim radyatorê, destê min dişewitîne.

Diçim banyoyê û serûçavên xwe dişom.

Xwe dirêjî cigarê dikim.

Xwedê dizane tu li ku derê yî, niha çi dikî? Tu radizêyê gelo? Çi dikevin xewnên te? Ku ne wisa be di dilê te de çi derbas dibe?

Cîyê ku li wir î, çê dikî yan na xera dikî?

Cigara xwe pêdixim.

Gava ku dikevî nav valahîyê, wirê tije dikî gelo? Em bi hev re di wir de bi cih nebûn. Herdem valahîyekî çêbû di nav me de. Me bêçare li wî nihêrt û sekinîn. Me nikaribû tiştekî bikira.

Destê me nedigihîştê. Em bêqewet bûn. Carekê nebûbû, nedibû û dê nebûya. Me çi kir nebû.

Hingî me ji bo ku bibe hewl da, me wî mezin kir. Hingî me mezin kir, ket nav me, dest bi valakirina wirê kir.

Tu ketî nav dilê min; lê belê te valahîya wir tije nekir. Te xalî kir, min dilê te bi tena serê xwe hişt.

65.

Gava ku di şibakê de dinêrim di camê de xwe nîşan dide, li pişt ronahîya kuçeyê, avahîyan û dîmenên tiştên di odayê de ku ketine nav hevûdin, bi dengekî pistînî dibêje, “Wasewas, pistînîya şeytan e.”
Winda dibe.

66.

Ez te winda dikim. Hêdî hêdî ji destên min dertêyî.

Nikarim tişteki bikim.

Tu diçî, tenê li pey te li te dinêrim.

Lê belê min ji te weki parçeyekî xwe hez kiribû. Mîna bitûn ku parçeyê dixwaze. Mîna ku ji hestiyên min hatibî afirandin. Nedihat aqilê min ku tê ji hestî û xwînê hatibî çêkirin.

Wisa difikirim ku mîna wêneyekî te dibînim.

Gava ku ji te diqetim bêrîya te dikim.

Wê çaxê jî wisa bû, gava ku ji te diqetîyam agirekî diket nav dilê min. Çiqas dûr biketima ewqas min dişewitand.

Te digot tu ji min hez nakî, tu ji xwe hez dikî. Gava ku ji xwe hez dikim, nabe mîna ku ji te jî hez dikim? Gotinên te yê wê çaxê ku mîna strîyan di min de diçûn, niha gava ku difikirim min qet naêşînin.

Tenê bêrîya te dikim.

Te digot tu di min de xwe dibînî. Ez li dijî vîya derdiketim. Niha difikirim û heq didim te.

Mîna di te de xwe didît. Ka çi heye di vîya de? Dibe ku tu jî di xwe de min bibînî. Dê çi bibe qey?

Te digot ez ne eyneya te me. Tu wisa bûyayî çi dibû qey? Te li min binihêrta û xwe bidîta, dîsa tu bifetilîyayî cem min, te min di vê valahîyê de nehiştîya, di vê tenyatîyê de nehêle...tebata min nayê...min...bernede...ez qurnaba te me neçe...di wê şibakê de bisekine...bi pistînî bi min re bipeyîve...ji kerema xwe re...bêyî te nikarim bisekinim...êdî ji tenêtîyê tebat nayê min.

67.

Telefon.

Derhêner hêrs bûye, dibêje, “Yaw osta çi bûye ji te, haya te jê heye ku saet çend e? Ev heye saetek ekîp li hêvîya te ye.” Dibêjim, “Heywax, saet çend e?”

“Gidî êdî were xwarê, me duh deh caran got di vê saetê de hazir bin, hûn çima wisa dikin yaw!”

Telefonê li ser çavê min digre.

Hingî sekinîne hêrs bûye, herkes li lobîyê hêvîya min e.

“Biborin hevalno...min nedixwest ku wiha bibe...”

Teknîsyen çentê malzemeyan ji destê min digre û dipirse, “Dîsa mîgren e?”

Dibêjim, “Belê kekê...”

Çay û boxaçâ. Bêhdaneke kurt. Em dîsa di rêyên Sarikamişê de ne.

Ve carê em ber bi rêzeçiyayên Soganliyê ve dibezin

Di rêyeke xerabî de têr nav û dilê me diheje, piştê em ji zozanên Bardizê derbas dibin.

Kamera li dora çiyayê ku Enwer Paşa artêşê binberf kirîye digere.

Derhêner lîmonî ye. Ji tiştê ku dixwaze zêdetir çarçove dikim û ji bo ku dilê wî neke wasewas, heta ji destê min tê karê xwe dikim risas.

Osta xwe ditebitîne ku bibêje, “Em zoom nekin gelo?”, çawa ku mehd û mirûzê min dibîne dibêje, “Temam min tiştêkî negot.”

Diçim ser de û dipirsim, “Te çima xwest?”

Dibêje, “Tu vê dara tenê dibînî?”

Dibêjim, “Temam, ez ê bi çend awayî bikşînim...”

Mij xwe datîne ser çîya. Wêneyên ximamî dikşînim. Hinek bi taxokê tîn. Mixtar û du naskirîyê wî ne.

Simbêl û birîyên wan qefilîne. Piştî ku karê me diqede em diçin mala wî. Di sobeke mezin de qirçeçirça êzingan e, dişewitin. Çay, nanê loş, rûnê malê, hingiv...

“Çawa ye, hinek li xwe hatî?”

“Belê”

Teknîsyen tê ser min de û dibêje, “Xêr e, qey tiştêkî heye?”

Mîna ku bibêjim, na serê xwe dihejînim.

Setimîn... Tiştê ku ji destê min tê ev e.

68.

Ji Xereqanê ba tê.

Bêhna wî tîne, dengê wî tîne, rê dertên ber bi Xereqanê ve.

Tu hatî Qersê, te bajêr sitend, tu bûy dilê wî.

Karekî li me bû du kar, li dilê me dixin.

Ba digihîje cîyekî wisa ku tu ji min re dibêjî hiş be.

Va ye, tenê tiştê ku dizanim hiş bûn e...Hemin ku gava tê yad kirin, ne şêrên çolê di nav tirsê de vir de wir de direvin û ne jî melayktên esman dikevin dehşetê. Wê çaxê ez ê hiş bim.

Dengê min di nav min de winda dibe, bêje dihelin, herf belawela dibin.

Min li hevûdin rast bike, çavekî bide min.

Ji Xereqanê tê dengê te, li Qersê olan dide, li ser rûyê erdê belav dibe.

Dengê min xweş bide derxistin, dilên me dişon.

69.

Mîna ku ji çîyayê Soganliyê dengê eskerên ku ji sermana qefilîne tên me, em ji zozanê Bardiz dadikevin xwarê. Di berfê de em diçin xwarê, dertên, di newaleke kûr û teng de bi saetan dimeşin, piştê em digihîjin rêya mezin. Cîyê xwarina me vê carê Kebap Sarayi (Qesra Kebaban) ye. Ava şêlimê, bi tûjî ve ye.

Mi sêwa cigare dikşînim.

Ji tiştê ku didin re şîkur.

Ji heyîna wî re mînet.

Tehma qehweyê gelek xweş e.

Ekîp westîyaye, ji xwe de ketîye.

Êdî herkes belav bûye.

Mihasebevan dibêje, “Roja dawîyê ye.”

Dîsa êşa jihevdukbûnê.

Her roj rabûna ji cîyekî çî xweş e, her roj çûndina cîyekî çî xweş e. Wirê ku derê ye?

Sultanê min vê darê meqam e.

Meqam?

Belê, yanî cîyê ku meriv lê dimîne.

Cîyê ku meriv lê rûdinê.

Rûniştin...

Belê rûniştin, awayekî bi mirin û di binê esmana de, sekinandina li ser rûyê erdê ye.

Teknîsyen dibêje, “Bostan bi razanê mezindibe”

Em rabin êdî?

Deng ji şofêr tê,

“Wele em biçûna hemamekî dê pir baş bibûya.”

Gava ku em digihîjin otelê, mîna her carî ekîp li resepsiyonê belav dibe, şofêr û teknîsyen diçin hemamê, derhêner, dê maçê temaşe bike, Mihasebevan dê zû rakeve, ji min re jî hêjî heyîna te têr nake.

70.

Ez vîya jî ji te hîn bûm.

“Heyîna te ji min re ne bes e ku ji xeynî te tiştêkî din bixwazim?”

71.

Li înrenetcafeiyê me.

Yek dîsa ji te: “Tu dizanî, na nizanî ku wisa tişt hene ku dixwazim ji te re bibêjim, carinan mîna ku ji tivingek ramî hatibe gulebarankirin ji cîyên tarî yên hişê min ber bi cîyê ku ez dikarim bandor li ser wan bikim ve difirin, piştî nîkarim bicivînim, tiştêkî wekî têgihîna qasekî pir kurt, peyre her tişt ku Xwedê wan bibelqîfîne her tişt bi hev re dikeve nakokîyek wisa ku ji alîyekî ve bigrim alîyê din dihedime, helbestvan dibêje ez bipeyivim derdekî ye nepeyivim derdekî ye, ez wisa difikirim û bawer dikim ku ev ji bo me jî bêqîmet e, ti wateyek wê nîne û heya ku ne hewce ye jî, baş e lê gelo li pey wî çi ma, ger mirov ku nepeyive û di eynî demî de bê xeberdan nemîne dê çawa bike? Mirov ya dipeyive yan jî napeyive, ne wisa ye? Bêdengîti bi gotineke din sukûnet, ger mîna ku di hinek cîyan de biqîmet tê dîtin em bihesibînin, ez naxwazim ku li bêdengîtiya min a li vir wateyek bidim barkirin, naxwazim ez bêdeng bimînim, tiştên ku ez ê bibêjim, ger ku ez wan bibêjim ji ber ku dê sibê roj wateyek bi hevûdin re dernê holê, naxwazim bibêjim yanî bipeyivim, lê ez çi dikim? Qet. Meseleyên din: meriv dikare behsa wan bike: Gava ku ez di wî bajarî de te naskirim, piştî mayîna pênc rojan fetilîyî, gava ku tiştê ji bo min me dît û tiştê ku me parve dikir min hest kir mîna ku pênsed sal derbas bûbe, di wê hîyamê de dema ku meriv bi dilberê re derbas dike bi lez firîya û di pênc sanîyeyê de qedîya. Pir xweş tê bîra min: piştî ku min tu birê kir, hatibûm malê û min xwe avêtibû ser cîyê xwe, min dixwest ku tiştêkî ji tiştên bûne fêm bikim, mîna ku bi carekê ve çil sal hatibe ser temenê min, mirov çawa ku mîna çivîkekî xwe dikare sivik hest bike, min xwe wisa sivik û bi wî re jî bi hesta giranîya çil salî xwe hest kiribû.

Aşkera bû ku xemgîn bûbûy, birîndar bûy, medê te nexweş kiribûn, tu melek bûy, ji ber ku wan çaxan min bi hemû rastîyan, bi hesta eşqê têgihîştibûm, min dikaribû tu wekî melekek bibînim. Hêjî gava ku li te dinêrim min ji tirê qey tu melek î, wisa difikirim ku dilekî te yê paqij heye, wek çemekî. Berîya ku tu cara pêşî min li wir tenê bihêlî, mîna heyva zer a esman ku çav dişkêne, tê hişê te ku te di teksîyê de meseleyek ji min re vegot, filimek bû, digot, “Tu çûy, roj çû ava û careke din derneket.” Hemû hikaye ev bû. Belê tu birîndar bûy, min digot qey ez ê dikaribim birîne te derman bikim. Min ê mîna ku dilê wan jinên din dihişt, dilê te nehišta. Ew ji te fêm nekiribûn, eşqa te nikaribûn hilbigirin, mirov bi wî mêjîyên xwe yên biçûk ên civakî te xistibûn nav şablonan û bi wî awayê te darizandibûn, haya kesî ji meznahîya eşqê û ji azadîya daristanê tune bû, tu kes nizanibû ku kêlîyek bergîdana temenekî ye, te kesera eşqek çawa dikişand, ez didîtîm ku çiqas kiftê te ji wan hemû kategorîyên bêaqil

diçe. Ez ji nezikîya te re hejmetkar mabûm, gelo camêrek dikare ewqas nazik bibe? Ez gotinê dirêj dikim, tiştê ku dixwazim bibêjim ev e: zarokên ku di malbatên bê hezkirin û bi pirsgirêk de mezin dibin, zarokên ku tenê ne ji metirê qey ku mezin bibin dê bê merhemet bin; lê belê zêdetir bi merhemet in û hesta wan a parastinê jî gelek pêş ve diçe, ji ber ku ez di malabateke bi pirsgirêk de mezin bûm dilê min li ser rola dayîktîyê ye, ji ber ku li xisletê min nayê pirî caran dikevim nav halên hevnegirtî; lê belê tezahureke ecêb a vîya li ser te çêbû: ji nêzîkbûyîneke ku me girîngî dida kesayetî, biserxwebûn, parastina hev û nîşandayîna şefqetê zêdetir me girîngî da azadbûnê; lê belê dîsa jî gava ku min rewşa te ya birîndar dît, ji dil û can min şefqeteke bêhed hest kiribû, vîya baş tê bîra min, min xwestibû ku te bikim nav dilê xwe û li wir te baş bikim, êdî ev jirêketîbûneke çawa be nizanim, lêbelê mehne bû û lazim bû ku min bigota çawa dibe bi te bila bibe, min nikaribû bigota û bikira, ez evîndarê te bûbûm, hesta eşqê mîna nîşeya sipartinê ye ku ji meriv tirê qey merivê dikaribe dinyayê hilbigire... piştî wî tu dizanî jixwe, dibe ku min dilê te nehiştibe; lê belê niha tu herî zêde min difikirî û eş dikişînî... Dibe ku ji min re wisa tê, belê li ser gotinên ku te got ji min re wisa tê; lê belê nikarim bibêjim ku nakevim nav fikarayan, sûretekî te yê sar heye, sûretekî bîyanî yê ku gelek kêmbûn, dengê, ew min dike nav fikarayan. Hinek din jî binivîsînî bawer im ku ez ê tewşo mewşo xeber bidim, îşev serê min xweş e, van gotinên xwe bi hişyarîya xwe ya rojê dikarim paşve bistînim, leyla me, na ez ne serxweş im.”

72.

Min got, “Çil û pênc sal e hezkirina te di dilê xwe de mezin dikim.”
Hê ku destên min ji duayê daneketibûn xwarê, wiha bangê dilê min kir,
“Ji berîya Adem û vir de min tu dost dîtibû.”

73.

Duaya Gêrikan:

“Çend heb gêrik bi hêvîya dîtina xwarinê hatibûn çolê.

Rojeke xweş ya biharê bû. Li ser gulîyek hişk çend dilop avî dîtin.

Yek ji wan pirsî, “Ev çi ye?”

Yek ji wan got, “Vîya xwelîye ku ew jî ji eslê dilopan e.”

Yekî din got, “Hûn şaş in, vîya deryayek e.”

Gengeşîyek ket nav wan. Negihîştin qerarek. Gêrikeke zanyar ku bi gotinên wî bawer bûn di naw wan de hebû, çûn ji wî pirsîn.

Wî jî got, “Ka sebir bikin, ji bo ku em hîn bibin ka çi ye, divê em binêrin ka gelo meyla wî li ser çi ye. Lewra her tişt ber bi çavkanîya xwe ve diçe. Gava ku kevir ber bi esman ve tê virvirandin, dîsa difetile cîyê xwe yê eslî ku ew der xwelî ye. Yê ku meyla wî li ser tarîfîyê be, eslê wî jî tarîfî ye. Yê ku berê xwe bide ronahîyê, eslê wî jî ronahî ye.”

Gêrikna sekinîbûn. Hê zêde dem derbas nebû, tav axê baş germ kir û dilopên avîyê ku zelal bûn, bûn bûxar û ber bi esman ve bilind bûn.

Gêrikna fêmkirin ku ew ne ji xwelîyê ye.”

Li dikana terzîyê kal ku devdelingê şalê qedîfe yê ku derhêner nû sitendîye çêdike, vana ji lewha dîwar dixwînim.

Li derve heyteholek, qerebalixek...ekîbên şaredarîyê...wesayîten îtfaîyê...xîzara dara ku bi akîyê dixebite, darên hewran ku li kêleka rê dirêj dibin dibire. Gewdê daran qalind in. Osta derî vedike û li ser peywardarekî de diqîre. Ji dengê makineyan dengê wî nayê bihîstin. Camêr tişteki vadibêje; lê belê nayê bihîstin. Osta hêrs dibe û derî digire.

Teknîsyen bi gotina, “Çi bû ye, çima dibirin?” dipirse.

Bi gotina, “Di daran de hêlînê qijakan hebûye. Bi deng û çûndin û hatinên xwe gel aciz kirine.

Li ser peykeran de pîsî kirine, êdî xelk hatîye ada emanê...” di ber xwe de dipeyive.

Gava ku derhêner dertê dibêje, “Hevalno, balefîra me sibê di dehû nîvan de radibe, serê sibê em ê di nehan de derên, bila herkes di heştan de li taştê be.” û em ji hev vediqetin.

Diçim dergahê.

74.

Li qûntara çîyayê Yahnîyê me. Esman bê ewr e, vekirî ye, hê ku esman bi şînîya xwe diçirise, bi carekê ve ba radibe, sir û seqema çîya belav dike. Qotên der û dor tazîne, bi zerekî qirêj kinc li xwe kirine, bi wîzînî. Di binê wan de çi dikele, kî radizê? Ba ji kî, kîjan agahîyê belav dike?

Bê tebat disekine, cîyê ku min dikşîne wir, misêwa li wê nuqteyê dinêrim. Li wirê ji hespê de ketibûy. Li virê girmila te ya rastê û çîma te ya çepê derbê şûran xwaribûn. Çagri beg li vir artêşa Bîzansê belav kiribû. Derîyên bajêr li vî qotî vekiribû. Li ser vî çîyayê ku niha serê berf girtîye, kelên ku ji qûmê hatibûn çêkirin bi serûbin kiribû.

Ji Xereqanê ji bo vîya hatibûy?

Ji bo derîyê Qersê li Alparslan vebikî?

Derî hêjî bi te vedibin. Çavên te bajêr sitendin, bi dilê te ve xwe girêda, bi xwîna te teslîm bû. Ne ji wê birîna şûr ê ku te xist erdê û te şehîd xist bûya, dê bajêr derîyên xwe li Çagri beg venekira. Wekî nefesekî te şer dikir. Digot, ji kafirê ku herî nêzî we ye dest pê bikin û şer bikin. Kafirê herî nêz jî xurûr e. Gava ku hûn tîrê xwe biavêjin leşkerên Bîzansîyan, nefsa xwe nîşan bigrin, şûrê xwe li xwestekên wê bixin, gurzan lêbixin, rîman tê de rakin.

Yên ku berahîn xwedîyê vî bajarî ne em in.

Em ji vî derîyê, ji Xereqanê ji bo ku razên vî avhewayê vebikin hatin.

Vir bîrewerî ye, gavekî din jî biavêjin. Gavekî din jî biavêjin, piştî wî avhewayek nû ye.

Li heftê hezar leşkerên Bîzansîyan binêrin, em çar, heft, çil şervan in...

Serdar tu bûyî, Çagri beg neferê te bû.

Çagri yê te bû, siwar ber bi banga te ve dibezîyan, peya, nijdevan an.

Ronkahîya serê sibê li şûrê wî xist û biriqî.

Nûra te şewq da, ji Bîrewerîyê li hawir dorê bajêr şewq da, li daristanên Sarikamişê dilê xezalekî peland.

Niha xewta seferê ye, ji xwebûnê wexta koçkirinê ye, niha kêlîya derbasbûna ji vî derîyê ye, niha kerwana mirinê ye.

Leşkerên Bîzansî bi dizîka nêz bûn, qamçîya xwe li milê wî yê ku şûr digire xist.

Te berê xwe dayê û bi minnetî lê nihêrt.

Mîna ku ji ava bêmirinê ku ji destê te hat re bibêjî minnet te lê nihêrt. Mat ma. Piştî matbûna wî derbas bû. Bi şûrê milê xwe yê birîndar te ew ji dinyayê xelas kir.

Leşkerên Çagri beg li bendê bûn ku ax bi xwîna te were şûştin.

Fena dilopa avîyê ket, ax têra xwe ji agahîya can vexwar.

Derba duduyan li çîma wî ya çepê ket.

Derî vedibûn, şaşika te ya ku di bayê de divirvirî her çiqas serûçavên te bigirta jî, çavên te yê ku gava dinihêrtin wî alîyê dîwar didîtin, didîtin ku çawa bajêr ji Alparslan re vedibe.

Bedena te ket ser axê, hêdîka gihîşt eslê xwe.

Careka din ax gihîşt canê xwe.

75.

Wexta çûndinê ye.

Şalikeke Qafqasê.

Li ser cîyê sujdeyê guleke Xereqanî.

“Pênc herf e... “*Sîn*”, hişê te diparêze. “*Cîm*” îşaretê meznahî û celalê dike, “*Elîf*” zikr e, bi “*Dal*” tu dev ji dinyayê berdidî, bi “*Hê*” jî xelasîyê tenê ji wî dixwazî...”

Mîna derketina goşt a ji neynokê ez jî ji dergahê dertêm.

Yek li pey min gazî dike.

Ê ku gazî dike Sefer e, kaxizek dirêjî min dike û dibêje, “Rêya te vekirî be.”

Wî hemêz dikim.

Difetilm û cara dawî, carekî lê dinêrim.

Ji şibaka biçûk a turbeyê ku li kuçeyê dinêre, ji şibaka vîtray ji min re destê xwe dihejînî.

Serîyekî li qeweya Kerbala dixim.

Apê Elesker ne li wir e.

Birazîyê wî dibêje, “Sebî mir, çû gund.”

Pirsa, “Navê wî çibû?” dikim.

Dibêje, “Hiseyn.”

Mîna ku girêkekî dikeve gewrîya min.

76.

Balefir bilind dibe. Li bajêr dinêrim; kumbetê, mizgefta ewlîyayê, dergahê bi zorê dibjêrim. Ku ronahîyên kemeran ê hişyarkirinê ditemirin, kaxizê di berfka xwe ya hundir de derdixim. Nivîsa Sefer e, “Munacata ku Hezret her şev dixwîne.”

“Xwedêyo,

“Roja rabûnê, gava ku di destê min de deftera min hatim hizûra te, dizanim ku ez ê çî bersivê bidim te.

“Ey Ebûl Hesen, tiştên ku tê roja rabûnê bibêjî, aniha bibêje.”

Xwedêyo,

Te, di tarîfîya rehma dayîka min de bi awayekî acîz, min da razandin.

Gava ku Te min anî ucûdê, mîdeya birçî ji min re kir rêheval, ji ber vîya ye ku gava ji dayîk dibim digirîm.

Te bi şîrê dayîka min ez têr kirim û bi vî awayî Te ez aş kirim.

Gava ku min di qumatikê de pêçandin, min digot êdî ez ê rehet bikim.

Lê belê dest û lingên min girêdan û wan ez reht kirim.

Min digot gava ku aqilê min were û bi dest xeberdanê bike, dê derdê min bibêje û ez ê xelas bibim. Lê belê îcar min dan destê mamosteyekî. Bi darê pîr û pergale, tiştên ku mijîyabûm ji pozê min deranîn, ji ber vî êdî ditirsim.

Gava ku min wî derbas kir, ji bo ku bi tiştêkî re mijûl nebim, îcar şehwetê kirin belaya serê min. Ji ber tîrsa zînayê bi keçekî re zewicîm, te zarokan da min, Te şefqeta wan di dilê min de bi cih kir. Ji bo star, kinc û xwarinên wan min temenê xwe derbas kir.

Piştî ku ji wî jî xelas bûm, îcar Te kaltî û bêqewetîyê da min, Te nexweşînan xist nav bedena min.

Min digot, ez ê bimirim û ji van êş û elaman xelas bibim. Ji bo ku ruhê min bistîne, Te min da ber destê Ezraîl û Te min li ber hezar îşkence û şûrên wî yên bêwijdan da girtin.

Piştî ku min wî derbas kir, Te min kir çaleke tarî. Di wê neçarîyê de, Te du heb pirsker şand, “Te bi wan ji min, min û nîjada min da pirsîn.”

Ku ji wî jî xelas bûm Te min di gora min de sax kir, di hêrsa qîyametê de Te min heşr kir. Te, deftereke ku tijî poşmanî û nedamet tê de ne da destê min û Te got, “Bixwîne.”

Xwedêyo, kitêba min gotinên min in, ev hemû ji ebdîfîya min re astengbûn, ji tehde û diltengîyên ku Te da min, ji heqê xizmeta ku min ê ji Te re bikira derneketim.

Xwedêyo, bêçare û destvala hatim hizûra Te.

Lê belê kî dikare nehêle ku Tu min bibexşîni!.”

Nîdayek hat û got,

“Bi bêhnpakî û camêrîya xwe, te efû dikim.”

77.

Çîroka min wiha dest pê nekiribû, dê wiha jî nedome. Min hezkirinê ji darê hîn kir û vedigerim. Gewda wî bi birekê jî bibirin, ji şûna xwe naleqe. Gulîyên wî jî jêbikin, lê dîsa jî gilî û gazinan nake. Mîna Îbrahîm wî biavêjin nav agir jî, natirse. Te hertim pala xwe dida stûna xurmê ya ku arîkên mizgeftê girtibû û bi wî awayî te xutbeyê dixwend. Piştî mînber hate çêkirin, îcar tu çûyî ser wê û te xutbeyê xwend. Stûna xurmê wisa girîya ku dil û kezebên dostên te ji halê wî re peritîn. Gava ku tu ji mînberê daketî xwarê aş bû. Axa Hebeşê di bêjîngê de hat derbaskirin, zereyek êş jê derket. Axa Rûman hat bêjîngkirin, jê zereya eşqê derket. Axa Farisan hat bêjîngkirin, ji wê zereya eş û elemê derket. Ji zereya derdê Te, Bîlal derket. Suheyb û Selman hatin afirandin. Bîlal ji Habeşê re, Suheyb ji Rûman re, Selman ji Farisan re bûn Mîr. Çîroka min bi bêjîngkirina axa Xereqanê dest pê dike. Ji wirê tu dertêyî, tu dibî Mîrê Qersê. Ez dizanim ku vî bajarî nikare te dorpêç bike, tu di evîne de winda dibî. Çîroka min bi te dest pê dike.